Dayika keçelok dema ku wê bi dest axiftinê kir û got ku yê derd didê jî xwûdê ya û dermanê wê jî.” Piştî wê got ku şahê min delal, ez bi tiştêkê hatima ku ez rastarast bi te re hevdîtinê bikim. Şah hingê ji wê re got ku ”aaa hhhh te ez dîtîm, deka vêca ji min re bibêjê ku ka tê çi bibêjê.

”Dema şah wusa got wê jî ne dizanî ku wê çawa wê dest bi gotinê wê bikê. Weke ku gotinên wê di devê wê de dihatina girêdan.

Piştî wê hinek din dayika keçelok me sekinî û şah cardin li ser zêde mayina wê ya bêdeng pirsî ku ma derdê te çi ya. Dema ku ew zêde bêdeng ma, hingê şah, wî jî mareq ku ew wê çi ji wî re bibêjê. Ber vê yekê wî jî êdî xwest ku ew li wê bihisênê ku ew wê çi ji wê re wê bêne ser ziman.

Şah piştî ku wî ev got êdî ew ma sekinî li bendî wê ma. Şah piştî wê dema ku wî care sêyem kar kir ku ew bi axifê wî dengê pîrê kir. Pîrê bidest axiftinê kir û bidengekê weke rahronek bidest bilêvkirina gotinên xwe kir. Piştî wê, ji şah re got ku ”şahê min ez bi destûra xwûdê ez hatima ku ez keça ji kûrê re xwe bixwezim.” Dema ku wê wusa got, herkesek bi awirê şaq li lê nerîn. Hemû kesên li gorî mereq dikirin ku ka şah wê li ser wê gotinê wê, çi bersivê bide. Keça şah bi dil û naz mazin bûya û ew şah wê ji hemû tiştê wê diparêzê. Ber vê yekê wê, di wê temenê de wê, çi û çawa wê, bersivê wê bide wê xwesteka wê pîrê mereq kirin. Hemû kesên li dorê zan dikirin ku wê, gotinên xirab wê ji wê re wê bibêjê. Lê şah herkesek weke ku ew afsûn bûyî şaş hişt û wî ji wê re bi zimanekê nerm û dengê nimz bidest axiftinê kir û ji pîrê re bahs keça xwe kir ku wê çawa wê bi dil û naz wê mazin kiriya.

Piştî wê şah di dilê xwe de hizirkir û ji xwe re pêşî got ku ez şah im û mazin im. Hewcen nakê ku ez jineka pîr li hemberî xwe wê bişikênim û gotinên dilşikeştinê ji wê re bibêjim. Ezê şartên ku ew ti carê nikaribê werênê li cih bidima pêşîya wan û ew jî wê ji wê êdî bi dilê xwe wê bi şûn ve wê gavê biavêjin. Di wê temenê de şah gota pîrê ku ”pîra delal û dîlnazik. Ez bi rêz û hûrmet xwesteka pêşwazî dikim. Lê ma hun dikarin li hemberê qasra min yek weke wê dênin ku keça min di wê de bijî. Qasra şah geleki mazin bû û li heft duwelê welêt û bi dora wê bi nav û deng bû. Ti qasr û minaqên wê jî weke li ser rûyê ardê digotin ku ew nin in. Di nava wê de wê biqasî daristanekê wê bax û baxçeyê wê hebê.

Piştî wê, pîrê tenê got bila xwestek xwesteka şahê min a û ji wir derket û rastarast hat malê. Wê dema ku ew derket jî wê, di dilê xwe de wê bihizirê û ku wê çawa wê, ew wê bikê û wê ti carî wê ti kesek nikaribê weke wê qasrê wê çê bikê.

Wê demê pîrê hat û bi hazn li hemberê keçelok sekinî û ji wî re got ku ”kurê min ê delal şah şarek wusa daya pêş bo keça xwe ku tu kesek wê nikaribê wê werênê li cih. Vêca ka emê çawa wê werênina li cih. Em ti cari nikarin wê werênina li cih.

Keçelok hinekê hizirî û ji dayika xwe pirs kir ku şah çi şart daniya li pêşê. Dayika wî got ku "kurê min şah gotiya ku "kesê ku wê keça min bixwezê divê ku ew qasreke bi asrekê weke ya min çêbikê. Vêca ka emê çawa qasrek weke ya wî çê bikin?"

Dayika keçelok wusa got û ma sekinê. Di wê demê de wê wusa got û ma sekinî. Keçelok di wê demê de wê dema ku wî li dayika xwe hisand û dayika wî hemû danûstandina di nava wî û şah de hanî ser ziman êdî wî bi zimanekê hesan û weke ku ew piçûk bibînê got ku "qasrek xwestiya. Ne ti tişt a. Ezê nûha wê li wir dênim û rakim. Heta ku ezê ji ya şah xweşiktir jî çêbikim."

Keçelok di wê demê de ew hinekê ma û piştî wê, ku ew hinekê hizirî di wê demê de wî gustilk ji berika xwe derxist û bir devê xwe û ew alist. Piştî wê, dît ku wa du gîyanên gustilkê li hemberî wî amede bûn. Di wê demê de herdûyan ji keçelok re gotin kerem ji me bixweza ku em dunyê hemû xirabiikin em xira bikin." keçelok ji wan re got ne dînyê xirabikin û ne jî ti tiştê binard biikin. Tekê fermane min ji we re ew ku hun qasrekê weke ya şah li hemberê ya wî çêbikin."Dema ku keçelok wusa got, gîyanên gustilkên gotin ferman ya te ya û di cih de çûn û deng li hamû maran kirin ku ew li hev bicivin û ji wan xwestin ku ew di cih de wqasrekê lê bikin. Wê şehê heta sibehê ew qasra ku weke keçelok ji wan xwestibû ew lê kirin û rayistin û hemû tiştêkê tekûz kirin. Di wê demê de keçelok dema ku ew qasra wî temem bû, wê carê wî bakira dayika xwe dayê dayê de ka were. Meyzê min qasr çêkir. Dê vêca here hemberê şah ji wî re bêja ku wa şartê wî yê ku wî hizir fikir ku wê di dunyê de wê ti kesekê nikaribê wê werênê li cih hatiya li cih.

Dema ku dayika keçelok pîrê dît ku wa qasr bi rastî jî çêkiriya bi şaş û matmayî lê nerî. Lê ji aliyê din ve jî pîrê dilxweş bû. Piştî wê bi rav bi ber qasra şah ve çû û li cihê ku ew care pêşî lê sekinî bû li wir sekinî, dakû şah wê bibînê û ew wê dewetî hemberê xwe bikê.

Wê di wê demê de wê dema ku ew li wir demekê ma şah dihê ber şebekê û wê dibînê û şaş dêmênê. Di wê demê de ew wê, di cih de wê çend berdestkvanê xwe wê bişênê ku ew bakinê û wê werênina hemberê wî. Di cih de çend berdestkvan çûn û ew hanîna hemberî wî. Di wê demê de şah pîrê mereq fikir ku wê pîrê wê çi wê ji wî re wê bibêjê. Dema ku ew hanîna hemberê wî. Di wê demê de şah jê pîrsî û got pîrê tu dîsa hatî dêka vê carê derdê xwe ji min re bibêjê. Wê carê weke ku ew henekê xwe jî bikê, wê bibêjê ma gelo wa qasrek weke ya min di rojeke li hemberî ya min danî û rakir.

Pîrê, bidest axiftinê kir û got şahê min, mazinatî ya xwûdê ya. Lê ez wê bêjim ku şartê hanî li cih. Were bi çavê serê xwe bibîne ku kûrê qasrek weke ya te li hemberî qasra te danî û rakir. Şah bi awirê matmayî li pîrê û hisand. Piştî wê li dora xwe nerî û piştî wê şah li ser gotina pîrê da rex pîrê û ew bi hev re hatina hemberê qasra ku kûrê wê weke ya şah rakiriya. Şah bi çavên şerê xwe bawer nekir. Piştî wê, ji wezîrên xwe pîrsê ku ew çawa dikarê bi derfet bê. Ji wan xwest ku ew fêr bibin. Wezîrekê wî hebû û navê wî ”**memuk**” bû û ew gelek caran bi kirinên nebaş di nava xalkê de dihat nasîn. Di wê demê de ew derket li pêş û gotiyê de şahê min destûrê bide min ku ez di cih de aslê wê derxim li holê. Di wê demê de wî destûr ji şah girt û bo wê xwesteka ku ew fahmbikê. Lê piştî wê, şah li tiştê din hizirî. Wê çawa wê şartekê din wê dênê li pêşîya pîrê û kûrê ku ew ji dayîna keça xwe ew xwe xilas bikê. Di wê demê de ew li wê hizirî û xwest ku ew di wê demê de şartekê din ji wê re ew bibîne.

Şah di wê demê de wê, pîrê piştî ku ew hanîna ber 1 qasra çêkirî êdî ew li bendê bûn ku şah wê gotina xwe ya dawî wê bibêjê û wê bibêjê ku ew keça xwe bide kûrê pîrê. Lê di wê demê de şah li tiştê de hizirî û piştî wê li wir gotina xwe negot. Di wê demê de kesên li dorê hizirîn ku şah li pey fêhlan a. Wê çî bikê. Di wê demê de şah gota pîrê bi min re were qasrê ez li ser taxtê xwe rûnihim û wê demê gotina xwe bibêjim. Li vir çêtir tişt dihên aqilê min û di hişê xwe de me. Pîrê got bila ew wilo bê û wê da pey şah û bi hev re çûna qasrê. Di wê demê de şah dihizirî ku ew çî bibê. Dema ku ew di devê derî de ku wê hinekê wê weke pirrekê bilind di wê de derbas bûn wê, tiştê de wê rengê de wê were hişê wî. Heta ku ew çûna hûndûrê li wê hizirî. Piştî wê, ku ew hat hûndûr û li ser taxtê xwe rûnişt û pê de wê, di nava kesên li dora wî ku ew li bendî gotina wî na wî, derbasî ser taxt bibê. Ku ew rûnişt weke ku ew hinekê ponijî. Piştî wê, serê xwe rakir û li pîrê nerî û gotiyê de ”min di nîvê qasrê de bax û baxçe nedît. Keça min dilnazik a. Ew di bax û baxçe de mazin bûya. Di nava baxçe de jî wê, pirre ji zêr weke ya ku ew di nava bax û baxçe min de heya wê, divê ku ew çêbikê.

Di wê demê de pîrê wusa hizir ku wê ew wê wilqas zêrî wê ji kû bînin û wê, çawa wê bikina pirrek weke ya qasra wî.

Şah dihizirî ku wî tiştê ku wê ti carî nikaribê were hanîn li cih wî kifşkiriya û wê, ew nikaribin wê bikin wê, di wê demê de ew ji dayîna keça xwe wê xilas bibê. Pîrê jî pirr bi hizir û hazn ji hemberî wî vaqatiya û hat hemberê kûrê xwe keçelok û ji wî re got ku ”kûrê min nêêhta şah li

nedanê ya. Ew hertimî hêncetên bêderfet dibînê ku ew werina hanîn li cih.”

Dema ku dayika keçelok wusa ji wî re got, keçelok lê hizirî û hazini û gotiyê dayika min a delal, dêka ji min re bêna ser ziman ku şah wê carê çî xwestiya. Dayika keçelok hemû tişt ji wî re hanî ser ziman û gotiyê ku wî tiştêke weke bêderfet xwestiya. Ew jî pîrrek ji zêr di nava bax û baxçe de çêbikê. Wê demê keçelok lê hizirî û gotiyê dayika min a delal tenê xwestina wî ya pîrrek ji zêr çêkirî bê. Ez nûha wê li wir çêbikim. Heta sibe ezê wê pîrê çêbikim.

Di wê demê de wê, dema ku dayika keçelok ji qasra şah derket wê wezir memuk jî ew dişopênê heta ku ew dihê malê. Di wê demê de wê dema ku ew diçe cem kûrê xwe di rûnihê wê demê wê, ew jî li aliyên ê derve ye şibekê wê bi dizî bisekinê û wê gûh bide wan ku ew li ser çî û ji çî diaxiftin.

Di wê demê de keçelok wê bahsa gustilka şahê maran wê bikê û wê di wê demê de wê, ew wê ji berika xwe derxê. Çîrîsbûna gustilkê wê li çavên wezir bidin dema ku ew derdixê û ew wê di cih de wê li ardê wê bide rûniştandin. Ew di wê demê de wê ji xwe re wê bibêjê ev çî bû ku weke barqekê li çavê min da. Ev çî bû. Di wê demê de wî serê xwe care din rakir û wê di wê demê de dît ku keçelok gustilk kir bin zimanê xwe û wê dema ku ew alist dît ku wa du kesên pîr zêde gir wê li hemberî wî rûbidin. Keçelok ji wan xwesteka xwe ya çêkirina pîrrekê ji zêr xwest û ferman li wan kir. Wê demê herdû kesîmn gustilkê di cih de ji berçav windabûn û çûn ku ew wê xwesteka keçelok wê werênina li cih. Di wê demê de wê, di wê temenê de wê, êdî wê wezir ew dîtibû ku ew çawa dikarî wê qasta i iltîşam wê çêbikê.

Hinekê din wê demê ew di wê demê de derbas bû û wezir êdî ew vegeriya li qasrê û çû hemberê şah. Di wê demê de ew di serê xwe li hinek tiştan ku ew bikê dihizirê. Şah di wê demê de deng lê kir û gotiyê wezirê min memuk dêka ji min re bêna ser ziman te çî dît di derbarê wê çêkirina wê qasra bi iltîşam. Wezir got şahê min hê ez li ser mijarê lêkolînê dikim û hê min ti tişt nedîtîya. Di wê demê de wî rastî ji şah re negot.

Lê ew pîr dihizirî. Piştî wê, keçelok ew ji xwe bi karê xwe ve mijul bû. Ew ji wê bi êmin tevdiageriya ku ew wê, keça şah wê ji xwe re wê bîne. Di wê demê de rojek din derbas bû û pîrre ji zêr ku wê weke şah xwestibû wê ew jî wê di qasrê de wê weke ya wî were çêkirin.

Piştî wê, keçelok dayika xwe bir bax û baxçê û ji wê re got ku kûrê min ê delal te çawa çêkir û sipahî çêkiriya. Lê di wê demê de wê, hinek gazinên xwe jî wê bikê ku qasr hingi bilind çêbûya. Wê got ku "kurê min ê delal, ezê çawa wê bi wê pîretiya xwe wêqas bilinddayiyê derkevîm' û ew ji wî re hanî ser ziman. Keçelok dilê wîbi dayika wî ve bû û dizanî ku qadrê dayika li cem xwûdê jî û avdan jî mazin bû. Ber vê yekê wî got dayê ku pêwîst bê ezê her roj li ser piştta te bibim jor û bênim jêr. Tenê bila dilê te xweş bê. Ev gotinên keçelok pirr zêde li xoşa wê çûn.

Piştî wê, tiştêkê wê negot û ma bédeng. Lê keçelok gota dayika xwe dayê dê hera agahiyê bide şah ku ew bila were û qasrê û bax û baxçeyê wê û pirre ji zêr a nava wê bibînê. Di wê demê de pîrê jî lingê xwe zû girtin û ew di wê demê de di cih de hat û çû hemberî şah. Hat dîsa li wê devera ku ew care pêşî sekinî bû. Wê demê ku şah rabû û li wê deverê meyze wî di cih de pîrê dît û di wê demê de bakira çend berdestkvanê xwe ku ew herin wê pîrê werênina hemberê wî. Di wê demê de mereq ku pîrê wê çî ji wî bixwezê. Li gorî wî ne bi derfet bû ku ew di rojekê de pirrekê ji zêr weke ku wî xwestiya wê çêbikin.

Lê dema ku jina pîr hat hemberî wî û rêz û hûrmeta xwe da nîşandin ji şah re piştî wê, şah ji wê pirsî bi awayekê serbilind û pozbilind, dêka bîja pîrê derdê çî ya bêja ji min re."

Pîrê got ku ez ne bi derfet hatima. Ez bi çareserîya derd hatima. Ber vê yekê min xwest ku ez werim ji ter bibêjim ku tu were di qasra ya li hemberî de wê di nava wê bax û baxçe de wê pirre ji zêr weke ya te ku te xwestibû ew were çêkirin wê bibînê.

Ku pîrê wusa got şah me acêbmayî di cihê xwe de weke ku ew bi cemidê û hişk bibê lê hat. Nekarî xwe bilabitênê. Di wê demê de li hinek kesên ku ew sibehê zû dirabin û lli dora wî na hinekî ma û piştî wê, li xwe hat û gotina ku ew ji devê wî derket ew bû ku em herin. Lê pêşî bila agahi ji wezirên min re herê û ew jî werin. Bêi wan ez newim." pîrê got bila û di wê demê de wê, ew mana li hêvîyê.

Hinek dem têve çû û agahi piştî ku ew ji weziran re çû ew di cih de li hemberî taxt û şah amede bûn. Piştî wê, wan ji şah re got ku şahê min kerem bikin, te em ferman kirina..

Şah gotina pîrê ji wan re dûbare hanî ser ziman û got ku wê ji min re gotiya ku me xwesteke te hanîya li cih. Werin em bi hev re herin û wê bibînin. Di wê demê de şah di wê demê de wê ji cihê xwe rabê û wê bi ber wan ve wê herê. Piştî wê şah, ket nava wan û pîrê da rex xwe û bi hev re ketina rê. Di wê demê de hatina nava qasrê û piştî wê nava bax û baxçe

û dît ku wa pirre weke ya wî ji zêr çêkiriya. Di wê demê şah êdî nekarî ti tiştî weke hêncet bibînê. Lê di mejiyê xwe de pirr dihizirî û çendî dixwest ku ew hêncetekê din bibînê. Lê çî kir û nekir di wê demê de wî nedît. Hinekê dem têve çû û ew hat cem wezirên xwe. Di wê demê de wezirê wî yê pêşî ku wê mafê gotinê girt û ji wî re axift û gotiyê de ”şahê min te gotina xwe gotiya, êdî ya ku ew li şah divekê tû weke gotina xwe bikê û tu keça xwe şah baranê bide kûrê pîrê keçelok.

Dema ku wezir got ku ‘keçelok’ hinekê ev nav ji wî re acêb hat. Piştî wê ji wî re got ku ”ma ev kûr keçel a?” Wezir got herê şahê min mujey por jî li serê wî nîn a. Lê tu dizanê keçeli di zimanê me de bi di mana ya. Yek wê weke ku wê ti tişt weke mu li serî nebê. Ya din jî wê weke serî bibirîn û kûl û bîrov bê. Hingê wê ji wê re jî wê gotina keçeliyê wê bê gotin.” Piştî wê kin vegotinê şah kijan ji wan keçeli heya bi kûr re. Wezir got ya pêşî ku min got. Tenê pore wî nîn a. Hingê şah got ew ne ti tişt a. Teman wê demê û ew ma sekinê.

Di wê demê de şah, êdî weke ku ew bêçare ma û wê biryara dayina keça xwe li keçelok wê bida.

Hinekê. Dem têve çû û wê demê şah got ez xwezim li vir û lli ser lingan gotinê bibêjim, divê ku ez herima ser taxtê xwe rûnihim û gotina xwe bibêjim. Wê demê wî bi wê hêncetê hêvî dikir ku ew heta wê dema ku ew li ser taxtê xwe rûnihê ew hêncetekê din biînê û piştî wê dênê pêşîya pîrê û kûrê û ew ji dayina keça xwe ya delal jî xilas bibê.

Di wê demê de wê şah heta ku wê were ser taxtê xwe wê gelek xwehdanê wê bi rijînê. Wê geleki wê di serê xwe de wê herê û wê were. Di wê demê de wê şah heta ku ew hat ser taxtê û rûnişt wê gelek bihizirê û wê heta wê demê wê ti hêncetên din wê di serê xwe de wê peyda nekê. Wê êdî wê piştî wê ji neçarî wê biryara xwe wê bide û wê bibêjê. Wê dema ku wî biryara xwe da wê, pêşî de wê agahiyê wê bişênê ji xatûna xwe jinşahê re jî û wê, ew jî wê were xwestin ku ew li cem wî bê. Di wê demê de şah wê êdî wê biryara xwe wê bide û wê bibêjê ku ew keça xwe wê bide kûrê pîrê.

Şah bi wê rengê biryara xwe da û êdî weke ku wî gotina xwe ya dawî gotibû. Piştî wê dayika keçelok di cih de ji qasrê çû û agahiya dilxweş xwest ku wê bide keçelok. Di wê demê de êdî wê li qasrê wê bidest amedekariya dewetê wê were kirin. Wê ceyizê keçikê wê were amede kirin. Û wê bi wê rengê wê gelek tiştên ku wê bîn kirin wê bîn kirin.

Keçelok di wê demê de ku wî agahi hilda ew dilxweş bû. Wî jîyane wî êdî weke ku ew geleki xweş bûbû. Wî dayika xwe jî ji wê male wan a faqir biribû qasrê û li qasrê bi cihkiribû.

De ne keç ku keça şah wê bê dewetek bi navdeng wê ne zewicê. Wê di wê demê de wê, dewetek ku wê cilrojî wê li dar bê wê were kirin û wê ji hemû deverên cihanê wê, kesên werina dewetê wê bibin. Di wê demê de wê keçelok tenê dayika xwe û ew sa û kitika xwe bi xwe re ew biribû qasrê.

Li qasrê piştî ku wê deweta wan wê bibê wê keçelok û jina xwe wê bi hev re wê bidest jîyane xwe wê bikin û wê rojên xweş wê derbas bikin. Piştî wê, êdî wê ji xwe re wê bijin û wê li jîyane xwe wê binerin.

Lê wezir memuk di wê demê de wî ew di şopandin û wî di awayekê de wan çî fikir ew dişopand. Di wê demê de wî nepeniya keçelok fêrbûbû û wî dixwest ku ew xwe bigihênê gustilkê.

Wî jî di wê demê de wê gelek caran wê hewlbide ku ew bikeve qasrê bi dizî û xwe bigihênê wê gustilkê. Lê wî di wê demê de wê çî kir û nekir wî di wê demê ew de nekir. Lê wî bidest şopandina keçelok kir û di wê demê de xwest ku ew bi riya jina keçelok xwe bigihênê wê. Bi navê wezirtiyê wê car bi car wê were cem wan û wê, di wê demê de wê weke li ser navê şah were û rewşa wan bipirsê. Di wê demê de wî ew ji xwe kir adet. Rojekê wî çawa bê ku ew nayê zanîn wê fahmbikê ku qavanozek ku ew li mezêl rûniştî hebûya keçelok gustilka xwe avêtîya hundirê û wê, dem bi dem wê dema ku wê pêwîstîya wî bi kirina bi wê a tiştê hebê wê, derxê û karê xwe bi wê bibîne û wê piştê wê dîsa wê bikê wir.

Ew ji wîzîr re bûbû weke firsendekê ku ew di wê de xwe bigihênê wê. Wezir wê dema ku ew diçê û demek êvarî ku wê keçelok weke ku ew ne li malê bê wê, xwe bikê şeklê faqirekê gerok de û wê, were qasrê û wê, ji wan bixwezê ku ew xiran bi wî bikin. Di wê demê de jina keçelok wê çend qatên qûmaş û tiştên li xwekirinê ên baş wê bidiyê. Lê ew di wê demê de wê, qatek kûmaş wê biavêjê ser wê qavanoza ku gustilk di wê de ya û wê rajiyê û wê, dênê nava cihê xwe û wê ji wê pîrr tika bikê ku ew wê bidiyê. Jina keçelok jî li wê dihizirê ku wê faqirek ku ew hatibê ber deriyê mirov wê ne bi derfet bê ku mirov wî destvala vegeirê û wê bibêjê herê.. Di wê demê de ew di rajê wan tiştan û ji qasrê derdikeve.

Wî di wê demê de xwe gihandibû gustilkê. Piştî wê, di wê demê de wê, ew wê, gûstilkê derxê û wî dizanî ku ew çawa wê gustilkê wê bikarbênê. Di wê demê de wî geleki keçelok şopandibû û dîtîbû ku wî çawa ew bikardihanî. Piştî ku wî xwe gihanda wê, êdî wî ew kir devê xwe û bi

zimanê alist. Di wê demê de wê, demê du kesên gir derketin û gotin keremke fermane te çî ya. Wê demê wî ji wan xwest ku hemû qasr û tiştên ku keçelok bi wan çêkiriya û daya çêkirin winda bibê û ew qasrekê ji xwe re di nîvê avê de çêbikê ku ew ti kesekê nikaribê xwe bigihênîyê de.

Kesên ji gustilkê wê di cih de wê xwesteka wî werênina li cih û wê, di wê demê de wê keçelok û dayika wî dîsa wê bikevina rewşa xwe ya jîyane berê a berî wê de. Tenê wê sa û kitik wê li cem wî bimênê. Di wê demê de wê, dema ku wî ew kir û bû xwedî hêz wê bixwezê ku ew keça şah a bi keçelok re zewicî û jina wî ji wî vawatihê û bigihê wî. Lê keçelok wê herê nekê. Di wê demê de wezîr jî ku ew ji ti kesekê re wê, keçelokê wê bikê rewşa pilêrekê ku ew hertimî li serê daran bi fistik û findikan bijî. Wê hebûna wê jî wê ji aqilê keçelok wê bide birîn ku ew ti carî wê bibîr nekê û ew newê bîra. Heta ku ew wê bibîne jî ew newê bîra wî.

Pişî wê, demek wusa bûhûrî. Lê di wê demê de sa û kitik di wê demê de wê, bixwwezin ku ew qanciyekê bi keçelok bikin. Kitik dihê cem sa û ji sê re dibêjê ku keçelok kesekê baş a û ewqas qanci bi me kiriya. Em jî divê ku em qanciyekê bi wî bikin. Di wê demê de kitik ji sê re dibêjê ku em herina aliyê din ê qavê li qasra wezîr ku wê ji xwe re çêkiriya û em gustilkê ji wî bistênin.

Hungê ku kitik û sa wê bi hev re wê bikevina rê û wê werina ber keviya avê. Di wê demê de sa wê ji kitikê re wê bibêjê ku ez sobatiyê nizanîm û ku tu min li pişta xwe bikê ezê derbas bibim, Weki ti tiştê nikarim bikim. Kitik wê di wê demê de wê rêyekê wê bibîne ku ew bi hev re derbasî aliyê dibin bibin. Wê qurmekê darê wê li ser bicih bibin û wê bi hev re wê bidest çûyina aliyê din ê qasrê wê bikin.

Di wê demê de ku ew gihiştina aliyê din ê qasr li wê, wê demê kitikê û sa wê li hev wê runihin û wê plangeriyekê wê bi hev re wê çêbikin. Di wê demê de wê, dema ku ew wê bikin û wê bikevina hundurê qasrê de wê, çawa bikin wê li wê bihizirin. Wê demê sa dibêjê ku ”emê demek ku wê wezîr razahayî em bikevina qasrê de. Wê demê kitik dibêjê temem lê nayê aqilê kitikê ku wê çawa wê xwe bigihênina gustilkê. Di wê demê de wan fahmkiribû ku gustilk di bin zimanê wezîr de bû. Wê demê sa ji kitikê re dibêjê ku wê dema ku ew razaha hingê têyê herê ber serê wî û dûvê xwe bide ber bêhna wî û ew wê ji wê aciz bibê û wê bi pişikê. Pişî ku ew pişikî wê demê wê gustilk wê ji bin zimanê wî derkeve û wê demê

tê yê rajiyê û di şebekeyê ve wê bi ravê û têtê were xwe bigihênê min û emê bi hev re wê ji wir herin.

Di wê demê de wê, ew jî wê li ber qasrê wê bi wê rengê wê di rengekê wê bimênin heta ku wê dem bibê demek tarî a derengiya şevê. Di wê demê de sa bêhamd dibînin û ji kal dikevin û dikevina xewê de. Lê kitik wê deme wan a tevgeriyê wê di wê demê de wê dest pêbikê. Di wê demê de wê kitik wê li xwe şiyar bê.

Di wê demê de wê sa û kitik wê li hev rûnihin û wê bi hevalî heta wê dema ku wê wezir wê razihê wê bimênin. Piştî ku wezir raziha wê demê kitik bi dizik ket hundur. Wezir gelek astengi çêkiribûn ku mirov bikevina hundur. Lê ne hatibû aqilê wî ku ew bo heywanên weke kitik û sayan çêbikê. Di wê demê de kitikê xwe gihand heta mezeleya wî ya razanê û di wê demê de. Piştî wê, kitiki bi hêdika û awayekê baldar hat hata ber serê wezir û dûvê xwe rakir û danî ber dev û bêhna wî. Ew di wê demê de wê ji wê nexweş bibê û wê, bi pişikê. Wê dema ku wê ew bi pişikê wê demê de wê, gustilk wê ji bin zimanê wî bi firê û wê bikeve bin nivîna wî de. Lê kitikê bi carekê xwe gihand gustilkê û di wê demê de wê bidest ravinê kir. Xwe gihand şebekê û di wê re avêt.

De ne, dibêjin ku kitik her timî li ser çar lingên xwe dikeve. Di wê demê de jî kitik li ser çar lingên xwe ket û ti tişt bi pê ne hat. Di wê demê de wê bidest bazdanê kir û bi sa re gihiştin wê gûrmê darê ku ew bi wê hatibûbûna wê aliyê avê ew di cih de li wê sûwar bûn û bi hev re kirin ku ew herina aliyê din ê avê. Lê ba ne dihat û di wê demê qûrmê darê ew demek dirêj di nava avê de ma û wê hewayaya ku wê ji avê wê were wê bi hinikî wê, li wan bixê û wê, xwe berdîn. Kitik û sa jî xwe berdan. Lê di wê demê de wê dema ku kitikê xwe berda wê gustilk wê ji devê kitikê wê bikeve nava avê û wê di wê demê de wê di avê re wê herê. Lê sa dît ku wê masiyekê ew kir devê xwe. Di wê demê de sa bi kitikê re xayidi ku wê çawa ew gustilkê ji devê xwe di berdê nava avê. Di wê demê de wê, sa wê, dîsa wê plangeriyekê wê çêbikê ku ew wê çawa wê xwe bigihênê gustilkê. Wê demê sa plana pêşî ew çêkir ku wê hemû kesên ku wê masî bigirin û wê bibina bazarê ku ew bifirosin, masiyên hemûyan bigirin. Di wê demê de wê, di wê demê de wê, demê sa û kitik wê dikin. Wê hemû masiyên ku ew hatina girtin wê, bikirin û wê bibin. Lê wê ne di nav û hinavê yekê ji wan de jî bê. Di wê demê de wê sa û kitik wê bi hazn wê werina ber keviya avê û wê rûnihin. Ber ku gustilk ketibû avê, destê wan ji avê nedibû ku ew wê demê ji wir herin. Lê di wê demê de masiyek hat û bi wan re axift û ji wan pirsî ku ew çima wusa bi hazn in. Pêşî masî got

ku ”ti dibê qey we gustilka xwe ya zêr windakiriya. Di wê demê de wê dema ku wê sa û kitik navê gustilkê wê bi bihîzin wê zindibiin û wê weke ku wê bi vejîn. Di wê demê de wê sa ji masî re wê bibêjê ku wan gustilka xwe winda kirina. Û meseleyê ji serî heya binî ew ji masî re dihênina ser ziman. Masî dibêjê wê demê ez gustilka we bidima we. Ber ku ew nûha di zikê min de ya. Pêşî ne sa û ne jî kitik bi wê bawer dikê. Lê dema ku wê masî devê xwe vekê û wê lê binerin wê bibînin ku wa bi rastî jî wa di devê wê de ya. Di cih de ew gustilkê ji masî digirin û û spasiya xwe li masî dikin û piştî sa gustilkê dikê devê xwe û di wê demê dikin ku ew jî wir bi ravê werina cem keçelok.

Di wê demê kitik dixwezê ku ew gustilkê cardin bikê devê xwe. Lê sa destûrê nadê û ew jî kitikê re dibêjê ku em ji tiştêkê bi wê rengê re ê nû re em nexwezîn ku em rû bi rû werin. Di wê demê de wê, rajina gustilkê û wê bi lez û baz wê werina ji keçelok re.

Dema ku keçelok gustilkê dît wî weke ku wî ni çavê serê xwe ne dît. Lê keçelok di wê demê de hemû bîra xwe winda kiribû û tiştêkê ku wî bere kiribû ne dikarê bîrê bîra xwe û ne di bîrê û hişê wî de bû ku ew zewicî bû bi keça şah re. Di wê demê de ji xwe keça şah jî wê di wê demê de wê, ne dîyar bê.

Lê di wê demê de keçelok wê di rewşa xwe ya berê de wê jîyane xwe wê bidomênê. Keçelok di wê demê de wê ti tişt newê bîra wî. Û wê weke ku wê bibê kesekê din. Di wê demê de wê jîyane xwe wê di rewşa xwe de wê bidomênin û wê, di wê demê de wê bi xizanî wê jîyane xwe wê bidomênin. Rojekê ji rojan ku wê keçelok wê derkeve çolê ku ew komikan bide hev ku ew dayika wî ji wan re wê çêbikê wê hilêrek wê were hemberî wî û wê, bi wî re wê bidest axiftinê wê bikê.

Keçelok ne dizanî ku ew **hilêr** wê jina wî û ankû keça şah bê. Di wê demê de wî. Di wê demê de wê, tiştêkê din wê wê, keçika bûyi hilêr wê, ji wî re wê nikaribê werênê ser ziman. Heta ku wê dema ku ew bibêjê ez jina te me ku ez bi afsûnî wezîr hanîma wê awayê wê ew di cih de wê ji ber çavê wê winda bûba. Ber vê yekê keçika bûyi hilêr wê di wê demê de wê plannekê bi aqil wê çêbikê. Di wê demê de wê bixwezê ku ew wê demê bi kirina qanciyê bi keçelok ew bi ser rewşa xwe ve wê were.

Wê demê keçelok û hilêr wê li hev rûnihin û wê demê dirêj wê bi hev re wê bi axifin û keçelok wê bahsa jîyane xwe ya bi faqîrî wê bikê. Di wê demê keçika bûyi hilêr wê ji derî heya binî wê li keçelok wê bihisênê û wê, di wê demê de wê ji gotinên wî fahmbikê ku ew bi afsûnê hişê wî jî hatiya jê birin. Di wê demê de wê, ew bi rehetî wê fahmkir. Di ti gotinên

keçelok de wê navê wê, rewşa wê, bahsa wê û ya bavê û ankû tişteke din ku wê weke təkiliyê bi wan re wê dênê wê nebê û wê newê ser ziman. Ew weke ku ew ji dûnyayek din û dîyarek din diaxift wê gotinên xwe wê werênê ser ziman.

Di wê demê de wê bi seatan wê li hev wê rûnihin û wê nbiaxifin. Hilêr jî wê ji gelek tişt û dever û serborîyên xamgin wê bahs bikê. Wê ne dikarî ji ya xwe basê bikê. Di wê demê de bi şartekê wê kariba wê bahsa wê bikê. Wê dema ku wê karî keçelok qanixkir û ew bir ber banûya kew û ji wê sê pirsên xwe yêmn navdar li keçelok kirin û keçelok ew zanîn wê hinekê wê karibê bibêjê ku ew kiya lê wê dîsa wê nikaribê bibêjê ku ew jina wî ya.

Di wê demê de wê, dema ku ew bû wê, keçelok gelek bi dilşawitî bahsa xwe kir. Wê demê hilêrê gota keçelok ku rewşa te gelek xirab a û were ez qanciyekê bi te bikim. Wê demê keçelok ji wê pirsî ku ew çi qanciyê dikarê bi min bikê. Wê demê hilêrê ji wî re got ku ez zêde nikarim wê bibêjim. Lê ezê te bima piştî wê kaşê he ku ew wê dide destnîşankirin û te bi banûya kew re wê werênima cem hev. Di wê demê ew wê ji te sê pirsan wê bikê. Ku tu wan zanibê wê sewilek mazin ê tiştî zêr wê bide te û wê rewşa te û dayika te wê bi wê re wê hinekê wê xweş bibê.

Di wê demê de keçelok wê xwesteka wê herê dikê û bi wê re dimeşê heta deverek beyer ku wê ti tişt wê li lê nebê. Wê tenê wê weke ku wê dengê cinan wê ji wê re were. Di wê demê de wê ew wê werin û wê xwe bigihênina ber latna bilind û wê hilêr wê xwe dûr bigirê û wê ji keçelok re wê bêjê ku teyê li pêşîya min herê û wê du keç wê te pêşwazî bikin. Têyê bêjê ez bi banûya kew re hevditinê bikim. Banûya kew jî gelek xweşik a û yeka ber xwe xweşikatiya xwe ketîya. Wê dema ku wê kesên ku wê bibînin divê ku ew gotinê li xweşiyatiya wê bikin. Di wê demê de ew wê, piştî wê təkiliyê wê bi te re wê dênê û wê, danûstandinê wê bikê. Piştî ku wê danûstandina xwe bi te re kir wê êdî wê piştî wê pirsên xwe wê ji te bikê ku te pirsên wê zanîn wê êdî wê sewilê tiştî zêr wê bide te.

Keçeleok di wê demê de wê hinekê xûf jî wê bikevina dilê de. Wê demê ku ew hat cem banûya kew wî dît ku wê çendî xweşika. Wê bi çavên xwe yê qaytanên li dora çav re wê çendî wê xweşik bê.

Wê demê banûyta kew bi lêv bû û bi wî re axift. Gotiyê de tu hatî vir û wê dema ku tu bi me re bide û bistênê. Deka sedema xwe bibêjê.

Demaku banûya kew wusa got keçelok hinekê ma sekinî û nizanibû ku ew çi bibêjê. Lê di wê demê de di serê xwe hizirî ku ew çi ji banûya kew re bibêjê. Di wê demê de keçelok weke ku hilêrê ji wê re gotibû wî

gotinên xweşik li xweşikatiya banûya kew di serê xwe de peydakirin û ji wê re gotin. Gotinên wî pîrr zêde li xoşa banûya kew çûn. Di wê demê de banûya kew xwe li hisandina gotinên wî razand. Wusa demekê bi gotinên keçelok re derbas bû. Lê piştî wê weke ku ew banûya kew were li xwe berê xwe da keçelok û ji wî re got ku "tu ne tenê bo ku tu gotinên xweşik û ji dil ji min re bibêjê. Deka sedema xwe ya tu hatî vir ji min re bibêjê.

Hingê keçelok ma sekinî hinekê û piştî wê bi wê re axift û got ku "ez hatîma cem te. Min bihîstiya ku tu çendî bi zane û xweşik î. Wê demê min xwest ku ez bi wê kesa zane û xweşik re wê hevdîtîne bikim û wê bibînim.

Di wê demê de **banûya kew** bahsa gelek tiştan ji zanîna xwe kir. Piştî wê, di wê demê ew de dibin darek kirazan de dima û di wê demê de wê, banûya kew ji keçelok re got ku wê demê tu hati em de dest vala ne vegehihênin. Ezê sê pirsan ji te bikim. Ku tu zanibê ezê sewilek tiştî zêr bidîma de.

Lê ku tu nizanibê wê hemû tiştê ku tu nûha dibîne wê ji berçavê de wê wînda bibê. Di wê demê de keçelok gotiyê "dê ka bibêjê ka tê yê çi bipirsê." ev gotina keçelok hinekê li banûya kewê weke ku bi awayekê ji xwe bawerbûnê lê hat. Di wê demê de banûya kew ku ezê pîrsa xwe ya pêşî bikim ku ka tê zanibê. Piştî wê, jê pîrsî û weke pîrsa xwe ya pêşî. Pêşî gotiyê keçeloko me tu amedeyî. Keçelok got erê ez amede me û li bendî pîrsa te me. Wê demê banûya kew hingê pîrsa xwe ya pêşî kir û ji wî pîrsî ku ev dara kirasê ku tu dibîne em li binê wê na, çend lib kiraz di bin wê de hena.

Keçelok di wê demê de wê dema ku ew wê, got hinekê pêşî weke ku ew hizirî û piştî wê, bi ken gota banûya kew ku wê ki wê vê pîrsê nizanibê. Kesekê ku ew xweşikatiya te dîtîbê wê di cih de wê tê derxê."

Wê demê banûya kewê got êdî wê demê bêja ka tê çi bêjê weke bersivê. Keçelok ji wê hesantir ti tîstî nin a. çend pîr li ser te hebin wê wilqas li bin bi darê ve jî bin. Ev gotina keçelok wê demê banûya kew weke rastiyê herê kir û derbasî pîrsa xwe ya duyem bû. Pêşî ji keçelok re got ku me tu amedeyî. Piştî ku keçelok got ez amede me wê êdî wê pîrsa xwe ya duyem li lê kir û got ku navika dînyê kûdere? Keçelok hinekê li wê hizirî û piştî wê bi awayekê lez xwest ku ew bersivê bide. Wê demê wî got ku "ma ji wê pîrsê jî hesantir wê çi wê hebê." Devera ku tu li ê sekinî wê navika dînyê bê. Heta tu bawer nekê jî wê bi pîva. Piştî wê, hinek weke banûya kewê ma sekinî û piştî wê, bersiv da û gotiyê ev bersiva te jî ez wê rast herê dikim Piştî wê, keçelok xwe amede kir ji pîrsa wê ya dawî

re. Di wê demê de banûya kew wê, demê banûya kew wê di wê demê de wê, pirsek din wê bikê. Wê demê wê ji pêşîya rahişta du gûzan û kira destê xwe û gota keçelok 'dê ka ji min re bibêjê kijna ji van gûzan ji ya din girantira." Keîelok wê demê hinekê li wê hizirî û ew weke ku ew ji wî re weke ku ew zor hat. Lê di wê demê de wî, di cih de weke ku wî xwe gihandibû bersivê. Di wê demê de wî, dîsa heman got ji banûya kew re got û got ku ma ji wê hesantir çi heya û got ku tu kijan ji wan gûzan di avê de herê bikin wê ew wê girantir bê. Di wê demê de wê, banûya kew wê ew wê bersiva keçelok jî wê weke ya rast wê herê bikê. Di wê demê de wê, di wê temenê de wê weke ku wê li wî bersivên hersê pirsên banûya kew dabûn. Hilêr jî wê ji dûv ve wê li keçelok û bersivên wî bihisênê. Di wê demê de wê banûya kew wê rajê sewilê tişî zêr ku ew bide keçelok lê wê dixwest ku ew tişteke din jî wê fêr bibê. Wê demê wê, gota keçelok te çawa ev der zanî û tu hatî vir. Li vir tenê kesekê ku ew ji kesekê pîr bi jîr bê wê karibê derbas bibê û were vir û bibînê.

Keîelok hingê ev gotina banûya kew jî weke pirsekê dît û wê weke azmûnekê li xwe fahmkir. Di wê demê de keçelok li wê hizirî ku ew çi bersivê bide wê. Di wê demê de wê, keçelok hinekê hizirî ku ew çi bersivê bide banûya kew.

Hinekê tevker û piştî wê, ji wê re axift û gotiyê de ev serboriyek zêde dem dirêj a. Ku dema te hebê ez dikarim hemû tiştê ji ter yek bi yek werênima sr ziman.

Banûya kew got dema min heya, dê hedê bêja ji min re ezê li te bihisênim. Keçelok ji serî heta binî biqasî ku ew bibîr dikê wê serboriya xwe wê, ji wê re hanî ser ziman û piştî wê bahsa jîyane xwe û dayika xwe ya faqir kir. Piştî wê got ku ew bo ku ew were çole hinek komuk berhev bikê ew hatibû ew hilêrêkê hatibû ew bi wê re demek dirêj bi wê rengê rûnişt û axift û hemû kul û derdê xwe yê ji faqiriyê ji wê re hanî ser ziman.

De ne, hingê bandûya kew hemû rastî fahmkiribû û wê fahmkiribû ku ew, di bin afsûnek giran de derbas bûya û hemû bîra wî hatiya jê birin. Wî ew hilêr jî fahmkiribû û fahmkiribû ku ew kiya. Lê di wê demê de wê dizanê ku ew nikaribê tişteke jî ji wê re bibêjê.

Di wê demê banûya kew ku keçelok bidawîkir axiftina xwe wê, berê xwe dawî û li lê axift û gotiyê de ku "te çendî ev sewilê zêr bi bersivîna hersê pirsîn min mafkir û hilda jî ku te nûha bi dûrûstî nêz nebûba wê hemû tiştê ku te qizinkirî wê windabûba. Ber vê yekê wê, demê tenê sewilê zêr jî windakiriba. Lê te da nîşandin ku tu ji dil û dûrûstî. Ya ku

ew mafkirî ne tenê bersivdayina te ya li pirsên min bê. Wê ji aliyekê din ve wê dûrûstbûna ya di dilê te de jî bê. Wê wusa got û hinekê ma sekinî. Piştî wê banûya kew wê jî wê, bendek ji berxwe derxist û li destê keçelok girêda. Piştîre gotiyê ku wê ev wê te ji gelek belayan wê xilas bikê. Wê dernexe.

Keçelok hingê wê pîrr zêde wî pîrs li banûya kew kirin ku ew wê çi bela bin ku wê werina serê wî. Lê keçelok çi kir û nekir banûya kew bahsa tişteke bi awayekê vekirî nekir. Hemû gotinên wê sergirtî man di serê keçelok de. Piştî wê, lê wî ji nêhta banûya kew wê başiya wê fahmkir û ew pêbawerî dabû wî.

Piştî wê keçelok rahişta sewilê xwe yê tişî zêr û ji wir hat û dûrket. Piştî wê hat binê darekê û ew hinekê li binê wê rûniştî bê. Hinekê ji wî wîrdetir avek hebû û keçelok jî geleki tî bûbû.

Keçelok di wê demê de xwest ku ew tişteke bibînê ku ew di wê de wê hinek av vexwe. Av hinekê kûr bû û ne dikarî xwe li ser wê bi tawênê û ew avê ji wê vexwe. Ber vê yekê wî hizir kir ku ew zêrên di zewil de ew bi rêjênê ardê û ew sewil di avê kê û avê bi wê werênê û ew vexwe. Lê wê dema ku wî kir ku ew sewilê zêr bi rijênê ardê di wê demê de hilêrê li hemberî wî rûda û lê axift û gotiyê "keçelokê delal neke. Ku tu wê bikê wê hemû zêrên te wê windabibin. Di wê demê de tişteke din jî hebû banûya kew ew ji wî re ne gotibû ku ew bi xwe wê kifşbikê. Di wê demê de ew sekinî li ser dengkirina hilêrê û piştî wê êdî wê ew nekir. Lê hê jî ew xwestek bi wî re hebû ku ew wê bikê. Di wê demê de wî, li hilêrê hisand. Piştî wê, bi hilêrê re rûnişt û axift. Lê keçelok gotiyê ku ew geleki tî bûya û dixwezê ew hinekê avê vexwe. Di wê demê de hilêrê ji keçelok re got ku ev jî wê weke azmûnekê li te bê. Di wê demê de ku te zêrên xwe ji sewil rijandin ardê wê hemû bina ax û wê ji berçavên te wê wînda bibin. Weki din hilêrê tişteke din ji wî re gotibû Ew şerbikê avê ê ku tu wî tişî zêr di dest de digirê ew jî wê şerbikek ne asayî bê. Wê demê keçelok hinekê ma sekinî û di wê demê de wî xwest ku ew wê fahmbikê ku ew şerbik çi ya û çawa ya. Di wê demê de keçelok hinekê li şerbik nerî û hemû tişt weke ku ew di xwezaya xwe dihat dîtîn. Wê demê hilêrê ji wî re got ku ev şerbik şerbikê zêr a. Heta ku tu destê xwe bikiyê zêran ji jê derxê wê zêrên di wê de wê xilas nebin. Her zêrek ku te ew ji wê derxist wê yekê din wê li lê wê zêde bibê û wê, di wê demê de wê, dîsa wê, weke xwe tişî zêr bimênê. Keçelok dema ku hilêrê wusa got pêşî weke ku wî xwest ku ew wê fahmbikê ku ew rast Lê bi tememî valakirina şerbik wê şerbik jî wê, ji berçav wê windakiriba. Di wê demê de keçelok

niza ku ew çî bikê. Hinekî ma sekinî û piştî wê, got ku tu nûha ji min re dibêjê ku ez heta herima malê xwe tî bihêlim. Hingê hilêrê got ez ji ter ne zor a. Tê heta ku tu herê malê tî bimênê têtê nemirê. Lê têtê gelek tiştan qizinc bikê ku tu wusa gihiştî malê. Ber vê yekê divê ku tu wusa xwe bigihênê malê.

Keçelok weke ku ew di bin barekê giran de bê wî xwe hiskir. Di wê demê de wê, xwe di rewşek nebaş de wê weke ku wê hîsbikê. Lê keçelok tişteke bi keçika bûyi hilêr re hîsdikir û ne dikarî ku ew wê bêtê ser ziman. Tenê weke hîsekê ku wî di xwe de hîsdikir. Wî dema ku wî xwe nêzî wê dikir wê di wê demê de wê weke ku wê xwe di wê demê de wê, weke di reng û awayekê din de wê hîsbikê.

Piştî ku ew hat malê bi şerbikê zêran re wê di wê de wê dênê ber dayika û wê rewşa wî ya bi hilêrê re wê werênê ser ziman. Di wê demê de wê, dema ku wê dayika wî bahsa zêran bikê û wê bêtê ser ziman ku ew zêr ji kû dihên wê demê wê meseleya keçika bûyi hilêr, banûya kew û xwe gihandina cem wê werênê ser ziman.

Di wê demê de keçelok wê bahsa wê bikê û wê di wê demê de wê, werênê ser ziman ji dayika xwe re ku "tişteke min di xwe de bi hilêrê û dengê re wê hîsdikir lê min ne dikarî wê, fahmbikim." Wê dema ku wî wusa got wê demê dayika wî gotiyê "kûrê min carna pirr rast a ku mirov li dûv ya ku mirov hîs dikê di xwe de herê. Ev car wê weke ku wê carek wusa bê. Nûha ji min re here wê hilêrê ku tu karibê wê werênê û ez wê biniim wê baş bê. Ber ku wê dayika wî, hinek hîs bi wê re jî çêbûbûn û wê, fahm nekiribû. Hemû tişt weke ku wê dema ku keçelok çawa rûda ku wê ji dayika xwe re hanî ser ziman wê, di wê demê de. Wê li ser dayika keçelok wê bixwezê ku ew xwe xwe bigihênê wê hilêrê û wê bigirê û wê werênê malê.

Keçelok di wê demê de wê ji dayika xwe re wê, bibêjê k u"dayika delal ezê çawa wê, hilêrê ji yên din cihê bikim. Hedê ez wê bibînim jî ezê çawa wê bigrim. Ne tu dizanê ku ew çendî bi baz û lez in. Ti tişt weke ku wê nikaribê xwe bigihênê li wan."

Dayika keçelok wê di wê demê de wê ji wî re wê bibêjê ku "aa kurê min ê delal, wê, hilêrê ku ew te hanîbê heta cem banûya kew wê demê ku tu çûyi wê cihê ku te berê lê rûnihi û bi wê re axiftî û te derdê xwe hanî ser ziman wê demê ew wê dîsa wê were wir. Li vir di wê demê de herê di wê rewşê de wê, li bin heman darê rûniha. Wê demê ew wê li wir te bibîniê û wê were cem te."

Keçelok di wê demê de gotina dayika xwe birrî û gotiyê de dayika min a delal wê, tu çawa dizanê ku ew wê were wê deverê û cem in. ”

Hingê dayika keçelok gotiyê kurê min ma ne te got ku hilêrê got ku hêlina min di qûrmê wê darê de ya. ”Hingê keçelok got erê yadê wê wusa ji min re got. Wê demê dema ku tu herê wir ew wê di wê demê de ku ew ji hêlina xwe derket wê te bibibînê. Keçelok weke ku wê dayika wî ji wî re wê bibêjê wê di wê demê de wê bikê. Wê piştî wê, weke ku wê dayika wî ji wî re wê bibêjê wê, herê binê wê darê û wê li wê rûnihê. Di wê temenê de wê, bêhna xwe vedê. Di wê demê de wê hewa germ bû û keçelok hinekê li binê wê darê dema ku ew rûnişt wê demê çavê xwe gerand ku ew hilêrê bibînê. Lê demek dirêj dît ku wa hilêr ne hat cemê. Tam di wê demê de wê, kar bikê ku ew rabê û ber ku ew rabê wê, ji xwe re wê biaxifê û wê bibêjê ku ”dayê min weke te kir lê ew ne hat cem min” û wê di wê demê de wê, ji wir wê karbikê ku ew were. Wê demê bi carekî wê dengê kir. Di wê demê de wî li dora xwe meyizen lê wî ti kesek ne dît. Di wê demê de wî weke ku ew ji xwe re dangan bikê wê lê were û wê ew wê ji xwe re wê bibêjê ku ”axx ez êdî dangan ji xwe re dibihîzim. Wê demê, keçelok wê cardin wê li dora xwe wê binerê. Lê wî ti deng wî ti kesek nedît. Di wê demê de keçelok wê got ku ”ez êdî din dibim ez ji xwe re dangan dikim” û wê gavên xwe biavêjê ku ew herê. Lê cardin wî dengê got ”keçelokê dilxweşo bisekina û li ser xwe re binerê.” ”Wê demê, keçelok li ser xwe re nerû wî ew hilêr dît ku ew wa li ser çiqilekê darê sekinîya û wê li wî dinerê. Wê demê keçelok di wê demê de ew cardin vegefiya binê darê û wî bêhna xwe cardin veda û di wê demê de wî bi hilêrê re axift û bahsa çawa bûna wê kir. Wê demê hilêrê ji wî re axift û gotiyê de ev care duyemin, sedema ku te hanîya vir çî ya dêka min re bibêjê. Keçelok di wê demê de wî weke ku wî ne xwest ku ew bibêjê. Lê di wê demê de wî. Ne xwest ku ew bi carekê destê xwe dênê ser wê û wê bigirê jî. Wî ew jî wê rast nedît. Hingê keçelok di xwe de biryarek da. Wî biryar da ku ew rastiye ji hilêrê re bibêjê û ji wê re bibêjê ku dayika wî xwestiya ku ew wê bibînê. Wî di wê temenê de wî zan kir ku wê hilêrê wê herê bikê ku ew were bi dayika wî re rû bi rû were.

Keçelok di wê demê de wê, dema ku ew wusa li wê dihizirê, hilêrê wê weke ku ew ya ku ew di aqilê wî de derbas dibê wê bixwênê wê li wê binerê û wê, di wê demê de wê, rastarast wê awirên xwe bibê ser wî û çavên wî. Dema ku keçelok bi wê re weke çav bi çav hat, hingê wê di wê demê de ma sekinî û wê, demê weke ku hilêrê wê fahmkir ku ew çî di wê demê de di aqilê xwe de ew bi wê dihizirê. Di wê demê de hilêrê wê

hinekê din wê bimînê û wê piştî wê, ji keçelok re wê bibêjê 'keçeloko dêka ji min re bibêjê ku tu çî di serê te de derbas dibê.

Wê demê gotinek hat aqilê keçelok ku ew wê bibêjê. Wî bi xwe re nizanî ku ew ber çî ew gotin hat aqilê wî. Lê gotinek bi wê rengê bû ku hat aqilê ku wê, bibêjê ji hilêrê re ya ku ew di aqilê min de derbas dibê tu dizanê û ber çî tu wê dipirsê. Di wê demê de ev hizra ku ew ya di serê wî de dixwênê ji awirên çavên wî, di serê wî de çêbû. Keçelok hinekê nbi aqil bû. Di wê demê de hizir kir ku ew ya serê wî bixwênê û ew wê nedê dîyarkirin wê demê ew weke ku ew dixwezê wî bi ceribênê. Ev hizir di wê demê de di serê wî de bû û çêbû. Keçelok di wê demê de li wê hizirî û ew di wê demê de wê, ji wê hizrê wê derbas nebê.

Piştî wê keçelok hinekê din weke ku ew hizirî û rastarast hat ser gotinê û ji hilêre got "ku ez çî ji te veşêrên jî ez nikarim ji xwûdê veşêrêm. Dayika min ez şandim ku ez te bigrim û bibima hemberê wê. Dayika min jineka baş, bi aqil û bi zane ya. Wê tiştêkê bi te nekê. Lê dema ku min bahsa te kir û min got ku weke ku ez û tu bi hev re axiftin û min ji wê re got û wê hemû tişt zanî wê li ser wê xwest ku ew te bibînê. Hingê ji devê dayika min gotina ev ji min re beyênî nayê derket. Wê demê wê xwest ku ew te bibînê."

Hingê hilêrê gota keçelok "keçeloko tu hemû tiştî ji dayika xwe re dibêjê. Hemû tiştê ku ew dihê serê te ji dayika xwe re dibêjê." keçelok hingê got herê û ma sekinê. "Wê demê hilêrê pirsek din ji keçelok kir û got ku "dayika hemû tiştê ku ew hatiya serê te û te kiriya ma dizanê" Wê demê ev pirs wê weke ku wê hinekê li keçelok zor hat. Keçelok got ku "min çî dît û jîyan kir ji wê re gotiya. Ew dayika min a. Wê hertimî rêya rast şanî min daya."

Hilêrê got ku "Wê demê dilê te bi dayika te ve ya." Hingê keçelok weke ku ew hinekê beşîşi û gotiyê "erê geleki jî dilê minbi dayika min ve ya. Ez bi wê hema." Wê demê ev gotina keçelok weke ku ew li xoşa hilêrê çû û wê got ku Cihê dayikan hertimî li ser serê mirov a" Ev gotina hilêrê wê demê keçelok wê, got ku Ev gotin di aqilê min de jî derbas bûya." Hingê hilêrê gotiyê "di aqilê te derbas bûbê jî te bi lêv nekir." Wê demê keçelok ma sekinî û hinekî li ser wê gotina hilêrê hizirî û gotiyê te rast got.

Hemû gotin û axiftinên hilêrê wê weke ku wê ceribandina keçelokî bin. Di wê demê de wê, dema keçelok bi dilekê safî û baş nêz bû û gotina xwe bi dîrûstayî hanî ser ziman êdî hilêrê gotiyê "keçeloko ezê bi te re werima cem dayika te. Lê piştî wê şartekê min wê hebê ku tu wê werênê

li cih. Ku tu xwe bide ber şartê min ezê aha nûha bi ter werima cem dayika te.”Keçelok di wê demê de hinekê hizirî û piştî wê bi nerînek weke ku ew di xwe de lê dipirsê bersivê da hilêrê. Keçelok weha got ku ”ez nizanîm ku şartê çî ya. Lê ez bi dil û can wê herê dikim. Ku tişteke were hanîn li cih bê ezê wê bînim li cih. Ku tişteke weke ku ez bidima te bê û di destê min hebê ezê bidima te, ku tişteke ku ji min bixwezê û destê karibê bigihijiyê de, ezê xwe bigihênimê û ezê wê bidina te. Ku tişteke li dûr bê ku ez pêwîst bim xwe bigihênimê ezê xwe bigihênimê û wê werênima ji ter. Ku ew tişt çî bê ezê wê bikim. Bila ev jî soza min bê û wê weke peymanî di nava me de wê herê bikê. Di wê demê de hilêre gota keçelok axx keçeloko te bi dil nazikî û safitîya xwe li min da girêdan. Temam dê em herin cem dayika te û di wê demê em bi wê re hevdiştinê bikin. Bi hev re bi dest çûnê kirin. Hilêrê gelek piçûk bû. Wê xwe danî ser milê keçelok. Dema ku di gihîştina dahma hinek kesan wê xwe di bin bastika wî de wê bigirê ku ew wê nebînin. Di wê demê de ew gihîştin malê di wê demê de bi hev re hatina hemberî dayika keçelok. Wê dema ku ew gihîştina hundur hingê keçelok çû hemberê dayika xwe û sekinî û ji wê re got ku dayika min baş û delal va min hilêrê ji ter hanî. Weke ku te ji min xwestibû, va ya.

Hingê dayika keçelok bi awayekê weke ku ew bi nerînek zêde kûr li wê nerî. Wê demê hilêrê wê weke zindiyek piçûk ku qey keça mista destê mior tiştî dikir. Lê dengê baş ji wê derdiket. Dayika keçelok di wê demê de wê dengê wê balê wê bikişênê. Wê demê wê xwest ku ew wê bide axiftin. Ber ku wê dengê wê hertimî wê tişteke dihanî berbîra wê. Lê wê ne dizanî ku ew çî ya. Piştî wê, demekê wusa lê axift û di wê demê de hilêrê wê bahsa xwe kir. Tenê gotinek got. Ne dikarî bêjê ku ew keça şah a. Ku wê gotiba ez keça şah im wê di cih de wê ji berçav wê windabûba. Ber vê yekê got ku ”ez wê male min a li ser hemûyan re me.” Wê demê dayika keçelok a bi aqil wê weke ku ew wê fahmbikê. Lê wê fahmkir ku ew weke gotinek ku ew nikaribê wê werênê ser ziman wê fahmkir. Ber vê yekê wê, jî ew ne hilda li dest.

Wê weke ku wê di nava civakê de wê were ser ziman wê gotinên weke yên ku ew ne dihatina ser ziman û bi lêvkirin wê hebûban û wê, ev weke gotinek ku wê bo hilêrê wê dît.

Dayika keçelok ew hinekê din ew bi aqil bû. Ber vê yekê wê di demê de wê fahmkir ku ew di wê demê de ew, dema ku ew diaxift wê, gotinên xwe bi hevokî wê bi tememî wê weke ku wê avabikê û wê bide zanîn ku ew çî dikarê wê, werênê ser ziman. Lê weke ku wê di dema axiftina xwe

de wê hilêrê wê di hevokê de wê kijan bêjeyê wê weke peyv wê werênê ser ziman wê dîyardikir û peyvên ku wê ne dikarê wê bibêjê wê, ji ser wan re diqavist. Weke ku ew di hevokê de wê cihê wan wê vale bihêlê û wê bide dîyarkirin. Di wê demê de wê dayika keçelokî weke jineka navxwerî xwe û pirr zêde wê weke ku ew bi aqil wê di cih de ev rewş di axiftina hilêrê de wê fahmkir û wê weke ku wê tiştina ku wê, bi hatina serê ve wê girêdayî bê wê werênê ser ziman.

Di wê demê de wê, dayika keçelok wê hinekê wê di wê temenê de wê hêstek li wê dikişand. Wê weke ku ew dengê wê li wê nas dihat. Lê wê di wê demê de wê ne dikarî ku ew fahmbikê û ankû wê tê derxê.

Lê piştî wê di wê demê de wê, gelek pirsên ku wê di serê xwe de wê avakiribûn wê ji hilêrê wê pirsîn. Hinek ji wan wê hilêrê wê bêbersiv wê bihêlê. Yan jî wê bersivna ne rastarast wê bide wan. Di wê demê de wê gotina ku wê dayika weke navê dêûbavê te çi ya ku wê bibêjê wê bi gotina ku wê di destpêkê de wê gotibû a bi rengê ji male mazin wê bi lêvkiribû û bi wê re bi sînor mabû. Wê gotinê wê dayika keçelok wê di serê xwe de wê li wê bihizirê û wê bixwezê ku ew wê fahmbikê ku ew wê di wê temenê de wê ki bê. Di wê demê de ew di serê xwe weke ku ew gihiştibû hinek encamna bi wê rengê. Wê di wê demê de wê, di rengê ku wê dihanî ser ziman û bi derûnîya ku wê gotin bi dengekê bi lêv dikirin wê di wê demê de wê, ew wê li wan wê bihizirê û wê bixwezê ku ew wê fahmbikê. Di wê demê de wê, hilêrê wê di wê demê de wê, heta nêvî şevê wê, di wê demê de wê, bi wê re wê bimênê. Wê weke ne xûyê hilêran bê ku ew serê xwe dênina ser lingê mirovan û di xewê ve herin. Lê wê demê wê, serê xwe danîbû ser lingê dayika keçelok û di wê demê de ew weke ku ew di xewê ve herê wê ji xwe re wê herê.

Wê rewşê wê bale wê kişandibû û wê di wê demê de wê di dilê xwe de got ku di wê karê de karek heya. Wê demê wê dema ku wê ev got kurê wê keçelok ev bihîst û wê, di wê demê de wê, piştî wê, ew hinekê li ser wê hizirî

Dayika keçelok wê demê ku ew di xewê ve çû wê demê wê rahişta wê hêdîka û pirr danî cihekê pirr xweş û baş ku ew li wir bi rehetî razihê. Di wê demê de wê cihekê weke ku wê deverek ku wê hilêr xwe li wê rehet hîsbikin wê, çêbikê û wê li wir danî. Piştî wê dayika keçelok ew hat cem keçelok û wê bi wê re wê bi dest axiftinê kir. Wê demê wê, di wê rengê de wê, bahsa xweseka xwe ya bi wê re axiftinê a ku wê gotibû wê bigira wê hanî ser ziman. Wê demê keçelok di wê demê de wê, di wê rengê de wê ji wê re wê bibêjê ku "dayê min wusa nekir. Min bi xweşikati bi wê re

axift û bi awayekê dûrûstayî ji wê re got ku ew dayika min xwestiya wê bibînê û bi wê re biaxifê. Wê jî wê di wê demê de hinek pirs li min kirin. Pirsên wê li ser wê bûn ku wê ber çî te ew xwestiya. Min gotiyê ku ez nizanim. Piştî wê, hilêrê gota min şarte min heya di berdêla ku ez werim têtê wê werênê li cih. Min jî şerê wê herê kir û ji wê re got ku ev bila soza min ji ter û peymanê nava me bê.”

Dayika keçelok di wê demê de wê ji wî re got ku te rast kiriya kurê minê delal û bi aqil. Te bi aqilî kiriya û te bi aqilî ew hanîya wir.” Piştî wê dayika keçelok gotinên xwe weha berdeqam kirin. ”Min di destê wê de hêste nas hêskir. Ev hêst hê dema ku te ew ji min re gotibû û hanîbû ser ziman min fahmkiribû ew hêskiribû. Sedema ku min xwest ku ew wê bibênim ew a. Lê min gelek tiştên ku bi wê re min fahm nekiriya ew bi wê re hena.”

Keçelok wê piştî wê, di wê demê de wê, ji dayika xwe pirsî ku ew kiya. Dayika wî got ku min ew tê dernexist. Lê di wê nûqteyê de wê, hinek nepeni wê hebin û wê, şartê wê weke ku wê bi wê ve wê girêdayê bê. Kûrê min ê delal ew hîs bi min re çêdibê ku ew ew şartê wê te bigihênê wê bersivê ku ew ki ya.”

Wê dema ku dayika keçelok ev got wê demê hingê wê pîrr zêde wê mereq wê di serê keçelok de jî wê bi wê re wê çê bibê. Wê demê dayika keçelok ew hinekê din ew hizirî û wusa demek dirêj ma. Piştî wê demekê ew rûnişt li kûrê xwe û ew hinekê din wê bi wê re wê bi dest axiftinê kir. Di wê demê de wê, dema ku wê, dema razanê hat wê demê keçelok çû ser nivîsênê xwe û dayika wî jî çû ser nivîsênê xwe.

Di wê demê de wê hilêrê wê dema ku wê çirayên wan finda wan hat kişandin li binî û agira wan hat mivirtin û pê de wê piştî wê ne bi gelekî ew wê dîsa wê şîyar bibê. Lê wê dema ku ew şîyar bû jî ew ji cihê xwe ne çû. Wê xwe ku ew di cihê xwe de ew bimênê. Wê wusa xwe rehet kir. Heta derketina rohiya sibehê wê xwe wusa hişt.

Di wê demê de keçelok hat û nêzî tişta ku ew weke kesekê xwe dide dîyarkin zêde ku ew nêzî wê dibû weke kesekê piçûk xwe dide dîyarkirin. Di wê demê de keçelok êdî di xwe de wê qinyatê dide dîyarkirin ku ew qatî ew keseka. Ku ew ne kesek bê ku ew çiqilek ba ku ew hinekê bi nêz ve çûn ew divîyaba ku ew gûharî ba. Yan jî ew renegekê din bistanda. Lê wê reng û awayê xwe weke ku wê parast.

Bi zêdeyî jî ew weke zaroyekê dihat berçavê wî. Keçelok çend ku ew nêz dibû ew di wê rengê de wê kifşdikir. Di wê temenê de ew hat hinekê din nêzî û dilê wî zêdetirî weke ku wê lê bikê kutakut. Di wê demê de wê, demê keçelok êdî li xwe ne hanî li ew rêya xwe ji ser bide alikî. Di wê demê de wî ji xwe got ku "ma mêrenî mriya" û di wê demê de wê gavên xwe bi ber pêşde wê bide avêtin.

Ew hinekê din çûn û wê carê keçelok bi rastî jî wê kifşkir ku ew wa zaroyek a. Di wê demê de keçelok hat wê derê û di wê demê de xwest ku

ew zaroyê zêdetirî herê cemê. Zaroyek ma wê çî ji wî bikê. Di wê demê de ew li wê hizirî ku ew zaroyek li vê daristan bitirs û devere bêkes çî karê wê wê heya.

Keçelok ev got û hinekê din bi cem ve çû. Zarokê xwe ne da alikî û ne jî bertekê ji keçelok tirsandinê dana dîyarkirin. Keçelok ew farqkir û li wê hinekê şaş û hey ma. Di wê demê ku ew hinekê din bi cem çû dît ku ew wa zaroyek piçûk ku ew digirî û dibêjê 'yadê!' û "bavo!" Lê ti kesekê jî wê li dorê nîn a.

Keçelok hat û li cemê sekinî û pêşî xwe bi zaroyê weke ku ew kesekê mazin bê pê da nasin û ji zarokê re got ku navê min keçelok a." Dema ku keçelok wusa got zarokê pirsî ku çima navê te keçelok a. Ber ku tu bê por û keçel i? Keçelok got ku herkesek wusa dibakê min. Dayika min jî bin re dibêjê "kurê min ê keltoş" Wê dema ku keçelok wusa got zarok weke ku bi ken bê. Ew derûniya zaroyê a pêşî ku wê weke uya girî bê wê reng bi gûharênê û wê weke derûniya ken wê li zaroyê wê serwer bibê.

Keçelok di wê demê de ew hinekê bi zarokê re ma û pêre danûstand. Zarok piçekê din li wî serwer û serdest bû. Lê vebû. Piştî wê keçelok bi zaroyê re zêdetirî bi dest axiftinê kir û tiştên ku wê weke xweşbin wê jî zaroyê re wê bidest gotinê wê bikê. Di wê demê de keçelok ku wî hinekê zarok xweş û dilxweş kir wê piştî wê, ji zaroyê re wê bipirsê ku ew kiya û li wê daristanê bi tenê çî karê wê heya. Piştî wê keçelok jî zaroyê re dibêjê ku ewder bo zaroyên bi tenê ne ewleya. Ber çokên dê û bavên wan jî wan cihê ewleya.

Piştî ku keçelok ew got zaroyê bi devekê nazin û zimanekê weke kelegirî got ku min dê û bavê xwe livir windakirina ez li wan digerihiim. Di wê demê de keçelok dibêjê û dipirsê ku ew çî karê wan li wê daristanê bûna û ew bi rêwitiyekê ve diçûn. Piştî keçelok dibêjê min re cihê ku tu herê ji min re biêja ez soz didim te ku ez te bibima cihê wê û te bi dê û bavê re bënima cem hev. Piştî wê zarok hinekê din li xwe dihê û jî keçelok re bidest axiftinê dikê û ew dibêjê ku dê û bavên fariştayên parastina daristanê na. Em li vir di nava wê de dijîn. Em di darekê de dijîn. Di wê demê de dema ku zaroyê wusa got keçelok di wê demê de lê me hey. Di wê demê de wê nizanibê ku wê çî bibêjê. Lê keçelok di wê demê de wî, bi zaroyê weke ku ew li lê germ bibê lê hat.

Piştî wê keçelok û zarok bi hev re demekê wusa man li hev. Bi hev re axiftin û danûstandin. Zaroyê bahsa xwe kir. Di wê demê de keçelok jî bahsa xwe kir. Çendî ku ew zaroyek bû ji jêre negot ku ew ji min piçûktira û zaroya û li wê nenerî û ji jê re bahsa xwe û jîyane kir.

Ew di wê demê de demekê wusa li hev rûniştin û piştî wê, bi hev re di rê de meşin di nava daran de. Dengê qirça qirça daran şikeştina darkê rezî ji bin lingên dihat.

Keçelok di wê demê de ew bi hev re hatin û di wê demê de ew ku ew hinekê çûn wê demê dît ku wa şerek bi ber wan ve hat. Weke ku ew hêrîşî wan bikê bi ber wan ve bi baz hat. Lê zaroyê tiştekir di wê demê de û xwe ji şêr xilas kirin. Keçelok ji tirsê famnekir ku ew çî û çawa bû. Piştî wê ku ew hinekê bi ser xwe ve hatin zaroyê destê keçelok girt û di wê demê de weke ku ew li xwe haşkir. Piştî wê keçelok weke li xwe hat.

Di wê demê de keçelok di awayekê de dît ku wa di wê demê de çend xezal wê li deverê weke di çêrin. Ew di ber wan re çûn lê yek jî ji wan ji wan nerawî. Di wê demê de keçelok ji wê ma acêbmayî. Di wê demê de zaroyê piçûk ji keçelok re got ku ew xezalên k uew du wan dibîne ew di aslê xwe de hinek farişte na.

Piştî ku zaro wusa got bi carekê ew hemû bûna çend keçik ku ew ji hev xweşikîr. Ew bi ber wan ve hatin û ji wan re axiftin û bi wan re alaquadar bûn. Weke ku ew di nava afsûnekê de bimênin li wan hat. Keçelok di wê demê heya wî li ser wan keçikên xweşik bû. Di wê demê de yek ji wan jî ku ew jî pirr xweşik bû û keziyên pova li ber guzeka wê disekin in wê bibê û ew tenê bi çavên xwe yên kûr û reş li wan dinerî. Di wê demê yekê yek ji wan ku ew nêzî keçelok bû û got ku 'navê min sêwê ya' wê, got ku ew dayika me ya. Hertimî ew çavê wê li ser me ku ew me bi parêzê. Keçelok ji awirên wê xwe di rewşek zêde xirab de hîs dikir û weke ku avek qarîsî bi serê wî de were rijandin ew xwe qaşagirtî hîs dikir.

Piştî wê, ku wan li wir bi wan re demek xwe derbas kirin wê bi hev re wê ji wan wê derbas bibin. Di wê demê de wê, keçelok heta ku ew ji wan keçikên xweşik derbas bû jî heya xwe ji bejnûbale wan ne birrê.

Piştî ku ew ji wan derbas bû ew hat ber avekê ku ew weke ji bin ardê derdiket. Zaroyê di wê demê de wê, dema ku wê destê xwe da avê weke ku ew av bibê bahrek piçûk lê hat. Di wê demê de wî ji keçelok re got ku ev av ave avdana hertiştê ya. Ew sehên mirov ên bihîstin, dengkirin û dîtîne geş xort dikin. Hîsên mirov zêdetir bi hêz dikê. Mirov xwe bi wê re zêdetirî bi fahm dibê. di wê demê de wê av wê hertiştê wê te bigihêne tiştên nû di hişê te de. Ev av hemû tirhikên bi dar û şînayîyan ve ji wê hîmê xwe digirin û dibin. Ev ave çavkaniya daristanê û hemû şînayîyan a. Keçelok ji wê hinekê vexwert û pirr lê xweş hat. Piştî xwest ku ew carek din vexwe. Lê zaroyê got ku tenê carek tu dikarê wê vexwe û ne

hişt ku ew carek din nêz bibê. Lê keçelok sedema wê pirsî lê zaroyê negot. Tenê got ku tê yê wê fêrbibê ku ew dema wê hat. Weke mazinekê gotin bi wê rengê ji devê zaroyê derket.

Piştî wê keçelok û zaroyê bi hev re hinekê din çûn hingê, keçelok dît ku wa keriyek gurr wê bi ber van ve wê bazdidin û weke ku ew pirr birçîna û ew wê wan bixwûn. Lê zaroyê tiştê kir û ew gûr bi carekê weke ku wan ew nedîti derbasbûn. Hingê keçelok baş fahmkirin ku zarok xwediyê hinek teybetiyên afsûnê ya û ew dikê tiştan bikê û pêkbênê. Di wê demê de keçelok ew ji zaroyê re got. Wê demê keçelok bi zaroyê axift û bahsa hêzên wê kir. Zaroyê ew herê kir. Lê piştî wê got ku em hêzên xwe nikarin li hemberî hev bikarbênin û bo hev bikarbênin. Ber vê yekê ez nikarim bo dîtî dêûbavê xwe bikarbênin. Em tenê di hinek şertûmercan dikarin wê bikaerbênin. Keçelok çendî ku wî pirsî jî carokê got ku ez nikarim wê bibêjin. Piştîre got ku her gotin û pêkhanîn wê berdêla wê hebê. Ew bi qanci jî dibê û bi xirabi jî dibê. piştî wê keçelok wusa zêde israr nekir. Di wê demê de keçelok bi zarokê re bidest meşê kir. Wî weke ku ya armanca xwe ya bi rêwitiya xwe jibîrkir lê hat. Weke ku ew ketibê bin bandûra tiştê de lê hat.

Piştî wê keçelok û zarok hatina ber darek weke şitlekê piçûk û ku ew tenê weke ku tu teliyan ji ardê bilind bûyî. Zarokê got ku male me li vir di wê darê de. Keçelok zan kir ku ew darên mazin ên li dorê qast dikê. Wî li dora xwe nerî. Lê zarokê got ku li dora xwe nemezê. Wî bi teliya ew nîşankir û da nîşandin. Piştî wê keçelok fahmnekir ku wê li wir wê çawa wê, kes wê bijîn. Di wê demê de zarokê tiştê kir û dît ku ew dar wusa mazin bû ku weke ku wê qasrek di wê de hebê. Keçelok ji wê ma acêbmayî. Di wê demê de wî nedizani ku ew çî bibêjê.

Piştî wê zaroyê keçelok dewetî malê kir û bi hev re çûna malê û di wê demê de demek dirêj keçelok bi zaroyê re derbas kir. Piştî wê, bi hev re xwarin jî xwarin. Keçelok dema ku xwarina ku zaroyê hanî ber wî xwar wî zankir ku wî heta wê demê xwarinek wusa xweş nexwariya. Hingê lê xweş hat.

Piştî wê keçelok di wê demê de ew ku wî xwe ji ser sofreyê bi şunve kişand. û weke ku wî têrxwar. Lê çendî ku wî têr xwar jî weke ku wê, hê dilê wî herê xwarinê û wê bixwezê ku ew bixwe. Di wê demê de zaroyê gota keçelok tiştê herî mazin ew ku mirov nekaribê kesê derve. Ew ew bê ku mirov karibê xwe bê.

Keçelok di wê demê de ew bi zaroyê re ma. Lê piştî wî demekê wê bi carekê wê weke ku wê ji tiştê mejiyî wî serbest were berdan wê tiştên

ku ew di serê xwe de berê dihizirî wê werina bîra wî. Heta wê kêlikê weke ku ew di xewê de bê. Keçelok di wê demê de wê, zaroyê ew bir mezelekê ku ew pîrr xweşik rayixistî bê û di wê de neynikek mazin hebû. Keçelok ber çî ew neynik wusa mazin a wî bahsa wê kir. Zaroyê got ev tenê neynika. Tu di wê de kesekê ktu dixwezê bibînê tê yê bibînê. Tiştên ku ew di demên bûhûrî de bûna wê berênê berçavên de. Tiştên ku wê werina pêşîya te wê şanî te bide. Di wê demê de keçelok wê dema ku wê wusa bibêjê dayika wî hat bîra wî û wî pîrr zêde xwest ku ew wê bibînê. Weke ku zaroyê mejiyî wî xwand û ew fahmkir. Piştî wê gota keçelok çî di dilê de derbas dibê, tu dikarê destê xwe bide neynikê wê şanî te bide. Tu dukarê di wê re derbasî hemû deverên ku tu li wan dihizirê û tu wan dibînê bibê.

Wê demê zaroyê keçelok hanî ber neynikê û gota keçelok destê xwe bidiyê. Keçelok destê xwe dayê û di wê demê de dayika wî û hilêrê bi carekê hatina berçavên wî ku ew li malê rûniştî na û dayika wî pîrr zêde bi hazn bê. Wê demê dilê wî xwest ku ew nûha li cem dayika xwe bê û dest bidiyê. Hingê zaroyê ew ya dilê wî xwand û gotiyê ku ew ya ku tu nûha di dilê xwe de dihizirê neynik wê dibînê û tu dikarê herê cem wê û destê xwe bide dayika xwe.

Di wê demê de keçelok pîrr zêde xwest ku ew herê cem wê. Heta ku zaroyê dema ku wê wusa got keçelok gavek bi pêşde jî avêt. Lê keçelok piştî weke ku ew bi carekê xwe bi şûn ve kişand. Ber ku ew hinek tiştên din hatina berbîra wî. Wê dema ku tiştên din hatina berbîra wî. Di wê demê de keçelok tiştên ku ew hizirkirin neynikê weke ku wê nexweş ku wan bide nîşandin. Yan jî nekari ku ew wan bide nîşandin. Di wê demê de bi carek reş bû. Keçelok hingê ji zaroyê pirsî ku çî lê hat. Zaroyê got ku wê hinek tiştên li pêşîya te ku tu yê bijî hebin. Lê neynikê nekarî wan ji ber wê afsûna li ser te wan bide nîşandin. Hingê keçelok got ku 'çî afsûna li ser min' û ma sekinê li bendê bersivê. Lê zaroyê bersiv neda. Got ku ez nuha nikarim bibêjim. Ez bêjim wê encamê wê yên xirab wê bo te hebin. Pêşî tu divê ku wê şerê hilêrê werênê li cih. Dema ku zaroyê wusa got ew zêdetirî ji keçelok re acêb hat. Di wê demê de keçelok zanî ku ew tiştina ku ew pêwîst in fahmbikê hena. Lê di wê demê de wî pêwîstî bi wê dît ku ew rêwîtiya xwe bi dewam bikê. Wê dema ku ew li wê hizirî wê dema ku bilbilê zêrîn bi şad dixwand û bilbiland ji wî re û wan hêstên ku ew di wê demê de di xwe de jîyankirin hanîna bîra wî. Lê wî dîsa ti encam weke wê cara pêşî ji wan dernexist. An jî nekari derxê. Piştî wê keçelok ma sekinî. Piştî ku ew hinekê bêdeng ma sekinî ji zaroyê

re got ku ew pêwîsta te bigihênê dêûbavê de û piştî wê, rêya xwe bidomênê. Piştî wê hinekê din ew man li hev di malê de û piştî derketin. Ew hatin wê devera pêşî ku wan dîtibû. Keçelok tiştên ku wî jîyan kirin wî dikir ku ew wan fahmbikê. Lê di serî wî de gelek tişt û aliyên ku wî fahm nekir û wate ne dida wan hebûn. Di wê demê de ew ji wî re weke barekê giran lê dihatin û wî zêde didana hizirkirin. Her ku ew nêzî çîyayê qafê dibû ew bargîranî zêdetirî bi wî re bi hizirkirinên wî re çêdibû.

Keçelok û zaro ew ji malê derketin û hinekê din di nava daristanê de gerîyan. Di wê demê de keçelok û zaro ew ku ew qaderekê ew hatin hingê keçelok dît ku wa rohniyek zêde mazin û geş wa rûda. Hingê ew rohni wusa geş bû weke ku çavên mirov ti tişt ne didît. Di wê demê de keçelok di wê demê de hinekê ma sekinê û çavên miç kirin. Di wê demê keçelok hizirî ku ew çî ya. Di wê demê de dengê hat keçelok ew deng weke yê zaroyê bê. Keçelok di wê demê de bi ber zaroyê ve çû û zaro himbêz kir. Di wê demê de wî dengî gota keçelok ku di cih de ji zaroyê durkeve lê wêgelek tiştên xirab wê werina serê te. Di wê demê de keçelok gelek tirs ket dilê wî de.

Keçelok hinekê din ma û li devera ku deng ji wê dihê li wir ve nerî. Lê wî kes nedît. Piştî wê zaro weke ku ew deng nas bikê derket li pêş û got "bavê!" û ma sekinê. Hingê zaroyê gota keçelok ku ew dengê bavê min a. Lê deng zirtên xwe yên li keçelok domandin û di wê demê de keçelok nizanî ku wê çî bikê. Di wê demê de zaro derket pêş û bersiv da bavê bavê xwe û gotiyê "yabo, ew ne kesekê xirab a. Wî ali min kir." Di wê demê de deng sekinê û di wê demê de wê kesekê weke ku pîrr zêde levhatî dît ku wa derket li holê û bi ber wan ve hat.

Keçelok di wê demê de keçelok û bavê zaroyê hevdu dîtin û dest dana hev. Silev dana hev û ew hinekê li hev rûniştin.

Piştî wê, keçelok û nava bavê zaro pîrr zêde xweş bû û ew demek dirêj li hev reniştin û ji hev re bahsa serboriyên xwe kirin.

Di wê demê de keçelok bahsa rêwîtiya xwe ji wî re kir û ew jî lê hisand. Di wê demê de bavê zaroyê keçelok dewetî male xwe kir û xwarinek din a xweş danî berê û bi hev re xwarin. Gotiyê de "ji adetê ya ku em kesekê dewetî male xwe bikin em xwerinê dênina ber û bi hev re bixwûn." Di wê demê keçelok bahsa windabûna wan a zaroyê kir. Di wê demê de zaro got ku dêbavê wan windabûna. Di wê demê de bavê zaroyê hinekê xamgin bû û di wê demê de weke dilê wî êşîya. Û li nava çavên keçelok nerî. Di wê demê de wî ji keçelok re got ku derdeke me yê mazin heya.

Wê dema ku keçelok got ku ma derde wan çi ya hingê bavê zaro pêşiyê gotiyê ku dema te hebê ez dixwezim ji ser werênima ser ziman. Wê demê keçelok dema min heya û lê hisand. Di wê demê de bavê zaro got ku "periyên daristaniyê na. Demekê dirêja ku em li vir dijîn. Lê rojekê kesek hat vir û pelera me dizî û bi xwe re bir. Ew jî pêşkêşî şah welate dewlemendan kir. De ne ew welat pêşî ne dewlemend bû. Lê roja ku ew pelera me pêşkêşî şahê wê welat kir êdî hemû tiştê wî bû û li welatî wê xweş û dewlemendiyek bêsinor ku mirov wê bikarbênin wê bibê. Di wê demê de wê daristan jî wê kêmbibin û faqir bibin. Hin bi hin daristanên me zûwa dibin û darên daristanê hişk dikin. Em nikarin pêşiya wê bigrin heta ku em xwe negihênina **pelera** xwe. Di wê demê de keçelok hinekê ma sekinî û piştî wê ji bavê zaroyê pirsî ku ew çima nikaerin herina nava mirovan û wê bixwezîn. Wî got ku em herin wê me bigrin û emê dil bikevina dest. Wê demê wê hemû tiştê xwezayê wê winda bibê.

Bavê zaroyê ji keçelok xwest ku ew alikariyê bide wan û ew herê pelera wan ji destê şah hilde û wê werênê. Di wê demê de wê peler weke ku wê xwediyê hêzek afsûnî bê û wê kesê ku wê avêt ser xwe wê di bin wê de wê ji berçav wê winda bê. Wê demê keçelok got bila û di wê demê de wê bi alikariya bavê zaroyê wê were aliyê din ê daristanê ku wê rêya wê bi welate dewlemendan dikeve.

Di wê demê keçelok hingê di wê demê de wê, êdî wê xatir ji wî bixwezê û wê herê. Bavê zaro jî got ku emê xwe li dora te bigirin bo ku em te bi parêzên û karê te rast herê serê. Di wê demê got ku dayika zaroyê bi rêyan ketiya ku ew wê bibînê û heta ku ew wê nebînê jî wê newê malê. Lê ew ghiştin destê me wê hingê wê ew jî wê hîsbikê û wê were malê.

Piştî wê keçelok got bila ezê bikin ku wê bidest bixim û werênima destê we û ji wan vaqatiya û ket rêya welate dewlemendan de.

Keçelok hingê wê demek dirêj wê bimeşê. Di wê demê de wê, dema ku ew demek dirêj wê were ber malek ku ew di destpêka keçtina welêt de ya li wê sekinî û çû ber devê deriyê wê û li deve derî da. Piştî wê keçelokê li deve dêrî da wî dî ku wa kesekê gir û digurd wa hat devê dêrî vekir û gotiyê ku ma tu çi kesî û di hatî li deve deriyê min dixê. Di wê demê de mêrê digurd ji keçelok re got ku ew hatiya ber dêriyê ber çi? Keçelok ku ez dixwezim herima welatê dewlemendan. Wê demê mêr digurd gotiyê ku ma tê çima herê welatê dewlemendan.

Keçelok got ku ezê li wir kar û xabatê bikim û wereqayan qizinc bikim. Piştî wê, keçelok hinekê din bi mêrê digurd re axift û di wê demê de wî mêrê digurd lê pîrr kêfa wî hat û ji wî re got ku "hema were li vir bijî.

Evder ware dewlemendan a. Male hemberî med vala ya xwediyê wê çûya û kes nizanê çûya kû. Li vir kes ti tiştê nakirê û bo wê zêr û ankû ti weereqê nadê. Tenê her tiştê ku ew heya ku tu li kû xwest têyê bijî. Kes tevli yê din nabê. Herkesek pênc rojan kar dikin û pênc rojan ti karê nakin. Wan pêncrojan jî tiştên ku ew qizinckirina dixwûn.”

Piştî wê keçelok got bila û di wê demê de keçelok ket wê male hemberî ya male mêrê digurd û di wê demê de wî weke wî male xwe çêkir. Di wê demê de wê her roj wê sofrayê wê ji xwe re wê sibehê, nivro û êvarê wê bi gelek cûreyên xwarinê wê dênin û wê bixwûn. Keçelok wusa çend rojan jîyankir. Lê di rojekê ku wî hingê geleki xwar nekari ku ew xwe bar bikê male xwe wê mêrê digurd wê ew wê bibê male wî û li ser cihê wî dirêj bikê. Di wê demê de mêrê digurd ew danî ser cihê wî û vegeyîya male. Keçelok jî bi wêqas xwarinê êdî nedikarî rabê ser xwe. Di wê demê de keçelok, ket xewk şêrîn de. Di wê demê de keçelok di wê xewa xwe ya şêrîn de wê, xewnekê bibînê û xewn wê bi keçelok re biaxifê û wê gelek tiştan wê şanî wê bide. Keçelok weke ku ew ji xwe ew heya wî ji wî neyî wê bijî di xewnê de. Di wê demê de ew wusa dijî û hingê dixwê wê geleke qelew bibê. Di wê demê de wê weke ‘mêrê qelew’ û ankû ‘mirovê qelew’ wê lê were.

Keçelok hingê di wê demê de wî xwe di xewnê de dît ku wî gelek kilo hildana û ew pirr zêde qelew bûya. Wê demê de xewna wî bi wî re axift û ji wî re got ku Axx keçeloko meyizênê kesekê ku ew ti karê nekê û tenê bixwê wê rewş û halê wî çawa bê. Ez pêşaroja te şanî te didim. Di wê demê de keçelok wê xewna ku weke xewna di nava xweşiyê di wê de dijî wê, bi carekê wê ji wê rabê û wê weke ku ew ji qabûsekê rabûyê wê xwûhdayî wê lê were. Keçelok wê hingê di wê demê de wê, ji xewnê rabê û wê li xwe binerê ku ew di çi halê de bê. Wê demê keçelok li rewşa xwe hizirî di wê demê de ew ber çi hatibû wir ew bibîrkir û di wê demê de ew ker rêya dîtina qasra şah de. Di wê demê de keçelok, bi pirsînê hat û heta ku ew hat devê deriyê qasra şah. Di wê demê de wî, xwest ku ew bi dizî bikeve qasrê de. Lê li bendê reşketina ardê ma.

Piştî wê keçelok hinkê ku ew ma û reşket ardê hingê ew ket qasrê.

De ne bavê zaroyê ji wî re gotibû ku ew nêzî pelerê bû wê ew xwe şanî wî bide. Wê li wî bide hîskirin. Di wê demê de keçelok ket qasr û nizanibî ku ew wê çê kûderê. Di wê demê ew bi şaşî ket odaya şah ku ew di wê de raziayî. Di wê demê de keçelok pirr tirsîya. Ji xwe re got ku şah min nûha bigirê wê bê pirs û sûal wê serê min bide lê xistin. Di wê demê de keçelok ji odaya şah derket û li devê deriyê odaya şah rastî keça

şah hat ku ew pîrr zêde xweşik bê. Wê demê ji keçike got ku ez li riya derketinê digerihiş û ez hevî û tika dikim ku tu min radestî şah û parastvanan nekê. Keçelok rûdên û rewşa keçelok pîrr li xoşa wê çû. Ber vê yekê wê demê gota keçelok were odaya min ezê te ji qasrê derxim. Lê planekê ezê çêbikim. Ku ezê te çawa derxim. Keçelok çendî ku ew ji wê plana wê ne xweş jî bê ji wê û pê de ti çareya wî jî nebû. Ber wê yekê bi neçarî wî ew herê kir.

Piştî wê keçelok li odaya wê ma û keça şah çû odaya bavê xwe û pelera hanî û avêt ser keçelok û ew ji berçavan da wînda kirin. Keçelok di wê demê de ji keça şah re negotibû ku ew bo wê pelerê hatîya ku wê ji wan bibê. Di wê demê de ku wî gotiba dibîyabû ku keçikê ew radestî şah jî kiriba. Ber vê yekê wî ew ne got. Di derbarê ti gotin ji devê wî derneket. Di wê demê de ew, li wê hizir ku ew çawa dikarê bi tişî ew pelerê bi xwe re bibê û ew bê ku ew ji bi çavan newê dîtin ew derkeve. Di wê demê de keçelok dixwest ku ew pelerê rajiyê û ji qasrê derkeve. Lê ew di wê demê de hingi tirsîya bû ne zanibê ku ew pelerê xwediyê hêza ji berçav windakirinê bû û ji xwe ew abayê xwe yê ku ew ji berçav wînda dikê ku ew bi wî re bû nehatibû bîra wî jî.

Di wê demê de keçika şah keçelok pîrr zêde acibandibû û ew xweştibû ku ew li cem wî bimênê. Nexwestibû ku ew ji wê herê. Di wê demê de piştî ku deng ji derve hatin ku şah wa li hilerê digerihe wê demê keçelok tîrsa wî zêdetir bû û di wê demê de wî ji xwe re got ku ez vê naqlê çûm. Wê qatî wê min bibînin û wê serê min wê were lê xistin. Di wê demê de ji tîrsê û pê de wê tişteke wê newê bîra keçelok û wê li wî serwernebê.

Piştî wê hinekê dem têve çû weke ku deng hinekê ji devê odaya ku ew di wê de bû wê dîrkeve. Keçelok di wê demê de wê, dema ku keça şah ji odayê çûbû wê ew avêtibû serî û çûbû bo ku ew ti kesek wî nebîne.

Piştî wê ne bi gelekî re wê keçelok ew kirina keça şah wê di serê wî de wê herê û wê were. Di wê demê de wî ji xwe re got ku ma ne keça şah ev pelerê avêt ser min ku tu kesek min nebîne. Di wê demê de wê ji wî re gotibû ku ev dema ku ew li ser mirov bê ew mirov ji nerîna çavan dide windakirin.

Keçelok ev di aqilê xwe de derbaskir û weke ku ew hinekê rehet bû. Piştî ku wî hinekê tîrs ji ser xwe avêt wê di wê demê de wê, keçelok tiştina din jî bi bîrkirin. Wê abayê xwe bibîrkir. Di wê demê de wî dikarî wê jî biavêjê ser xwe û ji berçavan xwe bide windakirin û ew herê. Weki din wî dikarî kumê aqiliyê bida serê xwe. Ew jî bi wî re bê. Lê ew yek jî ji wan ne hatibû aqilê wî ku ew bi karbênê.

Hinekê piştire wê keçelok wê bihizirê û wê pelerê wê li hev bipêçê û wê bikê berxwe û wê di wê demê de wê ji wir wê herê. Di wê demê de wî abayê xwe avêt ser xwe û di wê demê de wî xwe ji berçavan da windakirin. Di wê dema ku ew hê di odayê de bû û keça şah hatibû wir ew di bin abayê xwe de bû û di wê demê de keça şah dîtibû ku keçelok bi pelerê ji holê windabûya. Ber vê yekê wê di di cih de wê agahi dabûbû parastvanan ku ew ti kesekê ne berdina derve.

Ya di dilê keça şah de ne tenê bi armanca wê bê ku ew wî bide girtin bê. Wê ew acibandibû û xwestibû ku ew wî carek din bide girtin. Lê wê tevkir nekiribû ku baş wê û parastvan keçelok bi pelerê ku ew wî hildayî re were girtin wê di cih de wê bê sûal û pirs wê serî wî bidina lêxistin.

Piştî ku keça şah hinekê hizirî ev hatina berbîra wê di xwe de got ku min çî kir û weke ku ew bi destê xwe li kabokên xwe bixê lêhat. Lê keçelok di wê demê de wê didît û wê hizirkirinên ku wê di serê xwe dikir û ku wê bi dengê bilind dida der û dihanî ser ziman jî li wan jî dihisand. Lê keçelok di wê demê de rahiştî pelerê û di bin wê perdeyê de wî xwe li ber wê da û derbas bû. Dema ku wî xwe li ber wê da û derbas bû weke ku wê tiştê wê weke ba li wê bixê lê hat. Wê hîskir ku wa tiştê li ber wê da û derbas bû. Lê wê ti carî tevkir û hizir nekir ku ew dikarê keçelok bê. Di wê demê de keçelok hat ber devê deriyê derve ê qasrê sekin.

De ne, şah gotibû ku wê ti kesekê ne berdina derve û wê, di wê demê de wê derî mifte bikin. Ber vê yekê heta ku derî vebê û parastvan hinekan berdina derve wê xwe li ber derî ragirtiba. Piştî ku hinek hatin û derî ji wan re hat vekirin ku ew derkevin û ankû werina hundur wî jê wî bi dizî di bin abayê ji berçav windabûnê de wê li ber wan xistiba û wê derketiba.

Keçelok heta demek dereng a şevê ma. Di demekê de keça şah wê dîsa wê were bi dizî wê derî ve û li derve wê binerê bi hêvîyek ku ew keçelok li deverê bibînê û ankû çavên wê bi wî keve. Di wê demê de ku wê derî vekir wê dîsa wê xwe li ber wê bixê û wê derbasî derve bê. Wê rewşa weke xwe li ber wê xistinê wê ew wê weke ya hundur ku wê hîskiribû wê dîsa ew wê hîsbikê. Di wê demê de keçelok derket û di wê demê de wê, di cih de wê, bi gavên bi lez wê berê xwe wê bide daristanê cem zaroyê û bavê wê. Di wê demê de ew demek dirêj hat di rê de. Di wê demê de ew heta ku wê were cem wan wê gelekî wê bi wastihê. Keçelok di wê demê de wê, were cem wan û wê di wê demê de wê xwe ji bin abayê xwe wê bide derxistin. Lê ew berî ku ew were cem wan wê xwe ji bin aba wê derxê wî, nêht ne dikir ku ew bahsa kumê aqilîyê, abayê ji berçav

windakirinê û bibilê zêrîn bikê. Wê demê ku ew hat hemberê wan û pelerê radestî destê bavê zaroyê kir ew pîrr zêde dilxweş û kêfxweş bûn. Hingê wan keçelokê spasi û dilxweşîya xwe ji wî re hanî ser ziman.

Di wê demê de bavê zaroyê gelek pîrs ji keçelok ku ew çawa ket hundur û derket. Wê ew pîrr zêde zor bê. Wusa got û li bendî bersivê ku ew ji wî re werênê ser ziman. Keçelok bi zimanekê hesanî got ku ez bi dizîka ketima hundur û min hilda û ez hatim. Lê weke ku gotinên keçelok zêde ji bavê zaroyê re ê perîyê parastina daristanê re wê bi bawerî wê newin.

Keçelok wê di wê demê de wê hinekê bisekinê û wê di wê demê de wê, piştî wê, bixwezê ku ew di rêya xwe de dewam bikê. Bavê zaroyê fahmdikir ku ew çendî bi wast bû. Hingî wî ji wî re avek hanî û gota keçelok vê avê vexwe wê te rehet bikê ji wastina te. Keçelok pêşî fahm nekir lê wê dema ku wî ew av vexwart ti qaramên wî de nîşanaka wastê nema. Wî xwe pîrr rehet û zindî hîskir. Piştî wê keçelok gota bavê zaroyê ku ma ew çûbû. Wî ji wî re got «ev çavkaniya hemû avê ya. Ev dema ku te dilopez ji wê vexwert tê xwe rehet hîsbikê.

Piştî wê keçelok sevilkekê piçûk ji wê tişî kir û hilda ji bavê zaroyê. Piştî ku keçelok pelerê radestî wî kir û pê de wê dayika zaroyê jî wê piştî wê li wir wê rûbide û wê gelek lawa û minetariyên xwe wê ji keçelok re wê werênê ser ziman.

Keçelok di wê demê de wê, dema ku wî kar kir ku ew bikeve rê, hingê dayika zaroyê ji keçelok re axift û gotiyê «keçelokê delal û zaroyê ku dêûbavê weke ferîyan. Te qanciyeq ku em ti carî ji bîr nekin li me kir. Heta kûderê tu herê ezê çavê min li ser te vê û heta ku ez ji min were ezê bikim ku ez te ji belayan biparêzên. Bila ev jî soza min bê ji ter.» Piştî wê keçelok spasiya xwe ji wê kir û di wê demê de kar ku ew derkeve. Wê demê dayika zaroyê nanekê tanûrê hanî û dani tûrikê piçûk ku keçelok dabû pişta xwe. Wê demê keçelok got ku nanê min heya. Dayika zaroyê got ku ev nan ne ji wî nanê te ya. Ev na, ti carî ne kêmdibê û ne jî xira dibê û ne jî kevn dibê. Ev hertimî weke xwe dimênê. Ev nanê periyan a. Tev maf kiriya. Ez jî didima de. Wê demê keçelok ew nan hilda û bi xwe re bir. Di wê demê de ket rêya xwe û ku ew rêya xwe bide domandin. Di wê demê de keçelok, di wê demê êdî xatir ji wan xwestin ku ket rêya xwe.

Dema ku wê keçelok ji wan cihê bibê û herê wê piştî wê zaroyê ji bavê xwe re got ku 'yabû ev kiya. Weke mirovekê baş a. Lê ji mirovekê zêdetirî ew xosletên wî hena. Min ew di wî de kifşkir. Bavê zaroyê hingê bersiv da û got ku ew kesekê ku wê weke ti minaqe wî nebê. Wê ew jî wê

xwe bi demê re wê nasbikê.. Wê ew wê cihê wî li cem şahê perîyan wê bibê û wê di wê rengê de wê bi rûmet bê.

Wê demê zaro got ku wê ew kesekê mazin û zêde bi rûmet a. Hingê dayikê got ku ew rast a û wê demê hersêyan bi hev re li dûv keçelok lê nerîn heta ku ew ji berçav winda bû.

De ne, dihat gotin û bawerkirin ku wê dema ku mirovek bi perîyan re rûniştî bê û wan naskiribê û wê dema ku ew ji wan vaqatiya û wan li şûnê nerîn heta ku ew ji berçavan windabibê ew weke nîşanaka ji xêrê dihat dîtîn û dihat hanîn li ser ziman. Di wê demê de ew rewşa ku wusa mazin ji wê bahsa wê dihatkirin bi wê re bûbû. Di wê demê kesê ku ew jîyankir wê hemû karê wî bi rê ve çûba. Wê demê divîyabû ku karê keçelok jî bi rêve biçûya.

Keçelok di wê demê de wê demê pêwîst bû ku ew li gorî wê gotinê karên bi rê ve biçûya û ew gihiştiba serfireziyê di rêwîtiya xwe de. Piştî ku keçelok ji wan cihê bû wî di rêya xwe dewam kir û çû ew dema ku ew di rêya xwe de çû wî gelek tişt di serê xwe de hizir dikir. Gelek tişt wê weke ku wê bihetan hişê wî lê wî ne dikarê bîne ber bîra xwe di wê demê de wusa lê hatibû. Di wê demê de keçelok hinekê din çû û wî xwest ku ew fahmbikê ku ew çîna weke ku ew dihên berbîra wî û nayêna bîra wî. Wê werina berzane wî û nayêna li zane wî. Di wê demê de wê, di wê rengê de wê rewşekê wê bi xwe re wê di wê demê de wê bijî. Ew bi awayekê xweş di rêya xwe de hatibû heta dawîya daristanê û wê dema ku ew hat ber keviya daristanê ku ew ji wê derbas bibê ew hinekê ma sekinî û li şûna nerî. Di wê demê de wî zaro, bavê wê û dayika wê bibîrkir. Ew çî zaroyek xweşik, sipahî, rûdên sipî û geş bû. Hemû dê û bavê wê jî laşê wan weke berfê sipîbûn û te digot ku ew laşê wan hîç roj nedîtîya û lingê wan pêl ardê nekiriya. Wusa di reng û awa û renekê dihatin dîtîn. Keçelok piştî wê, ku ew hinekê li wan hizirî piştî wê wî, hêz û lez da lingên xwe û bidest çûyina xwe ya di rêya xwe de kir.

Keçelok di demek dirêj di rêya xwe de meşî û wî jî ne dizanî ku ew çiqasî di rê de meşîya. Hew dît ku ew çendî wastiya ji kal ketî û bûyî weke kalaxakî. Wusa wî xwe hîskir û di xwe de hîskir. Di wê demê de wî deverek ku weke gundekê li wê gelek mal hebûn wê bi ber çavê wî bikeve. Wî di wê demê de ew kira serê xwe ku ew ez herim li deve deriyekê bixim û ez herima hundûrê malê. Di wê demê de ku ew min îşev li xwe bikina mêhvan.

Di wê dema ku keçelok di rê de meşî ew hat nîvê navenda gund wî dît ku wa zarok wê li pey kesekê ku ew weke kor bê wê bikevin. Di wê

demê de ew kes jî wê şifek di destê wî de bê û zaroya ku ew digirê bi awayekê hiş wê bi serê wan de wê werênê xwerê. Di wê demê de keçelok li wan demekê wusa tamaşa dikê. Hinekê dem têve diçê ku ew keçikek piçûk ku ew li dora 8 saliya xwe bê wê bigirê. Di wê demê de wê, êdf ew jî wê di wê demê de wê, bigrê û karkir ku ew kor wê şifa li serê wê bixê. Keçelok di wê demê de xwe bi gavekê avêt pêş û ew girt û destê wî li hewa girt û ji wî re got ku ew zaroka, ma mirov wusa wê li zarokê bixê wê çêdibê.” Hingê keçelok ne hişt ew li zaroyê bikê û di wê demê de dît ku ew kor pirr zêde bi hêrs bû.

Di wê demê de keçelok bihîstibû ku zaroyan dibakiriyê ‘korê bakir” Di wê demê de ku keçelok nêzî zaroyekê bû û got çima hun dubakinê korê bakir. Hingê zaro ji keçelok re got ku ew navê wî ew a. ” Ew hingê badikê û ew kese bakir a, wê demê navê wî bûya bakir. Ne tu dizanê ku mana bakir wê bakirî bê yanî dema ku mirov wê bakê kesekê ji dûr ve bi dengê bilind wê hingê wê ji wê re wê bê gotin bakir. Yan jî kesekê ku ew bakir bi dengê bilind li kesekê û ankû li ser tiştê dengê bilind derxist û ew bi lêvkir wê weke ew bakirê wê tiştê ê bi deng wê were bi navkirin.

Hinekê keçelok gota zaroyê ez manaya gotina bakirê dizanim ku ew çiya. Ew di wateya kesê ku ew bi dengê bilind tiştê bîndê ser ziman û ankû bi dengê bilind li şûn mirov ve dengî mirov bikê wê ew ji wê re bê gotin bakir. Piştî wê keçelok ji zaroyê pirsî ku ber çî ew navê wî bakir a. Hingê zaroyê got ku ew hertimî badikê, ew bi dengê bilind badikê. Ew di wê rengê de wê êdf ew weke kesê bakir wê navê wî derkeve. Di wê demê de keçelok ew mesele weke ku wî ji gotina zaroyê fahmkiribû. Lê zaroyê gota keçelok ku Ew bakirê, bi dengê bilind a, ew hêj zaroyan nakê û ew di xwe de weke kesekê pirr bi hasab a. û dikarê enkê ji te bikê bo ku te ew sekinand ku ew li wê zaroyê bixê.

Keçelok hingê ji gotina zaroyê got ku ew kesekê kor a, mirov divê ku li koran baş nêz bibê. Ji wan heta ku ew pêwîst bê mirov ji wan re bibê çav û ling. Zaroyê got ku ew kor ne ji wan korên baş ku tu bahsa wan dikê. Wê demê keçelok hinekê li gotinên zaroyê hizirê. Demek di wê ser demê ve wê herê. Piştî wê keçelok hat nêvî navendê û xwest ku ew bi aliyekê din ve herê. Lê bakir ew ji dûr ve wî di şopênê. Li keviya hêtêkê lê dinerê. Wê dema ku keçelok wê di rê ve wê herê. Ew di wê demê de ew korçalekê li li pêşîya wî dixwezê bikolê ku keçelok bikeviyê û destû lingên wî bişikihin. Wê demê ew wê korçalê di kolê û di wê demê de ew hinek qirşik û çiqilkên daran didênê ser devê wê. Lê di wê demê de

keçelok wê farq dikê û di wê demê de keçelok fahmdikê ku ew kortaçelê li pêşîya wî dikolê. Keçelok di wê demê de ew ji deverek dur ve lê dinerê û lli bendê dimenê ku ew xilas bikê. Piştî ku ew xilas dikê û ji korçalê diçê wê keçelok wê were wê bin qirşikan wê taxteyekê wê dênê û wê di wê demê de ew ser re diçê û tişt ji wî nayê. Ji çî tafîqên xwûdê ku bakir dih wir û ku ew binerê ka keçelok ketiyê ew di wê demê de lingê wî di hiltapilê li kevirê piçûk bi arde ve û ew dikeve êw korçala ku wî ji keçelok re kolayî. Hingê keçelok wê dibînê û ew diçe ser devê korçalê di bêjiyê de ”ji kesi re korçalan ne veke dakû tu nekeve wan.” Piştî wê gotina xwe ya weke şiretekê ku keçelok kir û pê de wê derbas bibê û herê. Lê bakir pîrr zêde êdî inka xwe berdebû keçelok û wî dixwest ku ew qatî tişteke werênê serê wî. Ew li tiştina dihizirê ku ew bènê serê wî ku ew ti carê ew ji wê xilas nebê. Di wê demê de bakirê kor ew demekê dihizirê û wê, di wê demê de wê tişteke din wê bibînê. Ew jî wê ew bê ku ew planek din çêdikê. Ew di wê demê de ew piştî ku ew ya di serê xwe de zelal dikê ku wê çî bènê serê keçelok ew diçê êdî miriyekê ku ew nûka mirî wî ji tirba wî derdixê û dihênî di dênê de vera ku keçelok ji wê derbas dibê. Piştî ku keçelok dihê li dahmê disekinê wê bakirê kor wê bi dengê biling weke ku ew ji wî re bûya nav wê bakê herkesekê ku ew werin ku wê keçelok şanî bide û wê bibêjî ku wî ev mirov kûşt. Di wê demê de keçelok di mênê şaş û matmayî Wî ti tişt nekiriya û wî ti kesek ne kûştîya. Lê ew di wê demê de wê de wê dema ku ew bi bakir re çav bi çav dihê wê. Ji wî fahmbikê ku wî ew hanîya serê wî. Wê di wê demê de wê navê keçelok weke qatîlê ku mirov kuştî wê bixwezê ku ew derxê. Lê keçelok ma di bin wê de dimênê.

Kê çî û nekir nedan bi birhankir ku keçelok ew kuştîya. Piştî wê kesekê ku ew weke ahlê mirovê mirî ew derdikeve û wijdanê xwe xirana kê û dibêjê ku ew ahlê min a û demekê bûhûrî ew bi fermae xwûdê ew mîr. Ti kesekê ew ne kûştîya. Di wê demê de keçelok derdikeve li paqijiyê. Lê bakirê kûr wê pîrr zêde wê li wê bi hêrs wê were ku keçelok ji wê plan û xafka wî xilas dibê. Lê keçelok di wê demê de wê planek weke ya wî werênê serê wî. Di wê demê de wê herê qabristanak durî gund ku wê ti kesek wê nasnekê wî miriyekê wê werênê û wê, dênê nava bostanên bakirê kor û wê kerekê wê werênê cem wî û wê piştî wê xabatê bide dayîn li bakirê kor ku wê kesek wê kere xwe berdayî nava bostanên wî û ew jî wê ji bostanên wî ku wî li pêşîya xwe tiştî kiriya ew dixwê. Di wê demê de keçelok wê çend bostanan wê dênê pêşîyê jî weke qatkirî û hatîn xwarin.

Bakirê kor wê di wê demê de wê ji wê pirr zêde wê bi hêrs bibê û wê, di demê de wê darê xwe yê hişk ku wî hertimî bi xwe re di gerand wê rajiyê û wê di wê demê de wê, bi ber bax û bostanan ve wê bi bazê û wê herê. Di wê demê de ew dema ku ew digihijê nava bostanan ker di inêrê û ji wir bazdide lê mirov hîç weke ku ew israhata xwe xira nekê. Di wê demê de wê ew bakirê kor wê li wê bi hêrs bibê û wê di wê demê de darê destê xwe wê heta ku wê xwûdê wê hêzê hêzê bidiyê wê rakê û wê li serê mirovê mirî ê weke li ber siha darê hafî rûnandin wê bixê. Di wê demê de keçelok derdikeve li holê dibakê ku bakir darê li serê wî mirovî xist û ew kuşt. Gundî hemû lê digihina hev û destê bakir girêdidin û wê dibina cem parastvanê şah û wî didina avêtin li zindanê.

Lê keçelok hinekê xwedî wijdan û bi wê xwedî wijdanbûna xwe bi zane bû. Di wê demê de wê hinekê wê bakir wê di zindanê de wê bimênê û wê çendî zor bê wê, fahmbikê. Di wê demê de wê hemû kirinên wî yek bi yek wê di berçavên wî re wê derbas bibin û ew hêrs û nefreta wî ya li hemberî kes û zarokan wê were bîra wî û wê hin bi hin wê bikeve farqe wê û çendî ku ew dikeve farqe wê de wê, ew jî wê êdî wê weke li xwe haş bibê û wê hişê wî were serê wî. Di wê demê de wê keçelok jî wê li derve wê li gund wê çend rojên xwe wê bi wê minasebetê wê derbas bikê. Lê keçelok heta ku ew meseleya bakir bi encam nekê jî wî ne xwestibû ku ew ji wir herê. Di wê demê de wê ew jî wê êdî wê li ser mijarê wê rawastihê.

Bakir jî wê di wê demê de wê di zindanê de wê hin bi hin wê bi hizirê û wê di wê demê de wê li ser kirinên xwe wê bihizirê û wê hin bi hin wê weke ku wê fihêfî wê ji kirinên wî bikeve dilê wî de. Lê ew êdî jîyan bû wî xilas bûbû. Wê çawa wê xwe ji zindanê wê xilas bikira. Çi kiriba jî wî ne dikarî xwe xilas bikê. Herkesekê dîtîbû ku wî dar li sr mirov daya û wî kuştîya û herkesek wê wusa dizanê. Di wê demê de wê, wê bi xwe jî xwe ji wê re û encamên wê amedekiribû. Di mijare dawî de herî hindik şah dikarî bêjê ew kor a û serê wî nedê lêxistin. Lê wê kesin wê di zindan de wê bide ragirtin.

Di wê demê de wê, keçelok jî ku ew dema çûyina wî dihê wê rêyekê wê bibînê û wê xwe bigihênê qasrê û herê û derkeve hemberê şah. Di wê demê de wê, ew wê dema ku ew derdikeve hemberî şah wê şah wê ji wî bipirsê ku ew berçi hatiya û ji kû hatiya. Şah di wê demê de wê, li dora wî gelek wezirên wî yên bi zane jî wê li dora wî bê. Keçelok jî di destpêkê de aqili kiriya ku wî kumê aqiliyê daya serê xwe. Ew êdî li hemû tiştê waqif a û lê bizane ya. Ti tişt ji wî re weke ku ew ne veşarî ya

weke ne nezaniyê ya. Ew hertiştê bi wê dizanê. Di wê demê de şah meseleyê ji serê heya binî wê ji şah re wê bi awayekê aqilanê wê werênê ser ziman û wê di wê demê de wê ji şah re wê bibêjê ku wî xwestiya ku ew dersekê û fêrekê bide bakirê kor. Piştî ji wî re got ku "ez di wê baweriyê de ma ku wî ders û fêr nûha ji wê girtiya." Piştî wê ji şah dixwezê ku ew wî serbest berde bi şartê ku ew hertimî li hemberê kesên li dora û hemberî baş û qanc bê. Şah dibêjê wezîrê ku ew kesekê pîrr zêde bi zane ya û tiştê ku wî kiri tiştê ku mirov ji wê aqil bigirê ya bê û weke wî bikin. Di wê demê de ew jî wê weke wî bikin.

Piştî ku keçelok hê li wir a wê şah wê bixwezê ku ew bakirê kor werênina hemberê wî. Di wê demê de wê dema ku ew hanîna hemberê wî êdî wî dibînê ku wa keçelok jî li wir a. Lê wî tam ne didît. Dengê keçelok kir. Di wê demê de wî bixweza li xwe mikur hat û bahsa kirinna xwe yê nebaş kirin. Şah di wê demê de bi çavên raq lê nerî. Di wê demê de ku wî gotina xwe xilas kir gota şah ku hun çî cezayê bidina min min maf kiriya û ez herê dikim. Ber ku min gelek kirinên nebaş li hemberî zaro û mazinan kirina.

Di wê demê de wê êdî wê ji wê demê û pêde wê ew wê bibê weke mirovekê û di wê demê de ew li ser wê gotna xwe ya dawî weke soza li hemberî şah wê dide.

Piştî wî şah wî afû dikê û ji wî re jî rastî dihê hanîn li ser ziman ku ew bo ku ew dersekê û ankû fêrekê bidiyê de ew di wê temenê de hatiya kirin. Piştî wê ku ew dengê keçelok dikê ew lêborina xwe jî ji wî jî dixwezê. Keçelok jî wî afû dikê.

Piştî wê ku wê bakirê kor wê herê şah wê bi keçelok û mirovên li dora xwe ên weke wezîr û mazinên civakê wê bi tenê wê bimênê. Di wê demê de ew di wê demê de wê, li keçelok wê bihizirê û wê, di wê temenê de wê nexwezê ku ew keçelok bi awayekê ji dest berdê.

Di wê demê keçelok wê piştî wê ku wê bikê ku ew herê lê wê şah wê bide sekinandin. Di wê demê de şah hinek tiştan di serê xwe de di bûhûrênê û ew dixwezê ku ew bi keçelok bide kirin. Di wê demê de ku wê kesekê li hemberî wî hebê û ku wî heta wê demê nepeniya wî fahmnekirî wê weke bi navê Ali cengîz wê hebê û şah wê li wê bihizirê ku ew kesekê ku ewqas tişt bi aqilî hizirîna wê ew wê jî wê bikê. Di wê demê de keçelok wê di wê demê de wê, hin bi hin wê fahmbikê ku şah ew li tiştê bi wê rengê ew dihizirê.

Ber ku ew kumê aqiliyê wê li serê wî bê. Di wê demê de wê bixwezê ku ew, dema ku wê şah wî neberdê ew wê ji wê fahmbikê. Di wê demê

de wê, şah wê di wê demê de wê, ji keçelok re wê bênê ser ziman ku kesekê bi navê Ali ceng heya û ti kesekê heta vê demê nepeniyên wî fêr nebûya. Ew xwediyê çî fêhlan na ti kesek nizanibê. Ez ji te dixwezim ku tu wê bo min fêr bibê. Di wê demê de wê bênê ser ziman ku gelek kes çûna wir û ku ew fêrî fêhl û nepeniyên wî bibin ew wê fêrî wan bikê û wê piştire wê serê wan bide jêkirin. Ber ku wî nexwestiya ti kesekê nepeniyên wî zanibê.

Di wê demê de keça şah dihê cem wî û ew navê wê bi keçelok dikevin û ew pirr wî diacibênê. Keçelok wê dibînê ku ew çî keçek bedew û xweşik û xwediyê bejnûbalek sipahi ya. Lê di wê demê de li hemberî wê li xwe nayênê ku ew bênê na. Ber wê yekê ew dibêjê herê. Lê keçelok li gorî ku wê ji nava civakê wê were gotin wê zêde derfeta wî nebê ku ew bêjê na. Ku gotiba na wê şah jî wê serê wî lê daba. Ber wê yekê ew dibêjê herê.

Keçelok di wê demê de wê, çendî ku wê ji şah re wê bibêjê ku ew di rêwîtiyekê de û yên ku ew li bendî wê hena jî wê şah ji ya xwe newê xwerê. Ew êdî mecbûr dimênê ku ew wê bikê. Di wê demê de wê çawa wê nepeni û fêhlên Ali cengiz ku şah wî ji xwe re bi wan nepeniyên wî weke ku ew dikarê li ber wî xwe bi aqilê xwe bide nîşandin wê dibînê. Weke yê dikarê reqabet bikê wî dibînê. Di wê demê de keçelok wê êdî wê hinekê wê li ser wê bihizirê ku ew çawa wê xwe ji nava wê meselê wê xilasbikê ji demekê ji ya din zûtir.

Di wê demê de keçelok wê hemû aliyên Ali cengiz wê ji nava wezir û yên ku wî nas dikin wê, di wê demê de wê fêr bibê. Ali ceng jî wê weke kesekê ku ew nepeniyê xwe nadê ti kesekê û hemû kesên ku ew wan fêrî wan dikê jî serê wan lê dixê. Di wê demê de wê, ev wê di wê demê de wê li pêşiya keçelok bê. Ku ew wê nekê wê şah wê serê wî lê bixê û ku ew fêrbû jî wê Ali cengiz wê serê wî lê bixê. Ji herdû aliyên ve jî wê weke ku wê ji wî re wê xilasbûn wê nebê. Keçelok di wê demê de wê. Wê êdî wê herê cem Ali cengiz û wê weke weke nemzetekê ku ew hatiya ew hûnerên wî fêr bibê. Pêşî ew xwe nadê li ber û ew di wê demê de ji giranî ve dihilde. Lê piştî wê di wê demê de wê biryarê bide ku ew keçelok fêr bikê. Li gorî wê jî wê çil-rojî wê ew wê li cemê wê fêrbûba. Wê di hundûrê wê demê de wê hemû zanîn û fêhl û hûnerên Ali cengiz wê fêrbûba.

Di wê demê de keçelok li cem wî dimênê û ew jî wê fêr dikê. Lê di wê demê de wê keçeka Ali Cengiz jî wê hebê û ew jî wê navê wê "keçika kezî zer." Ber ku ew keziyên wê dirêj û zer bûn ji wê re wusa dihat gotin. Keçikek pirr zêde xweşik bû. Wê jî wê dema ku wê çavên wê bi keçelok

wê bikeve wê ew wê keçelok wê biacibênê. Di wê demê de wê, di wê demê de wê, hemû fêhl û hûnerên bavê xwe dizanî.

Di wê demê de keçelok hem fêr dibê û hem jî ew li rêyekê digerihe ku ew karibê xwe ji wê rewş xilas bikê. Çendî ku wê roj nêzî bibin wê êdî wê weke ku wê rojên mirina wî jî wê nêz bibin. Di wê demê de wê keçelok wê di serê xwe de wê, li rêyekê wê bigerihe. Di wê demê de wê, keçika kezî zêr de jî wê di wê demê de wê, ji keçelok re wê bibêjê ku ew di roja çilê de ku ew karibê bi bavê wê bide bawerkirin ku ew tiştê ji wî fêrnebûya wê hingê bavê wî li wî were rahmê û wê ew wê serî wî lînexê.

Keçelok wê çawa wê, ew wê bikê wê li wê bihizirê. Hinekê din dem di wê ve çû wî, rojekê dît ku ew zaroya perî weke ku wî li berçavên xwe dît. Di wê demê de zaroya perî ew dihê cemê û wî bi wî re wê biaxifê. Keçelok di wê demê de wê hemû derdê xwe û ya ku ew li wir hatî serê wî ew wê bibêjê.

Ew zarok bû lê ew zaroyek periyê bê. Ew xwediyê xoslet û aqilekê mazin bû. Wê demê wê zaroyê ji wî re got ku keçeloko divê ku tu bi wê bide bawerkirin ku te ti tişt fêr nebûya. Xwe şaşo maşo bikê. Pirsên ku ew ji te bikê niv bersiv bide û yan jî bersivê neda wan. Nehêle ku ew fahmbikê ku te hemû tiştê wî fêrbûya. Ev tišta ku zaroyê ji wî re got keçika kezi zerê jî ji wî re gotibû. Lê ma ka wê çawa wê ew kiriba.

Di wê demê de keçelok êdî di serê xwe de wê xwe bi wê hencetê ku wê weke canê wî ji mirinê wê xilas bikê wê di wê demê de.

Piştî wê keçelok hinekê din ew li wê hizirî û wê, di wê demê de wê çawa wê bi hênceta xwe wê bi temen bikê. Di wê demê de keçelok di wê demê de wê, dema ku wê roja çilê wê were wî ew roj weke roja serê lédana xwe didît. Wê demê wê Ali cengiz wê bakiyê û wê bi wî re wê biaxifê û wê ji wî bipirsê ku wî çi fêrbûya. Ali Cengiz wê di wê demê de wê gelek pirsan wê ji jê bikê lê keçelok wê di wê demê de wê, pirsên wî ne bersivênê û wê bibêjê wê newina bira min. Di wê kêlikê de wê tiştê wê were berbîra keçelok ku ew bikarbênê.

Wê demê keçelok wê dema ku wê, Ali cengiz wê, lê bihizirê û wê bixwezê ku ew fahmbikê û wê, di wê demê de wê di wê dema ku wê biryara xwe bide ku wî hemû tiştên wî fêrkirina. Wê keçelok wê li wî biaxifê û wê bibêjê bibûhûra hostayê mazin. Bi rastî jî min ti tişt ji te fênekiriya. Ti tiştê ku te ji min re got û hanî ser ziman û ankû da nîşandin wê di aqilê min de wê cih negirê. Wê dema ku wê ali cengiz wê bibêjê çima ew jî wê, bibêjê ”ber ku ji dema ku min keça şah dîtî ve wê

ne hiş û ne aqil di serê min de hiştîya, hemû ji min çûya. Ez bêaqil û bê hiş mama. Ber vê yekê min ne dikarî ez ti tiştî ji te bigirim..

Di wê demê de wê, Ali cengiz wê bi wê qanih bibê ku keçelok ji wî û hûnerên wî ti tişt negirtîya. Di wê demê de ti tişt di serê xwe de ne girtîya. Ê ew nizanê. Piştî wî bêî ku ew serê wî lêbide wê ew wî berdê. Di wê demê de keçelok wê dihê û tê cem şah û di wê demê de wê, şah ji wî bipirsê ku wî, nepeniyên Ali cengiz fêrbûya û ew dikarê ji wî re bibêjê. Di wê demê de wê, demê şah dixwezê ku ew keçelok di wê demê biceribênê ku ew rast a û ne rast a. Hinek tiştên wî bi rêya wezîrên xwe û dordorê fêrbûya wê bi wan ji wî bikê û ew wê bersivê wan bide. Piştî wê, di wê demê de keçelok wê êdî wê di wê demê de wê weke ku wê, kêfa dilê wî were ku ew êdî weke ku ew xilas bû. Di wê demê de wî hizir dikir ku ew piştî ku ew ji wir derket û pê de wê di rêya xwe de wê ya bidomênê. Lê şah ew ne berda. Di wê demê de şah hinekê şertûmerên din ku ew ji keçelok dixwezê ew wan werênê li cih wê hebin. Ew dixwezê ali cengiz bi hûnerên wî bide têkbirin. Di wê demê de wê, şah wê demê wê ji keçelok wê bipirsê ku tu hûnerên ali cengiz zanibê tê yê bi hûnerên wî bikeve hemberî de bi pêşbaziye. Kesek bi hûnerên xwe re nikarê reqabetê bikê. Ya ku wê karibê wan têk bibê wê dîsa wê ya ji wan bê û wê ji keçelok wê bixwezê ku ew bi Ali cengiz re were hemberî hevdu û bi wî re pêşbaziye bikê û wî têk bibê.

Di wê demê de keçelok wê fahmdikê ku wê ji wê xilasiya wê nebê. Di wê demê de ew, berê xwe dide şah û şartekê xwe dibêjê. Dibêjê tamam ezê derbevima hemberî wî. Di wê demê de lê hunê ji min re postê kavîrekê ji min re werênin. Wê demê şah wê fermanê wê bide ku wê post û ankû ayarê kavîrekê ji wî re wê werênin. Di wê dema ku wê Ali cengiz dihê ku wê herê hemberî keçelok wê xwe bikê hundurê postê kevîrê û wê derkeve hemberî wî hingê wê, demê şah di wê demê de wê, dema ku wê Ali cengiz wê were şah wê ji wî bi pîrsê ku ew dikarê wî kavîrî ji wî re bigûrênê. Ali Cengiz dibêjê herê û wê dema ku ew kêrê wê bikê ku ew bide sûkrê wê keçelok wê di wê demê de wê, bibê kevokek wê ji nava ayêr wê bifirê. Di wê demê de wê, dema ku ew dibê kevok di firê û diçê wê ali cengiz jî wê di wê demê de wê bibê eyloyek wê bide li dûv. Di wê demê de wê rêyek demdirêj wê qat bikin. Keçelok di wê demê de wê were û wê bigihê kerwanekê ku wê, di wê demê de wê, di rê ve diçû. Wê li ser malê malê wan wê dênê û wê di wê demê de wê dîsa wê bibê weke xwe. Lê ali cengiz ew nikare li wir dênê û ew di wê demê de ew mecbûr dimênê ku ew ji wir dûrkeve û vegeirihê.

Keçelok hingê wê ji wê xilas bibê. Di wê demê de wê keçelok wê di wê demê de wê, weke aliyekê wê yê din jî wê, wê êdî wê bi kerwanê re wê were heta devera ku wê kerwanê xwe wê dênê. Rêya kerwanê wê bi aliyê ku ew diçû ve bû û keçelok di wê demê de ji wa xwest ku ew weke wan bi wan re bimeşê. Lê kesên di nava kerwanê de li dijî wê derketin û di wê demê de wê, di wê demê de wê li dijî wê derkevim. Xwediyê kerwan wê di wê demê de wê ji keçelok re bibêjê ku ew dixwezê bi wan re bimeşê û ew di wê de israr dikê. Dema ku keçelok wê di bînê ku ew ew nexwezin ku ew wî hildin li nava xwe ew di wê demê de wê, di renekê de wê, weke ku wê, israra xwe didomênê. Wê demê keçelok hinekê dihizirê ji ji xwediyê kerwan dixwezê ku ew wî hilde li kar û ew dikarê weke wî bi karwanê wî re bimeşê.

Wê demê xwediyê kerwan li keçelok dinerê û ew digihijê wê ginyatê ku ew dibê ku ew nikaribê ew wê karê bikê. Di wê demê de wê demê keçelok xwe dide bawerkirin û di wê çerçoveyê de wê, bixwezê ku ew bi wî bibawer bikê. Keçelok nexwezê ku ew li wê çole bêkes bi tenê bimênê ku ew tiştên xirab werina serê wî. Wekî din jî ew li wê dihizirê ku ew ali cengiz dibê ku wî xwe kirinê rewşna din de û ew wî dişopênê û ew di wê demê de wê nikaribê xwe ji destê wî xilas bikê.

Keçelok êdî ew rewş bo wî bûbû weke mayin û nemanê. Wî di wê rengê û awayê de wî didit û wî di wê rengê de wî dixwest ku ew bo ku ew xilas bibê ew ji wan qût nebê. Di xwe de wê ew wusa hîs dikir. Ya ku di temenê wê israra wî de bû jî ev bê.

Keçelok di dawîya dawî de wê bi xwediyê kerwanê wê bide herêkirin ku ew wî hilde kar û ew li cem wî bimênê. Wê tenê wê nanê wî bidinê û wê hinek wereqe wê bidinê. Di wê demê de wî jî wê bi wan re wê weke wan wê di nava kerwanê de wê bikê û wê di hemû karê wan de wê alikariyê wê bide wan.

Ew wusa di wê demê de wê pirr zêde wê dilxweş û kêfxweş wê bibê. Ew dilxweş û kêfxweş dibê de lê hinek kesên ku ew ji nava kerwanê ku ew ji wê hildana wî ne kêfxweş û dilxweş in hena û di wê demê de wê bi çavêna bi qazab wê lê binerin. Keçelok di wê demê de ew serê xwe ji wê naêşênê û ew nexwezê ku ew bi kesekê re were hemberî hev. Di wê demê de keçelok, di nava kerwanê de wê hinek erk û berpîrsîyarîyan jî wê hilde. Hinek malên ku ew ji wan berpîrsîyar jî bê wê hebê û wê di wê demê de wê bibê.

Keçelok di wê demê de wê, êdî ew weke ku ew gihiştibê ya xwe. Ew weke ku ew bi awayekê ew gihiştibê wê ya ku wî dixwest. Di wê demê

de keçelok û kerwan wê êdfî wê bi hev re wê rêya xwe wê bidomênin. Di wê demê de kerwan wê dema ku wê dem wê bi derengî wê bikeve ew nexwezî ku ew di şevê de ew rê bidomênin bo ku ew rêya xwe şaş nekin. Nûqtetek ku ew weke nûqteya cihê kerwan li wê disekin in wê werina wir û wê li wir wê, bisekin in û wê bimênina heta sibehê. Li wir wê bîrek avê jî wê hebê ku wan ji wê bi dêwlan av dikişand û wan di vexwart. Lê di wê demê de wê keçelok wê dema ku wê, were serê avê ku ew avê bikişênê wê kerwanênvanên din wê werisê dêwla ku ew bi wê avê bikişênê wê bi zanebûnî wê kin qût bikin û wê, di wê demê de ku ew negihîjê li avê.

Wê demê keçelok çî dikê û nakê wê di wê demê de wê, nikaribê avê hilde. Ew kesên ku ew ji wî nexweş bûn wê werina cem wî û weke ku ew dixwezî alikariyê lê bikin û ew bi nîyetek baş in wê, nêz bibin û wê jî keçelok re wê wê bibêjin ku em dikarin alî te bikin. Keçelok wê dema ku ew dibêjê çawa wê demê wê kesek ji wan wê bibêjê ku «werisê dêwla te kina û na gihîjê ava binê bîrê. Bîr jî pîrr zêde kûra û werisekê zêde dirêj nebê tîyê nikaribê avê ji wê derxê û xwe bigihênê avê.»

Wê demê keçelok ji wî dipirsê ku ew çî bikê. Pêşî keçelok dibêjê ka hun werisê dêwla xwe bidina min û ankû dêwla bidina min ez bi wê avê hildim. Wê demê wê yê kerwan wê bibêjê, tu jî weke me ku em çawa ghiştina avê tê yê jî wusa xwe bigihênê avê. Ew jî dibêjê ku ma hun çawa ghiştina avê. Hingê kerwanvan dibêjê ku me yek werisek li noqa wî girêda. Werisê dêwlê ew kira destê û ew berda binê avê. Di wê demê de ew wê demê ew avê ku ew kişand em jî wê dikişênin. Hingê keçelok got ma çima em bi hev re werisan girênadin? Kerwan got ku wê weris ji hev di vebin û dêwl dikeve binê bîrê û em bê weris bimênin. Ne tu dizanê bo kerwanvanekê dêwl dihê çî manayê û çendî û çiqasî giring a.

Hingê keçelok wê ya ku wê kerwanvan wê bibêjê wê herê bikê û ew wê werisekê wê li noqa wî girêbidin û wê piştî jî wê, di wê demê de wê, ew wî berdina binê bîra ku ew gelekî kûr a.

De ne, wan ji keçelok re negotibû ku wê dêwek di wê bîrê de wê bijî û wê di wê demê de wê, dema ku kesekê xwe berda bîrê wê di cih de wê bigirê û wan bikişênê cem xwe û wê wan dil bigirê. Piştî wê ew wê serê wan jê biikê.

Keçelok ev ne dizanî û kerwanvanên din jî ew dizanîn. Lê ew bi zanebûnî ku ew bo ku ew ji wî xilas bibin ew dixwestin ku ew wê werênina serê wî û ew ji wê xilas bibin.

Keçelok wê dema ku ew berdana binê bîrê ku ew hema bêja gihişt dema ku ew dêwla wî gihişt avê wê demê dêw ew ji noqê ve zant kir û ew bi ber xwe ve kişand. Di wê demê de keçelok hema xwe li deverekê weke bax û baxçeyek pîrr zêde xweşik dît. Û ji wê ma acêb mayî. Di wê demê de wî bira hundûrekê û destên wî ji şûn ve girêdan. Keçelok ne dikarî tiştêkê bikê. Lê di wê demê de ya ku wê keçelok di bin heybeta wê de wê bimênê wê bax û baxçeyê pîrrzêde xweşik bê.

Wî nekarî çavên xwe ji wê bigirê. Hingê xweşik û baş û bi sazûmanekê hatibû adilandin.

Keçelok di wê demê de wê, keçikek ku ew hingê xweşik bû wê şawqa wê bide dora wê bibînê. Çavên wî ji wê pîrr zêde acêbmayî man. Di wê demê de keçelok pîrr zêde di bin bandûra wê xweşikatiyê bejnûbale wê keçikê de ma. Hema wusa awirên xwe dana ser wê û ew tamaşa kir. Di wê demê de dilê wî ne dixweşt ku ew tiştêkê bin bihizirê û ne jî werênê bira xwe. Di wê demê de wusa ma. Weke ku ew bikeve xewnê lêhat.

Keçelok di wê demê de ew di wê demê de wê kesekê din jî ku ew weke sûxrewanek bû wê bibînê. Ew jî berevajî wê wilqasî kirh û çapal bû hema bêja nexwest ku ew li lê jî binerê. Lê di wê demê de wî avirên xwe birina ser ya xweşikatiya bejnûbale wê keçikê û lê nerî. Hema wilo bi hazn lê nerî. Keçik jî wê di wê demê de wê, hema wilo di nava wê gulistanê de diçû û dihat. Demekê wilo bêdeng lê meyizend. Lê ti nebê dêw jî wê dema ku keçelok li wê dinerê ew jî li wî dinerî û ew heta ku wî li wê nerî wî jî li wî nerî. Wusa hinekê dem bûhûrandin. Piştî wê keçelok bi dengê bi heybet û bilind weke ku ew hat xwe û di wê demê de wî piştî xwe nerî ku wa dêwa ku ew wê dengê derxistiya. Keçelok di wê demê de wî dêw dît û dêw het û li hemberî wî sekinî. Di wê demê de keçelok pîrr zêde ji wî bi tirs bû û tirs mirinê ket dilê wî de. Hingê wî di xwe de got ku ez bûna eylo a ali cengiz min got ku ez çî bêbaxt û hajar im. Wusa wî ji xwe re ew got û dilê xwe bi xwe şawitand. Weke ku ew dilşawitandina wî ya bi xwe ku keçelok kir ew hîskir. Lê dêw bi wê re weke ku ew alaquadar nebû. Di wê demê de wê bi dengêkê têr, bilind û hişk gota keçelok ku ma tû çî dibînê. Keçelok ji wî re bahs kir û ku ew çî dibînê. Lê bi tirs bahskir. Her ku keçelok bahs kir hertimê wê dêw wê tenê wê pirsekê wê bikê û ew pirs jî wê ew bê ku wî ji xwe fikir ku ma tu çî dibînê. Wê pirsê belki keçelok ji dewê dê zêdetirî deh car û ankû bist caran wî bihîst. Di dawîya dawî de dêw hinekê ma sekinî û pirsek din kir. Got ku çî li vir tu xweşik dibînê. Keçelok di wê demê de dikarî bêjê ku ez

wê keçika pirr zêde xweşik dibînim. Lê di wê demê de hîsek bi wî re çêbû û ew ji wê gotinê da dûrkin. Keçelok piştî wê li tiştê din hizirî ku ew bersivê bide dêw. Di wê demê de keçelok got ku ”ya ku dilê mirov xweşik dibîne ew xweşik a.” Sê caran dêw heman pirs kir û keçelok heman bersiv da wî. Piştî wê dêw weke ku ew ji bersiva keçelok xweş mabû. Di wê demê de dêw li keçelok bi dest axiftinê kir û bahsa sê tiştên ji dil ku ew dikarê wê hêjê bikê û hêjî nekê wê bikê. Yek wê ew keçika xweşik bê. Di wê demê de wê di nava wê gulistana pirr zêde xweşik de jî wê **tayrê tawus** wê hebê û pirr xweşik û li mirov xoş dihat. Ew dagera nirxa tawûsî melek a. Wekî din ew sûxravanê ne xweşik hebû. Dêw bahsa qanci, başî û hebûna tayrê tawus kir û ew bi nirxek pîroz wê hanî ser ziman. Di wê demê de wê bi heman rengê wê bahsa xweşikatiya keçikê wê bikê. Di wê demê de dêw xweşikati şiband weke tiştê ku ew li mirov bibê kir. Dema ku dêw got ku ew xweşikati dikarî ne li wê keçikê li wî sûxravanê kirh jî bûba. Wê hingê ew xweşik bûba. Lê nebûya.

Keçelok di wê demê de ew hinekê weke ku wî tirsaxwe ji ser xwe avêt. Êdî wî weke ku wî fahmkiribû ku wê dêwê bîrê wê ti tiştê wê bi wî nekê. Demekê wusa lê hizirî. Lê keçelok di wê demê de hinek di nava hizirî û fikaran de ma. Di wê demê de wê, dêwê bîrê lê nerî û ji wî pirsî ku tu çima bi hizirî. Di wê demê de wî bahsa bîrê û daketina wê ya bo avê û girêdana wî ya bi wesir ku ew nekeve nava avê û hwd wê ji wî re bahskir. Dêw di wê de ew hinekê hizirî di wê demê de ew ma sekinî. Piştî wê di wê demê de wî ji keçelok got ku ew mirovên ku wan tu berdayî binê bîrê wan ne ji bo ku ew qanciyeke bi te bikin. Wan xwestibû ku ew xirabiyekê bi te bikin. Heya wan ji wê heyax. Di wê demê de keçelok wê weke ku ew ti tiştê nizanê wê pirsan bikê û wê bibêjê çawa. Wî hingê got ku kerwanê tu di nav de yê ew kerwanek ku ew her dem di vir ve diçê û derbas dibê. Lê di wê demê de ew her dema ku ew hatina vir wê, kesên ku ew dixwezî ku ew ji jê xilasbikin wê berdina binê bîrê. Di wê demê de wê, keçelok wê demê wê, bahsa rêwîtiya xwe ya heta wir û çawa ew hatiya ketiya nava wê kerwanê de jî wê bahsa bikê. Wê bahsa rêwîtiya xwe wê bikê. Dêw di wê demê de ji wî re dibêjê ku tu kesekê dilpaqij jî lê ji xwe heyidar bê.

Piştî wê, dêw di wê demê de wê weke aliyekê wê yê din jî wê di wê demê de wê, bahsa kesên ku ew hatina daxistin li binê bîrê û ku ew derneketina jî wê bikê. Dêw got ku kesê ku ew hat daxistin ew mecbûr bû ku ew biazîliya xwe ji vir derxistiba. Di wê demê de keçelok got ku ew

aqilî çawa ya.. Hingê dêw got ku ez aqilî ew a ku dema ku tu hatî binê bîrê û ti ketî baxçeyê dêwê bîrê de bi aqilê xwe tê bersiva pirsên dêwê bîrê bi rastî bide û tê xwe xilas bikê. Wê dema ku wê bahsa dêw kir jî wî hingê bahsa xwe kir. Hingê xwe qast kir. Di wê demê de wî, êdî di wê dêw bahsa kesên din ên kerwanê ên nebaş ji wan re kir. Piştî wê, got ku wan hemû kesên ku ew xwestina ku ew ji wan xilas bibin berdana binê bîrê. Lê keçelok tişteke fahm nekiribû. Ew jî ew bû ku ew çawa ew bû ku mirov wê bi aqiliya xwe wê derketiba. Wê demê de wê, dêw bahsa pirsên xwe yên li wir kir û ew di wê demê de wê demê ji wî re got ku te bi aqilê xwe xwe ji wê, xilas kir. Gelek kesên ku ew hatibûna binê bîrê gotibûn ku yan yan keçik xweşik. Yan bahsa tawis kiribûn. Lê di wê demê de te bahsa ya dil û li wê ku wê xweşik were kir û ew bersiva wê bû.

Keçelok bi wê gotinê êdî wê fahmkiribû ku wê dêw zîrarê nede jîyane wî. Di wê demê de ew ji wê aliyê ve weke ku ew hinekê rehet bûbû. Di wê demê de ew di wê çerçoveyê de wê, weke ku ew wî êdî bawer dikir ku ew wê zîrarê nediyê. Lê wî li wê dihizirî ku ew wê çawa wê, ji wir derkeve. Keçelok ew hingê li wê dihizirî. Dêw ew ji wî û hizirkirina wî fahmkiribû. Di wê demê de dêw ji wî re got ku ew lawikê keçel mereqa nexwe. Tê yê ji vir derkeve. Di wê demê de ku dêw wusa got keelok pirsî ku çawa. Hingê dêw ji wî re got ku tu hinekê bi ber min ve were. Keçelok weke wî kir û ew bi cem ve çû. Lê hinekê weke ku ew bi tirs bû. Lê ji wî re dêw got ku bila êdî tirs nekeve dilê de. Di wê demê de wê dêw du hinaran wê ji ber xwe wê derxê û wê bide keçelok. Dêw gota keçelok te ev mafkirina û ew dana wî.

Keçelok mereq kir ku ew hinar in. Dilê wî jî di wê demê de çû hinarê û pîrr xwest ku ew yekê li wir bişikênê û wê bibixwê. Lê di wê demê de dêw gotiyê de wê, li vir nexwe. Ku tu çûyi malê bi dayika xwe re wê rûna û wê bixwe.

Di wê demê de gelek got bila û ew hinekê ma sekinî. Di wê demê de keçelok çavên xwe ji wê xweşikatiya wê keçikê ne dikir. Di wê demê de wî mereq dikir ku ew keçik çiqasî xweşik û sipahî ya. Weke farişteyekê bû, hingê xweşik û delal bû.

Di wê demê de dêw ew alaqa ya wî ya bi çavên wî a li keçikê ji wê nedibûn. Wê demê de dêw keçelok li hemberî xwe da nîşandin û bahsa keçikê û wê xweşikatiya û ew çawa bi wê re hevdi tin kirina wê bikê.

....o0o

Keçeloko nûha li min bihisênê ezê ji serî û heta binê mesele xwe û wê ji der bibêjim. Em jî weke ku wê di nava mirovan xwe xwedî sazûmanek civakî bûn û şahî ma hebû. Ez jî di wê demê de ez ji ber dayika xwe rewîbûn û hatibûn di gova qasra bavê de wê min li haspa dinerî.

Dayika min jineka pîrr zêde hişk û bi hidde bû. Rojekê wê tiştê ji min xwest û min ew ji bîr kir ku ez wê bikim wê, caza da ku ezê herim hamali û binpaqîjiya govên sawalan bikim. Ez ji min re wê rast dît.

De ne dayika min jineka zêde hişk û serhişk û pîrr zêde bi afsûn bû. Ji wê re dihat pîrhaboka ser rûyê dûnyê a herî mazin. Du xwûkên wê hebûn yek ji wê maztir û yek ji wê piçûktir bû. Navê ya mazin **bidilşêrîn** bû. Û nava ya piçûk jî **bidilxweş** bû. Di wê demê de navê dayika min 'Navdilxweş' bû. Ber ku ew ya navê bû bi wê rengê navê wê li wê hatibû lê kirin.

Lê ew weke ya bi afsûn a herî zêde xort derket li pêş û qasr û mal û hemû tiştên ku ew weke qasr û hwd ketina destê wê de. Ew bû weke serekê malê. Hemû tişt ji wê dihat pirsin.

Wusa mazin bû ku êdî wê ti kesek li ser wê re nebû û wê ti kesekê wê ser xwe re jî ne dît. Her kesekê li dora wê li gotina wê neri. Wê çî gota wê weke wê bê.

Ez li ber destê wê mazin bûm û hemû afsûnên ku wê dizanîn jî ji min re gotin û ez bûna xwediyê zanîna wan.

Lê wê dema ku wê ceza da min min nikarî afsûna xwe bikarbênim. Ez li ber destê mirovan kirima berderkvanê goveka sawalan.

Ez bi wê rengê heft salan di wê demê de mam. Şahê mirovan ê ku ez li ber destê wî û di gova qasra wî de bûm jî kesekê di nava mirovan de bi bqaşî dihat nasîn. Ew jî sê keçên wî hebûn. Yek bi navê Bidilnarîn, ya navê "bidilzêrîn" bû ya piçûk jî wê navê "bidilşabûn" bû. Hersê jî wê ji hev xweşik bin. Hingê wê wusa xweşik bin, şah ne dixwest ku ew keçikên xwe bidê mêr. Lê rojekê ket aqilê wî de ku ew keçên xwe bidê mêr. Ji wan re got ku ma hun kê bixwezî ji min re bibêjin. Ya mazin got ku ez hêj kurê wezîrê te ya mazin dikim û ew bi kûrê re bi dewetek ku ew çil roj û şevê wê li dar bê wê bizewicê.

Piştî wê, di wê dema ku ez di wê demê de dixabitim û min li gova şah dinerî keça wî ya herî piçûk ez dîtîm û dixwest ku ew her roj were cem min. De ne ez weke her mrovê di 'leyistika tawla' de pîrr zêde baş bûm. Ew jî dihat cem min û bi min re dirûnişt û heta demên dereng em bi tawla di leyistin. Wusa rewşa me dewam kir. Ew piştî wê demekê wê, êdî wê

bialimê min û wê carna wê ali min jî bikê, wê dema ku min paqjiya min sawalan dikir. Wê demê min paqjiya bin sawalan dikir û zibilê ku min berhev dikir min ew dikira tapik û pêvadan bo şawata zivistanan. Ew jî li ser milê min weke bar bû. Carna wê bixwe jî wê ali min dikir.

Di wê demê de wê, êdî wê keçelok wê pîrr zêde wê bialimê min. Wê êdî wî hin bi hin wê dilê xwe ji min re vekir û min jî yê xwe ji wê re vekir û em li hev germ bûn û bi dil bûn. Di wê demê de wê, rojekê wê dema ku wê bavê wê ji wê dipirsê ku ew kê diacibênê, ew jî dibêjê bavê xwe ezê ji ter bibêjim lê tuyê aciz nebê û redd nekê. Bavê wê jî dibêjê bila û piştî wê ew di wê demê de ew bahsa min dikê û dibêjê ku ew wî dikim. Heya min jî ji wê nebû. Lê dema ku şah rojekê hat cem min û wusa li min nerî êdî min fahmkir ku wa tiştina ku bûna hena. Lê min ne dizanî ku ew çûya. Lê şah di wê demê de çendî ku wî gotibû keça xwe ez xwesteka red nakim jî lê wê demê wê ji wî re gotibû ku tê çawa bi sûxrvanekê re bi zewicê. Ew ne layiqî min û navê min a.

Lê keçika wî ya bi navê bidilşabûn ew di wê de israrkir. Piştî wê, di wê demê de wê ew ji min re jî got. Pîrr li xoşa min jî jî çû. Lê di wê demê de wê, ji min re got ku bavê min ber ku tu sûxrvanekê ew nexwezê ku ez bigihima te. Di wê demê de min, ji ti kesekê re negotibû ku ez ji malek mazin dihêmin û qasra dê û bavê min heya. Ew jî wê weke yek ji cezayê min bû.

Piştî wê rojekê wê demê wê bidilşabûnê êdî ji min ne veqatîya. Wê êdî wê hertimî wê demên xwe bi min re derbas dikirin. Ez jî heta ku heft salên min weke cezayê min ku dayika min dabûbû dîyarkirin heta ku ew bi dawî nebûba jî minê nikaribî xwe bidame dîyarkirin û minê nikarîba vegerima malê. Piştî ku cezayê min kengî xilasbû. Hingê minê ew kiriba.

Lê di wê demê de wê, rojên ên êdî mabûn. Rojekê ku wê êdî wê cezayê min xilas bibê wê demê ez sibehê ne rabûma kar û min xwe di nava cihên xwe yê razanê de girt. Bidilşabûnê hat wir û wê dema ku ez ne dîtîm bidiilnexweş bû. Di wê demê de êdî wê, demê ku min ew dît ku ew pîrr dilnexweşbû min jî dilê min ranegirt ku ez zêde bimênim û ez derketim û min xwe şanî wê da. Wê ji min pirsî û got ku tu çûma mayî û bavê min ew pê bihihisin wê zirarê bidina te. Wê serê te lê bixin. Di wê demê de ew, êdî ji min re weke ku ew ne derd bû.

Piştî wê min ji wê re rastî got ku ez kima û dayika min pîrabokek mazin a. Wê demê min gotiyê ezê çima malê û ku tu were bi min re em bi hev re herin.

Wê jî ew bi dil û can wê herê kir. Di wê demê de ew jî bi wê kêfxweşîyê wê hemû tiştê xwe û qasr li şûn xwe hişt û bi min re hat. Min jî ew girt û bi xwe re bir. Piştî rêwîtiyek zêde dirêj em ghiştina me. Lê ez di rê de pirr li wê dihizirm ku dayika adet û xûyên wê ne baş û ne xweş bûn û ezê çawa bahsa bidilşabûnê ji wê re bikim. Bidilşabûn jî bejnûbale wê û xweşika wê li deverek tarî re biçûya wê ewder wê rohni bikira. Hingê wusa xweşik bû.

Ez jî di wê demê de pirr ji dayika xwe di tirsiyam. Min nizanî ku ezê wê çawa wê, pênase bikim ji dayika xwe re. Min dizani wê weke ku wê her carê kiriya wê, adotiya xwe wê, bide nîşandin.

Lê min ew kiribû serê xwe de. Û bidilşabûnê di dilê min de cihgirtibû. Wê demê em bi hevdû re ku em herina malê bo ku ez wê, û dayika xwe li dijî hev nebînim min, got ku "yadê meyizenê ji ter re alikarvanek haniya. Wê di hemû kar û barê te de wê li cem te bê. Wekî din tişteke ji min re lazim û pêwîst bê ezê ji wê bixwezim.

Wê demê dayika min dema ku wê keçikê dît hema wusa rûyê xwe qirmîçand, çavê wê lê zivirand û devê xwe xwehrikir. Min êdî fahmkir ku wê enka wê bibê. Wê demê gotina ku ji devê dayika min derket tenê ew bû ku "te ev keç ji kû haniya wê di cih de bibê wê devê û çavên nexwezê ku wê bibîne." Lê ez di wê demê de mama sekinî û min ne dizanî ku ezê çi bikim. Dayika min hinekê din têve çû û piştî wê, keçik li wir ma. Min gota bidilşabûnê ku ew tiştina bikê bikê ku ew bikeve çavê dayika min de. Wê di cih de wê weke min kir û ez ne şikandim.

Piştî wê, dayika min weke ku hinekê dilê wê nerm bibê lê hat û gotina min 'dê bila keçik bimênê. Lê ez bêjim min ne ecibandiya'. Ev gotina wê ya ku wê got min ne acibaniya, xamgînî bêgûman di dilê min de çêkir. Lê ez li wê ne aliqim. Min di wê demê de wê, ya ku ez li ser wê di sekinim ew bû ku wê herêkirina wê ya ku ew mabûna wê bê. Ku dayika min ew herê nekiriba bi wê rengê dikarê gelek tiştên xirab bihanîya serê wê. Lê wê dema ku wê tişteke wê herê kir wê êdî wê tişteke ne dikarê li wê bikê.

Ne carna dibîjin ku jinek bi asil bê wê demê wê zanibê ku wê çi bê. Ew ne di piçûka wê de ya û ne jî di mazinatiya wê de ya. Min ew wê demê bi wê re fahmkir. Di wê demê de wê dayika min gelekî li hemberfî bidilşabûnê nebaş tevgeriya. Lê wê yek jî ji wan kirinên wê ji xwe re ne kir kul û derd û nekir sedema aksê û ankû xaydê. Demek wusa di wê ve çû. Ew li cem min bû û dilê min bi wê xweş bû. Lê ew di wê demê de wê, tişteke din wê hebûba. Ew jî wê ew ba ku minê çawa wê ji dayika

xwe re wê bihanîya gotin ku ew weke keçika ku min hêjê wê kiriya bê. Ew demek di wê vê çû û min ji wê re negot. Min ne wêra ku ez wê ji wê bênim ser ziman. Ku min hanîba ser ziman dibîyabû ku wê tiştina pirr zêde xirab bihaniya ser ziman. Roj bi roj bidilşabûnê jî dayika min nas dikir û dizanî ku çendî xwediyê keseyetek bi aksa. Êdî wê jî weke ku min tevdigeriya û wê dikir.

Demek wusa têve çû û dayika min êdî weke ku wê aksa xwe ya li hemberî wê ji bîrbikê. Heta ku wê hinek karên xwe wê bi wê bikê û wê weke yek ji malê wê li wê binerê û wê tev bigerihê.

Ev dema ku min dît wê demê rojekê di aqilê min de çêbû ku ez rastiye ji dayika xwe re werênima ser ziman. Wê helwesta wê û kirinên wê û goitnên wê ew hêz da min û xwestek bi min re da çêkirin. Tiştêkê din jî hebû ku min ew weke ku ew ji bîrkiribû û min ji bidilşabûnê re jî ne hanîbû sere ziman. Ew jî wê ew bê ku wê dema ku wê dayika min wê, keçikek wê ji dora ji min re dîtibû û wê dixwest ku ew bi min re bi zewicê. Ji xwe yek ji wan sedema ku dayika min ez cezakiribûm jî wê ew ba. Ber ku wê di wê demê de weke ku wê xwestibû ez nêzî wê nebûbûm. Piştî ku ez û bidilşabûnê hatibûn bo ku ez dilê dayika xwe hildim ez pirr baş tevdigeriyam û wê çî gotiba min wê weke wê dikir.

Rojekê dayika min ku ew jî wê li wir li cem me rûniştibê got ku "axx kurê min, ne êdî dema zewaca te hatiya û divê ku tu bi **Nêzîdarê** re jî bizewicê. Wê dema ku wê navê wê got ez hingê weke ji mejiyê xwe werima lê xistin li min hat. Lê min nikaribû ez ti gotinê bibêjim û li dijî wê rabim.

Bidilşabûnê hema wusa li min dinerî û bi min re weke ku wê bi awirê re bidest axiftinê kir. Min ew hêstirên ku ew lib bi lib li dûv hev ji çavên wê diketin min didîtin û ew weke ku ew li hundûrê min werin barîn li min hatibû.

Piştî wê, bêtaqat mam. Dayika min bi dest amedekariya deweta min kir. Heta ku wê bi weke xêlanî wê, roja çûna dem bûkê wê bikin û wê, bêjê bidilşabûnê ti jî wer bi me re. Lê ez ti tiştêkê ku ez ji te dixwezim ku tu wê nebêjê ezê wê dûnyayê li te tang bikim. Tiştê ku wê ji wê xwestibû jî wê ew bê ku wê dema ku wê hertina male bûkê wê ser pirrekê re wê herin û wê dayika min ji wê keçika faqir wê bixwezê ku ew bi hêstirên xwe wê çemê tişî av bikê.

Wê çawa wê kiriba û wê, ew çawa wê bûba wê faqirê ew ne dizanî û tenê çû ser pirre û bidest girî kir. Xwe kust bi girî.

Piştî wê, ew hatina malê û bi wê amedekariyê re wê çûn hatin wê bibê. De ne, w weke adeta me bê ku wê dema ku wê xêlî wê werina malê zavê wê ava bixwê wê bidina wan. Wê demê bidilşabûnê wê ew dayika wê bi wê bide amedekirin û wê bêjê ku ew li mêhvanan belav bikê.

Dê vêca li wê bihizire ew berê çawa dijî û nûha ketibû çî rewş û halê de. Piştî wê, ku wê, dema ku wê roja çûna bûkê wê bikin wê di wê demê de dayika min wê tişteke din jî wê ji bidilşabûnê wê bixwezê. Ew jî wê ew bê ku wê, hemû nivînên male bûkê ew çêbikê û **ji pirtikên tayr û çûkan wan tiştî bikê**. Wê çawa wê kiriba wê nedizanî. Wê demê ez çûma cemê û min pirtikek da wê min gotiyê de wê bişawitinê hemû tayrik wê bêhna wê bikin û wê, werina cem te û wê xwe ji pirtikên xwe bi paritênin û wê herin. Êdî tê karibê nivînan ji wan dagirê. Wê jî wusa kir. Dema ku wê ew pirtikê ku min dayê de wê şawitand. Dît êdî hema hundûr tiştî tayrik dibû. Nofek dihat û yek diçû. Hemûyan pirtikên xwe ji xwe dikirin û dihiştin û diçûn. Wê demê wê hemû nivîn çêkirin. Wê demê bûk hanîn û wê dema dewetê ku wê êdî wê hinekê têve wê herê û wê bibê weke dema razanê wê odaya zifafê wê were çêkirin. Hingê ez ketimê û min pirtûkek da destê xwe û min bidest xwandina wê kir. Wê demê min heta nivê şevê bi xwandinê re wê derbaskir. Min geleki xwe meşkul da nişandin. Di wê demê wê bûk wê bi cilên xwe yên dewetê wê hema xwe li rex min wê dirêj bikê û wê, di xewê ve wê herê. Piştî ku min dît ku ew di xewê ve çû ez hêdî ji rex wê ji cih rabûm û çûma cem bidilşabûnê. Di wê demê de min hinekê dema xwe bi wê re wê derbaskir û min piştî wê gota wê rabe êdî em herin bi rêya xwe ve. Wê jî xwe amedekir û êdî em bi hev re ketina rê de. Em li kiheylanekê sêwarbûn û bi hev re çûn. Me li şûn xwe ve jî ne nerî. Di wê demê de wê, dema ku wê, bûk wê, agahiya ez û bidilşabûnê çûna bi hev re wê, ku ew gihişt wê ew jî wê ji heycanê û kelecane wê nizanê wê çî bikê û wê dema ku ew diçê û tê wê, çîraya êgir wê bide ardê û wê agirekê mazin wê bi odaya wê bikeve û ew jî di nava de wê bi şawitê.

Ez û bidilşabûnê em bi hev re ketina rê û çûn û demên dirêj em çûn. Di wê demê de wê, demê tirs jî di dilê me de hebû ku dayika min wê pêşîya me ne berdê. Ew jî wê di wê demê de wê tişteke wê bikê. Ew jî wê ew bê ku wê, di wê demê de wê, ew bê ku wê di wê demê de wê, bi wê re wê, di renekê de wê, ew bixwe na lê wê xwûşka xwe mazin bi Bidilşêrinê wê li dûv me bikê rê û wê bişûnê. Ew jî pîrabokek zêde bi hêz û xirab bû. Û wê tiştê ku wê kira serê xwe de wê, hertimî wê pêkbihanîya.

Di wê demê de ez û Bidilşabûnê em li ser haspê xwe diçûn. Me hasp dida bazdan. Lê di wê demê de wê tiştek wê bibê. Ew jî wê ew bê ku wê, wê demê wê, dema ku wê bidilşabûnê wê li şûn xwe wê binerê wê di cih de wê dilê wê bi tirs bibê û wê ji min re wê bibêjê ku wa awrek reş wê li pey me dihê. Wê demê ku min li lê nerî min dît ku wa ew xwûşka dayika min bidilşêrînê ya. Hingê min ji wê re got "ew xaltika min a' û min gota wê em divê ku em xwe ji wê xilas bikin. Em çiqasî çûn me nikarî xwe ji berçavên wê winda bikê.

Min jî ji piçûkatiya xwe afsûnên dayika xwe fêrbûma û ez dikarim wê hûnerê bidima nîşandin. Wê demê min jî ew kir ku min weke ku ardek min afirand û ez jî weke xwedyê wê yê di navê de di xabitim min xwe kir şeklekê û awayekê de. Di wê demê de wê, min gota bidilşêrînî ku ew jî xwe di bin siha darekê de veşêrê. Min ew jî wê, di wê demê de wê, hişt û ez ketima nava ard û min bidest karkir. Di wê demê de xaltika min hat ardê û cem min û ji min pirsî ku ma keçek û kurek bi hev re diçûn me tu rastî wan hatî. Lê min ti bersiv neda wê. Di wê demê de wê, xaltika min ez nasnekirim. Di wê demê de xaltika min wê ew min nasnekê û wê ji wir wê herê. Wê vegehihê malê û wê di wê demê de wê ji dayika min re wê bibêjê ku wê ez ji berçav windakirima û wê êdî em ne dîtina. Dayika min ji wê pîrr zêde bi hêrs dibê û wê, hemû hêzên wê yên afsûnê wê bi afsûnekê wê ji wê bigirê. Piştî wê bakê xwûska xwe ya piçûk a bi navê Bidilxwêşê. Ew jî wê were û wê bi heman rengê wê piştî wê bikeve gerîna li me de. Wê demê ew wê, li ser melkesê wê rûnihê û wê bikeve pey me de. De ne wê di wê demê de wê melkesekê wê ji xwe re wê çêbikê ku wê digot weke darekê lê were ew lê dikat. Ku dugot weke merşekê li wê were ew lê dihat. Di wê demê de ew wê di wê temenê de wê, bûba.

Bidilxwêşê wê ew jî wê pîrabokek zêde xort bê. Wê demê ew jî ew hat û ket pey me de. Di wê demê de ku me care pêşî me xwe ji xaltika min a mazin xilaskiribû me dîsa xwe li hev da hev û me rêya domand. Piştî wê, em di rêya xwe dihatin. Di wê demê de wê, demê li gelek dever û zewiyan re em derbas bûn. Me di wê demê de gelek rê qadt kir. Piştî wê em demekê wusa li bin derekê bi hev re sekinî û me bêhna xwe veda. Hinek nanê rê ku me bi xwe re hanîbû me li nava xwe danî û me bi hev re bidest xwarinê kir. Piştî wê me hinekê kêfa xwe bi hev re kir. Dilê me xweş bû. Di wê demê de me hizir fikir ku wê ti kesek wê newê û nekeve pey me de. Êdî wê dayika min wê pêşîya berde. Wê li dûv me nekeve. Lê me xwe dixabitand. Dayika min wusa bi aks bû nayê gotina.

Piştî wê me, dîsa ku me hinek bêhna xwe li wê devera ku em li wê sekinîna me veda em êdî piştî wê, tiştên xwe me lev dana hev û em ketina rê de. Em li haspê xwe sûwar bûn û em di rê de çûn. Wê demê em çiqasî çûna em nizanin. Di wê demê de wê Bidilşabûnê wê li şûn xwe wê binerê û wê, di wê demê de wê, tişteke wê bi ber çavên wê bikêve. Ew wê weke ew bê ku wê awrek rew lê vê naqlê weke ku wê hinekê zêdetirî mazin û tîr bê wê, li dûv wan wê were. Wê demê ku wê wusa dît pîrr zêde wê bi tir bibê. Wê di cih de ez ji milê min ve hejandim û gota min va awrek li dûv me te. Wê bi tirs gota min. Min jî dema ku min li şûna xwe nerî min fahmkir ku ew xaltika min a piçûk a bi navê Bidilxweşê ya. Wê demê min ji wê rew got ku ew xaltika min a piçûk a û wê demê ma haspê xwe da bazdan. Me gelek rê û zewî derbaskirin ku em xwe ji wê xilas bikin. Lê me çî kir û nekir me xwe ji wê xilas nekir. Piştî wê, tişteke hat aqilê min. Min xwe gihand ber deverê cihekê weke nistecih bê û li wir min weke male di cih de bi afsûnê lê kir û min xwe kir rengê hêtçêkerekê de. Di wê demê de min gota bidilşabûnê jî ku ew xwe di bin siha darekê de wê bi veşêrê. Wê demê min bidest lê kirina hêtkir. Xaltika min hart xwarê û li hewirdorê nerî. Wê demê min xwe da lêkirina hêt. Ez hîç ne sekinim. Wusa demekê têve çû û weke ku ez heya min ji tişteke neyî min domandin û hêtê xwe lêkir. Xaltika min hat cem min û gota min ma te du kes yek keç û yek kur ku ew di wir ve çûna me te dîtina. Min ti bersiv neda wê weke ku zimanê min di deve min neyî. Wê çendî ku wê ji min pirsî û israrkir min bersiv neda wê. Di wê demê de wê jî wê fahmkir ku ew ezê bersivê nedim û bê hêvîya wê êdî wê, bela xwe ji min vekir. Di wê demê de wê, êdî li merşke xwe ya ji melkesê xwe çêkiri wê ser wê rûnihê û wê di cih de wê ji wir wê weke awrekê wê bi şûn ve wê veşêrê cem dayika min.

Di wê demê de dayika min ji wê pirsî ku ma wê em dîtina û ankû na. Wê jî got ku min ew ne dîtina. Wê demê dayika min ji wê pirsî ku ma wê çî di rê de dîtina. Xaltiya min jî ji wê re got ku min tenê hêtçêkerekê dît ku wî tenê hêtên xwe yên malê çêkirinê lê dikir. Wê demê dayika min fahmkiribû ku ew ew ez im û li wê bi hêrs bûbû û ew jî bêhêz û afsûn hiştibû weke xwûşka xwe ya mazin.

De ne, di dema ku wê xwûşka wê ya mazin jî wê, veşêrê û wê herê cem wê, ew wê ji wê jî di wê demê de wê bipirsê ku wê çî di rê de wê dît. Wê jî ji wê re gotibû ku min tenê kesekê ku ew di nava ardê xwe dixabîfî dît û ew pîrr weke keçekê pîr û meşkul bû. Gotibûyê de ku wî bersiv da te û ankû neda te. Wê jî gotibû na bersiv neda min. Hingê wê fahmkiribû

ku ew ez im. Bi heman rengê pirs li xwûşka xwe ya piçûk jî kiribûn. Di wê demê de wê fahmkiribû ku ew ez im.

Min hunerên dayika xwe fêrkiribûn û min dizanî ku ezê çawa bersivê bidimê. Di wê demê de wê demê dayika min wê dema ku herdû xwûşkên xwe şandibûn û destvala vegeyîya bûn li wê, êdî wê bixwe êdî xwe amedekiribû û ew ketibû rê de. Di wê demê de wê, êdî wê bixwe xwestibû ku ew bikeve pey me û me bigirê û bi şûn ve bibê.

Di wê demê de ew jî wê, di wê demê de wê, êdî wê amedekariya xwe wê bikê û wê, bikeve rê de. Wê melkesê xwe wê lê sûwar bibê û wê di wê demê de wê were pey me. Ew li gelek deveran digirihê. Ji tayrikan û sawalan dipirsê ku em bi kuve çûna û ankû wan em dîtina. Di wê demê de wê bi wê pirsînê wê xwe bigihênê me.

Di wê demê de ez û Bidilşabûnê jî li ser haspê xwe diçûn û me rêya xwe didomand. Di wê demê de em, ku em hatina ber daristanekê wê di wê demê de me dît ku wa awrek zêde mazin hat û hemû dever ji wê reş bûn. Di wê demê de wê, bidilşabûnê li şûn xwe nerî û gota min wa awrekê pîr zêde mazin bi ser me ve dihê. Min hingê li şûn xwe nerî û min dît ku ew wa dayika min a. di wê demê de min gota Bidilşabûnê ku ew dayika min a û ew hemû hûnerên ku min ji wê fêrbûna ew dikarê wan vala derxê û dawîya me hat. Hingê tirs ket dilê min de jî. Min dizanî ku ezê nikaribim li hemberî dayika xwe tiştekekê bikim. Ti hêza min nebû ku ez wê bi wê li hemberî wê bisekinim. Ya rast wê ew bê ku ti kesekê zêde ne dikarî li hemberî wê bi sekinê.

Di wê demê de me êdî xwe ji radestkirinê re weke ku me bi bêhêvî amede dikir. Çavên bidilşabûnê bi hêstir bûn û yên min jî bi tirs bûn.

Lê di wê demê de wê tiştekekê wê bibê. Bi carekê wê sê nêçîrwan bi carekê min dît ku wan li hemberî me rûdan û ew bi tîrûkavana li piştta wan derketibûbûna li nêçîrê. Ew weke sê bira bûn. Di wê demê de dayika min jî xwe kiribû şeklê eyloyekê de ku ew me herdûyan her yekê bi lapekê xwe bigirê û bi xwe re bibê. Di wê demê de wê dema ku ew nêçîrwan dema ku ew dibînin ku wa eyloyek pîr zêde mazin wê bi ber wan ve wê nimz dibê yê mazin wê tîrûkavana xwe amede bikê û wê tîrekê hişk wê biavêjê. Tîrê wî tenê wê li parê çapê e eylo wê bikeve û wê derbas bibê. Wê demê nêçîrwanê navê tîr û kavana xwe amede kir û wî tîrek avêt. Wî jî li parê rastê da û ji wê derbas kir. Lê her tîrên wan jî weke zirar nebûbûna eylo. Nêçîrwanê poiçûk wê demê wî tîr di kavana xwe de amedekir û avêt. Û wî tîrê xwe di singa eylo da da çikandin. Di wê demê de eylo hema wusa bê bêhn ma û ket ber wan de. Eylo pîr zêde mazin

bê. Wê demê min dît ku ew ket ardê. Û ew dayika min bû. Dilê min di wê demê de wê bi wê pirr zêde şawîtê. Ber ku ew çendî xirab jî ba ew dayika min bû.

Di wê demê de wê dema ku wê eylo ket ardê min dît. Di qama mirovekê zêdetirî dirêjtir û maztir bû. Ez di wê demê de dilê min li min kir heyhey. Ez hinekê bi cem nêçîrwanan re çûm. Ew jî min ji wan pirsî ku ew kina. Yekî ku navê min Elan a. Yê din ku **Sêlan** a. Û yê sêyem got navê Beylan a. Piştî wê ez demekê bi wan re mam û axiftim. Di wê demê de çavên eylo û ankû dayika min girtî bûn. Lê weke ku ew hinekê çavên wê vekirî bin wusa min kifşkir. Lê hema wusa weke xatekê di nava girtkên çav de weke ku derbas dibê wusa min dît. Ku te bi tememî lê ne nerî ba te bi tememî fahm nedikir ku ew çavên wê wusa gelekî hindikê weke ku wê hinekê vekirî bin. Weke çavên eyloyekê Di wê de wê weke mercenekê wê, biçîrisandin û biriqandin. Wê dema ku ez bi wê çîroska çavên wê re awir bi awir hatim ez weke ku ez ketima bin bandûra wê de. Weke ku dilê min çiz kir.

Wê demê min xwest ku ez wê xilas bikim. Wê dema ku wê nêçîrwan li dorê bûn min nikarî xwe bigihênima nêzî û dest lê bidim. Wê dema ku min kariba carekê xwe bigihanda nêzî û dest lê bida minê kariba bi hûnerek afsûnî ku min ji wê fêrbûya wê ji wîr biikima dûmanek reş weke ya ku ew bi wê hatibû me û wê ji wir bidima dûrkerin û windakerin ji berçav.

Nêçîrwanan jî kêfa ji hev re dihanî ku wan nêçîrek başkirina. Lê wan nêçîrwanan fahmnekir ku ew pîrabokek bû ew hinekê bi ser xwe ve hatiba wê zirarek mazin wê bide wan ku heta ku ew sax ban wan ew ji bîr nekiriba.

Ev jî di aqilê min de derbas dibû. Di wê demê de tenê bo ku ez wan nêçîrwanan ji wê xilas bikim min xwest ku ez dayika xwe ji wê rewşê xilas bikim. De ne, xoslekê afsûnkarên weke wê hebû ku wê dema ku ew ji wê rewşê hat xilaskirin êdî wê nikariba xwe li wan daba diyar û zirar bida wan. Min ew dizanî.

Di wê demê de wan demekê wusa li dora nêçîra xwe weke nêçîrwan çûn û hatin û destê xwe dana milê hev û kêfa xwe ji hev re hanîn. Wê demê wan di wê kêlîyê de hersêyan bi hev re rahiştina eyloyê ku ew bi wê bi hev re bibin. Ancax sê mirovan dikarî rajinê. Wusa mazin û giran bû. Lê di wê demê de wê, dema ku wan rahiştîyê û kirin ku ew herin min jî di wê demê de firsendek dît û ku ez destê xwe bidimê. Min destê xwe gihandiyê. Di wê demê de wê dema ku min destê xwe gihandiyê û ji min

ji wê kişand. Min pirtikek ji wê kişand. Ew pirtik heta ku ew bi mere ba wê nêkarîba nêzî me bûba. Lê min divîyabû ku wê pirtikê bi xwe nehiştiba. Li deverek ne dîyar wê veşartiba. Piştî wê, ku min ew kir. Min dît ku wa dayika min a bûyî eylo di cih de wê bibê dûmanak pirr zêde **reş weke qatranê** û wê di wê demê de wê ji berçav ji ser milê wan herê nêçîrwanan wê winda bibê. Hemû li wê mana hey û şaş ku ma çî bû. Di wê demê de her sê nêçîrwan bi heybet û hinekê tirs ku wê bikeve dilê wan wê ji xwe re wê, li devere wê li ser latekê wê li rex hev wê rûnihin û wê bi aqilê xwe wê bikin ku ew rewşê ew fahmbikin. Di wê demê de wan fahmkiribû ku ew ne mirovek û ankû eyloyek bû. Ew pîrabokek bû. Di wê demê de wê, ew tirs dikira dilê wan de.

Piştî ku ew ji ji holê winda bû ez çûma cem nêçîrwanan û ji min re got ku hun serê xwe ji wê neêşênin û bi wê re alaquadar nebin. Min xwest ku ez jinekê wan dilrehet bikim. Lê nafiye bû. Ew di xwe de nedikarin rehet bibin.. Di wê demê de min ew di rewşa wan de hişt û ez ji wan dûrketim û ez hatima cem bidilşabûnê û me bi hev re weke berê me rêya xwe da domandin. Min dizanî ku ewê hinekê din wê wusa bimênin û wê piştî wê di demek kin de wê, piştî wê, li xwe wê werin. Wê ew wê şaşbûn û matmayînê wê ji ser xwe biavêjin.

Piştî wê ez û bidilşabûnê em ji dayika min xilas bûbûn. Min dayika min şandibû malê. Ê ew heta ku ew bi ser xwe ve were wê çend salan wê hilde. Ev jî wê demek dirêj ba ku wê em rehet bihiştta û wê di wê demê de me yê ewlehiya xwe bo piştî wê jî girtiba.

Ez û bidilşabûnê em di wê demê de em hatina cem male bavê wê û di wê demê de em li wir man. Wê dema ku ez çûma hemberê bavê wê yê şah, gotina min weke sûxrevan tu awa wî haddî di xwe de dibînê ku tu keça min bi ravênê û bibê. Piştî wê bidilşabûnê mesele hemû ji serî û heta binî ji wî re got û hanî ser ziman ku ez di aslê xwe de kesekê bi asil im. Ne kesekê weke sûxravan im. Hingê bavê wê bawerkir û em lev hatin û dilê me bi hev baş bû. Piştî wê ez û bidilşabûnê li wir bi hev re zewicin.. Pirr zêde ez rastî alaqaçek baş û qanc hatim.

Di wê navberê de aqilê min jî hertimî li ser dayika min bû. Wê demê wê çî bibê û çawa wê bibê. Di wê demê de ez li wê hizirim. Di wê temenê de wê, di wê demê de wê li wê hizirim.

De ne, ku ew baş bû min tefkir dikir ku ew wê pêşîya me neberdê û wê bi ser me ve wê were. Heta ku wê bixwezê ku ew zirarê bide me.

Ber vê yekê ez ketima mitale û lêgerîna rêyan û çareserîyan bo xwe û bidilşabûnê. Di wê demê de em li deverek deveran gerîyan. Bavê

bidilşabûnê jî dixwest ku em li cem wî bimênin. Ber ku ew dilê wî bi keça wî ve bû û dixwest ku ew li berçavên wî bê. Lê di wê demê de keçikê di wê demê de mesele ji wî re hanî ser ziman û di wê demê de bahsa hatina dayika min a pîrabok kir ku ew dikarê zirarekê mazin bide me. Di wê demê de wê got ku wê ti kesek hêza wan wê bi wê nikaribê. Wê wusa got û ma sekinê.

Di wê demê de bavê wê hinekê hizirî û di dewama wê de wê piştî wê, ew jî wê bihizirê û demek dirêj wê bêdeng bimênê bo me. Pişt wê, ew bi çareserîyekê ji me re hat. Ji me re got ku ezê we bima gulistana tayrê tawusî ku ew xwediyê qûdretê mazin a li ser rûyê dûnyayê ya. Ew wê di wê demê de wê, hertiştê wê heya wê ji wê hebê û ew xwediyê gelek çavên ku ew hemû dem û deveran bi wan dibînê bê.

Wî wusa got û ma sekinî. Piştî wê, wî em dana li dora xwe û em di rêyek dûr û mazin de dana meşandin û wî em hanîna vê deverê. Ev dever wusa mazina nayê gotina. Te dît ku tu di qulek piçûk a bîre re hafî kişandin li vir û tu dibînê ku ev çendî cihan û dûnyayek mazin a. Ev hemû ji qûdreta tayrê tawusî dihê pirsîn.

Di wê demê de em dema ku em hatina wir û bavê bidilşabûnê şah hat hemberî tayrê tawusî û ji jêre axift û hemû meseleya me ji jê re hanî ser ziman. Wî bawer dikir ku ne tayrê tawusî wê rêyê ji me re bibînê wê ti kesek wê ji me re wê nikaribê wê bibînê.

Di wê demê em piştî wê hatina vir û li vir em demekê dirêj bi hev re êdî em man. Me jîyane xwe li vir da domandin. Ne dibê ku tu zanibê ku kesê ket gulistana tayrê tawusî de wê ne tenê wê xweşikatiya wê bi wê re wê bijî. Wê wekî din wê bibê xwediyê jîyanek nemir a bi hemû deman re wê bijî. Ew jî wê ji qûdreta tayrê tawusî wê were pirsîn.

Tayrê tawus ew di bin çengên xwe dûnyayê dihawênê û di baskên xwe wê, xwediyê nerîna li hemû gerdûnê bê.

Di wê demê de em hatina vir û li vir êdî bi saya bavê bidilşabûnê em man û em bûna xwediyê jîyanek demdirêj a bi ewla. Ti kesek wê nikaribê li vir wê zirare bide me. Di wê demê de ev li vir wê ti afsûnên xirab jî wê bandûra wan wê li vir wê bandûr nekê. Ji wê aliyê ve em bi ewlebûn ku wê dayika min wê ne karibê xwe bigihênê me û ne jî wê karibê zirare bide me.

Di wê rewşê de ev gulistanan ku tu wê dibînê hemû tiştê wê bi qûdret in.

.

... o0o...

Di wê demê de keçelok li hemû serborîya dêw hisand û di wê demê de wê, demê ew de vera ku ew di wê de dijîyan jî ew gulistana tayrê tawus bû. Di wê demê de keçelok êdî ew di dilê xwe de ghiştibû wê qinyatê ku wê dêw wê ti zîrarê wê nede wî. Wê zîrarê wê ji wî re wê çênekê. Lê wî di wê demê de ku wê dêw ji wî re wî bi axifê û wê werênê ser zîman ew jî di wê demê de wê, dem bi dem wê awirên wî herina bi ser wê keçika xweşik. Wî çavên xwe û awirên xwe ne dikarî ji wê bikê û ji wê dûrbikê. Ew keçik hingê xweşik bû û ew rind bû. Di wê demê de keçelok piştî ku dêw hinekê ma sekinî pîrsê di serê wî de rûda. Pîr zêde dixwest ku ew bipîrsê ku ew keçika wusa xweşik û sipahî gelo ew keçika ku ew bahsa wê dikê bidilşabûnê ya û ankû ew yek din a. Di wê demê de wî ew wê, pîr zêde wî mereq dikir. Li wê dihizirî û wê, dixwest ku ew wê fahmbikê. Lê wî ew di xwe re ne didît ku ew wê devê xwe vekê û wê pîrsê ji dêw bikê. Heta ku wî pîrs kir dêw tiştê ji wî kiriba. Ya ku wê di wê demê de wê di serê wî de wê derbas bibê wê yekser wê ev bê. Ber wê yekê wî, ne dikarî ew wê tîrsa xwe wê, derbas bikê û ew wê, pîrsa di serê xwe de ji dêw bikê. Wê dema ku ew wusa di serê xwe de dihizirê û diçê û dihê wê, weke ku wê dêw ew wî, dibînê û ya di serê wî de dibînê ku ew çî dihizirê. Di wê demê de hema wusa çavên xwe li ser wî raqiribûn û li wî dinerî ka keçelok wê wêra bikê ku ew wê pîrsa xwe li lê bikê.

Wî ew pîrsa wî di serê wî de ku wî di bir û dihanî didît. Ber vê yekê ew li bendê wê û pîrsîna wî mabû. Keçelok di wê demê de wî ew di xwe de ne dît ku ew wê pîrsê bikê, her çendê ku ew di serê xwe de weke ku ew ghiştibû wê qinyatê ku ew wê zîrarê nede wî jî. Di wê demê de wê hêstekê wî bi şûn ve bida kişandin.

Hinekê din ew di wê demê de têveçû êdî dêw ew fahmkir ku ew wê pîrsê wê li wî nekê. Ber vê yekê wî bi xwe de ku got ku `nûha tu mereq dikê ku ew keçika xweşik kîya.' Ez wê ji ter bibêjim ku ew keçik bidilşabûnê bixwe ya. Tê wê dibînê ku ew çendî xweşik a û bi xweşikatiya xwe hewirdorê rohnî dikê..

Wusa got û dêw ma sekinê. Keçelok di wê demê de wî bersiva pîrsa xwe weke ku wî hilda bû. Di wê temenê de wî xwe gihandibû bersiva pîrsa xwe. Keçelok di wê demê de êdî di wê demê de wê weke ku ew di serê xwe de wê hinekê din wê rehet bibê. Di wê demê de wê dêw hinek tiştên din jî wê ji wî re wê bibêjê. Ew jî wê di wê temenê de bin ku wê di wê rêwitiya xwe wê rastî çî wê were. Di wê temenê de wê, dêw wê bibêjê ku hemû tişt wê nepeniya wê di ya di destê te de bê. Ya di destê wî de wê hinekê jî wê ew herdû hinarên ku wî dana wî bûn.

Lê keçelok di wê demê de wî, di wê demê de wî hizir nedikir ku ew wê bixwê. Di aqilê wê de jê derbas nedibû. Tenê ya ku ew di aqilê wî de derbas dibû wê ew bê ku ew di wê demê de wê, çawa wê, çawa wê, xwe bigihênê ser rûyê ardê.

Piştî wê keçelok hinekê li gotinên dêw hizirî. Gelek gotinên wî ji wî re wê weke ku wê bi nepenî wê werin. W dixwest ku ew wan bipirsê lê weke ku wî an wêre nedikir û ankû wî di xwe re ne didît. Di wê demê de wî, di renekê de wê weke ku wê di wê rengê de wê, li wê bihizirê bê.

Keçelok di wê demê de wê, demê êdî ew di serê xwe de derbas dikir. Hingê dêw gotiyê ku 'tu mereq neka, ezê te derxima ser rûyê ardê.' Wê dema ku wê dêw wusa got weke ku ew ya serê wî bixwênê lê hat. Keçelok hingê ew pirs ji xwe kir ku ew 'gelo ew ya di serê min de dixwênê.' Di wê demê de wê pirsê bi xwe jî di serê keçelok de hinekê tirs da çêkirin. Di wê temenê de wî li xwe dikir ku ew ti tiştî ne hizirê. Lê di wê demê de wê, di wê temenê de wê, çawa wê, xwe ji tirsê jî xilasbikê ew jî li wê dihizirî. Lê ew weke ku weke ew ji wî re di wê demê û kêlikê de weke ku ew ne bi derfet bû. Wê bi xwe jî ew di xwe de weke ku ew hîskir.

Keçelok di wê demê de ew hinekê din ma û piştî wê dêw, gotiyê de êdî were ez te derxima ser rûyê ardê. Lê ya ku min ji ter got bila di aqilê te de bê û ji ti kesê li dora te wê li hev bicivin piştî ku tu ji bîrê derketî ji kerwanwanan ji wan re nebêjê.

Keçelok got bila û ma sekinî. Piştî wê dêw ew hanî ber devê wê qula ku ew di wê re li hundûrê wir hatibû kişandin û dêw bi nav milê keçelok girt û ew weke ku ew wî biavêjê li jor kir û hema wusa keçelok xwe li jor li ser devê bîrê rûniştî dît. Hinek kevirên şahîk û xweşik li dora devê bîrê hatibûna bicihkirin û hinek bilind bûn ku kesê ku ew avê bikişênê ew xwe li wan bigirê û ew nekeve bîrê. Di wê temenê de wê, dema ku keçelok xwe li wir dît ma acêbmayî. Piştî wê di cih de wê kesên nava kerwanê wê di cih de wê ew wî kifşbikin û wê li dora wî bibin kom û wê bibê ah û aha wan ku ew çawa derket.

Di wê demê de wê herdû mirovên ku wan wesir li noqa wî girêdabû û ew berdabû binê bîr ew hatina ber wî û jê pirsîn ku ew çawa derket. Ber ku wan ti carî zan ne dikir ku keçelok wê ji wê bîrê êdî wê bi saxî wê derkeve. Bi nesaxî jî wê dernekeve. Wan wusa hizir dikir. Lê dema ku wan ew li hemberî xwe dîtibû ew pîrr zêde ji wê acêbmayî mabûn û hema wusa bi çavên req wê li wî wê binerin.

Wê demê yek ji wan hat ber keçelok û jê pirsî ku ma tu çawa derketî. Keçelok hingê bersiva xwe da û got ku 'ez çawa derketim êdî ez derketim. Ya giring ew a ku ez derketim. Ya din ne hewceyê cihê pirsînê ya. Lê ew herdû mirovên din ew êdî pirr zêde tirsîyan. Wan di serê xwe hizirkir ku keçelok xwe ji bîrê kariya derxê û wê tiştekê wê werênê werênê serê wan. Wan piştî wê dixwestinku ew hertimî bi keçelok re baş bibin û wê hertimî wê bi zimanekê baş wê bi wî re wê bi gotina xweşik wê bikin ku ew bidin û bistênin.

Wan herdû mirovan dizanî ku wê di bîrê de wê dêwek wê hebê û heta wê demê kesên ku ew ji wan nexweş mana û xwestina ku ew tiştek werê serê wan berdana binê bîrê û ji wan xilasbûna. De ne, dêw ew jî ji wî re gotibû. Li ser wê dema ku wan herdûyan bahsa derketina wî kirin û çawa derketina wî ji wî pirsin hingê keçelok cardin bersiva xwe ya berê da û got ku ez çawa derketim êdî ez derketim. Ya giring ew a ku ez derketim. Piştî wê keçelok bo ku ew tirsekê bikê dilê wan mirovan de got ku "yekî li binê bîr got ku Wan herdûyên nava kerwanê ku wan çawa gelek kes bo ku ew ji wan xilas bibin wan ew berdana binê bîrê. Heka ew neçin û xwe ne gihênina malbeta wan û lêborîna xwe ji wan nexwezî ezê tiştên xirab bênîma serê wan." Wî dema ku keçelok ew ji wan re wusa got wê, pirr zêde wê tirs wê bikeve dilê wan û wê rahnê wan wê biraharin. Hingî diricifin ne dikarin xwe li ser lingên xwe bigirin.

Di wê demê de keçelok piştê ew bi tenê hiştin û ew hat cem haspê ku ew barê ku ew ji wê berpirsyar a. Li wir rûnişt. Di wê demê de wî, cileke li ardê rayixist û xwe li ser wê dirêjkir û berê awirên xwe da bi azmanê ku wê gelek stêr wê li wê dîyar bin.

Keçelok di wê demê de ew li dayika xwe hizirî. Wî geleki bîra wê kiribû. Lê di wê demê de wê, rêwîtiya wî û şartê hilêrê hat bîra wî û wî di xwe de weke ku wî xwe mecbûr hîskir ku ew wê werênê li cih. Piştî wê, ji xwe re got ku ezê wê bînim li cih û wê bikim.

De ne hertimî dayika keçelok li ser karina xwe û şikandina mereqe xwe bi wê re diaxift û aqil dida wî. Gotinên bi aqil ji wî re digot. Ew gotinên wê hatina bîra wî. Di wê demê de wê tiştek wê were bîra ku wê rojekê wê dema ku wê dayika wî bixwezê ew herê ciranê û hinekê bi wan re rûnihê û wê keçelok li malê bê û wê ji wî bixwezê ku ew dest nedê ti tiştê û rehet rûnihê wê tembihê li wê bikê wê were bîra wî. Di wê demê de keçelok di wê demê de wê dema ku wî ew hizir fikir jî wê hinara dêw ku wî daya wî di wê demê de wê pirr zêde wê mereqê di serê wî de wê çêbikê. Wî li wê dihizirî ku ew çî di wê de heya û ew çî ya. Wî di wê

demê de dilê wî pirr zêde çû xwarina hinarê. Lê wî di wê demê de wî, xwestibû ku ew bimênê.

Lê di dawîya dawî de keçelok xwe negirt û wî kira serê xwe de ku 'çi bibê bila bibê ezê hinarekê bişikênim û wê bixwûm. Dilê min gelekê çû yê.' Wî wusa ji xwe re got û ew hinekê ma sekinî. Piştî wê hinekê wî ma sekinî û wî di wê demê de wî hinarek wî hêdîka ji berxwe derxist û ew danî ber xwe wî hêdîka ew şikand û ew vekir ku ew hundurê wê û libên wê di wê reşîya şevê de ji xwe dida dîyarkirin. Lê ne reş bû. Tavaheyv hebû û dûnya weke nava rojê bê rohnî bê. Piştî keçelok hinekê ji wê hinarê tahmkir û xwar. Pirr zêde li xoşa wî çû. Wî gelekî xwar lê piştî ku wî têr hinar xwe wî dît ku wa hinara wî weke xwe maya û weke ne şikandî weke kêlîka pêşî li pêşîya wî ya. Tenê libe ji wê li rex wê dervî wê mabû. Keçelok ji wê ma acêb mayî. Keçelok di wê demê de wî di cih de rahišta hinarê û dîsa kir berxwe û danî ber ya din. Lê ew liba sor nava nava hinarê ku wî ra hiştîyê dît ku ew bû weke kevirekê sor. Di wê demê de keçelok kevir di destê xwe de bir û hanî. Lê keçelok ti tişt ji wê fahm nekir. Piştî wê kevir hinekê din mazin bû di destê wî de. Keçelok ji wê ma acêb mayî. Di wê demê de keçelok wê, dît ku wa di wê dema şevê de wê çûkekê piçûk hat û li ber wî sekinî û bi wî re bidest axiftinê kir. Keçelok ji wê pirr zêde acêb mayî ma.

Ji xwe re got ku ma çûk diaxifin û ma sekinî. Weke ku çûk ew hisa wî ya hundurê wî kir û ji wî re bersiv da û got ku "keçeloko ma dema ku tu hinarê bixwê û têr bixwê û piştî wê hinara te weke xwe weke ne şikandî li pêşîya te bi sekinê bi derfeta lê çûkek piçûk biaxifê ne bi derfet a. Tu wusa di hizirê. Keçelok di wê demê de got na ez li tişteke ne hizirima û ma sekinî. Piştî wê keçelok hinekê li çûkê rûnişt û bi çûkê re axift. Çûkekê zêde xweşik û sipahî bû. Keçelok ew farqkir. Piştî wê çûk hinekê ji wî dûrket û ji wî re got ku keçeloko were vêdereha ezê tişteke ji şanî te bidim. Di wê demê de keçelok bi tirs ma sekinî. Pêşî dilê wî nexwest ku ew wê bi şopênê û ew li duv wê herê. Lê keçelok di wê demê de wî xwe negirt û çû devera ku çûkê ew şanî wî da û bi wir ve firî. Keçelok hat wir û ma sekinî. Di wê demê de keçelok dît ku wa bayekê weke zêde bi hêz hat û keçelok nekarî xwe li ber wê bigirê û bê keçelok da berxwe û ew bi xwe re bir. Di wê demê de keçelok di serê xwe de hizirkir ku ew tenê dihê serê min û ankû kerwanên din jî ew dihê serê wan. Lê wî ti kesek li dora xwe nedît. Bê ew hanî û weke hanî devereke din a dûr ku ew weke dîyarekê din bê. Di wê demê de keçelok dît ku wa her devere wê rohnî û tava rojê rohnîya wê pirr zêde germ û geş li her devere dide.

Keçelok di wê demê de ew hinekê li wê hizirî ku ew li kûya. Di wê demê de wî gotinên dêw bibîrkin ku fêkiyê gulistana tayrê tawus bi nimet û qûdreta. Wê demê hemû fêkiyên wê wusa bûn. Di wê demê de keçelok ew bibîrkir di serê xwe de. Lê keçelok ti tişt fahmnekir û ne dizanî ku ew li kûderê ya. Wê demê ew devera ku ew hatiyê wê deverê din a gulistana tayrê tawus bê ku bê ew li wê berxwe hanî û firanda li wê. Keçelok hinekê li wê hizirî. Lê keçelok di wê demê de ew dordorên li dora xwe jî weke gulistanê nedît. Wî tenê weke çolekê beyer û bêkes dît. Di wê demê de keçelok dît ku ew devera ku ew li wê hemû kevirên wê sor bûn. Keçelok di wê demê de hat aqilê wî ku ew xwe bi tawênê û destê xwe biavêjê kevirê û ji ardê wê hilde li dest. Lê di wê dema ku wi kijan kevirê sor dest avêtîyê kevir ji wî ravin. Hemû kevirên ku wî dît. Lê nedikarî rajê tenê kevirê jî. Di wê demê de keçelok xwe di nava xilobatekê de dît. Dît ku hewirdor bi carekê bo reş û di nava tarîyekê de ma.

Keçelok hinekê ma şaş û li dora xwe nerî. Lê wî ji ber wê tariyê wî ti tişt bi çavên xwe yên rût ne didît. Di wê demê de wî ne zanî ku ew wê çî bikê. Di wê demê de wî dît ku wa çûkek wê bi ber wî ve difirê û pîrr zêde mazin bû. Ku çûk hinekê bi ber wî ve hat, û nêzî wî bû wî di wê derxist ku ew çûk ji wî çûkê ku wî berî dîtibû û pê de ne ti çûk bû. Ber vê yekê keçelok di wê demê de tenê dengê çûk kir ku çûk gotiyê de ku bi baskê min bigira.. Dema ku çûk wusa got, keçelok zankir ku wê çûk wê dema ku wî xwe bi baskê wê girt wê di wê demê de wê, ew bi wê re wê bi firê û wê ji wê devera tarî wê xilas bibê. Lê dema ku wî destê xwe avêta baskê çûk dît ku wa kevirê sor ket destê wî û çûk ji ber çavên wî windabû.

Keçelok di wê demê de wî ne dizanî ku wê çî bikê. Hinekê ma sekinî û di cih de hazinî. Pêşîya xwe jî ne didît. Lê bi wê rengê hêdî hêdî dikir ku ew herê. Demek dirêj ew wusa diçê û ku ew piştê dît ku wê dibînê ku wa pêşîya wî weke rohaniya ew di cih de xwe digihênê wê deverê. Li vir wê xwe bigihênê û wê ji tariyê wê xilas bikê. Piştî wê keçelok li şûn xwe mayizend û dît ku hemû tarî di cih de ji berçavan windabû. Hingê keçelok got ku 'ev vê ca çibû. Di wê demê de keçelok dîsa ew deverên bi kevirên sor tisî dît.

Di wê demê de keçelok di wê demê de ma sekinî û nezanî ku ew çî bikê. Lê di wê demê de keçelok di wê demê de ew hinekê din ma sekinê û piştê ew hêst bi wî re çêbû ku ew rajê kevirê ji ardê. Lê dîsa wusa lê hat. Çendî ku wî destê avêt kevir û wî dît ku wa ti kevir di cihê xwe

namênê. Hemû kevir wê ji ber wî biravê. Ne dixwest ku ew bikevina dest de. Di wê demê de keçelok dît ku wa bayekê din hat û keçelok dîsa li berxwe bir. Weke ku ti giranî di wî û laşê wî de nebê wî xwe bi bê re hîskir. Weke ku ew ti kutle di laşê wî de nebê. Keçelok di wê demê de wî, gotina ku wê ji derkeve wê ew bê ku «dê lê vê acêbê. Ev vêca çî ya» û ma sekinî. Hingê keçelok tenê di xwest ku ew rajê kevirê piçûk ê sor ji ardê. Çendî ku wê hewirdora wî ji kevirê wê tişê jî bê lê wî nekarî rajê tenê kevirê piçûk jî. Tenê kevirê piçûk ê ku wê çûkê bi baskê xwe berdabû di destê wî de bû. Wî ew avêtibû berika xwe. Ev devera din a ku ba ew li berxwe li wir hanîbû ew der jî weke hemû bi kevirên sor bê. Weke ku keçelok hatibê welatekê din ê ku ew hemû bi kevirên sor bê. Wî wusa xwe di xwe de hîskir. Keçelok ne dizanî ku ew di nava çî rewşê de ya. Wî di wê demê de hizir ku ew çawa wê vegehî cem kerwanê xwe û wê demê ku ew ne li wir wê bê hasp û malê di bin mesuliyata wî de wê, winda bibê. Wî di wê demê de wê, çî bikira. Wê êdî weke kesekê bêbawer wê maba. Ew hinekê li wê hizirî. Lê di wê demê de ti tişt ji destê wê ne dihat. Keçelok tenê dixwest ku ew rewşê fahmbikê ku ew çî ya û di nava çî rewşê de ya. Wî hemû kevir sor bûn. Lê wekî din dûnya û ard, ax û hemû tiştên din weke xwe bûn. Şînî bi şînatîya xwe dihat dîtin. Keçelok ev meseleya sorbûna keviran wê fahm nekir û di wê demê de ew li wê dihizirî. Wê dixwest ku ew wê fahmbikê. Ew çî bû. Hinekê li wê hizirî. Di wê dema ku ew hizirî wî dît ku wa ba cardin rabû ew da berxwe û bir devereke din. Di wê demê de keçelok wê devera din ku ew hatiyê wî dît ku wa ew dever jî wê bi kevirên sor bê. Di wê demê de wî dîsa xwe tawand û kir ku ew destê xwe biavêjê kevirê. Lê dîsa kevir ji ber destê wî ravîn. Keçelok cardin ji wî ma acêb mayî. Di wê demê de ew tiştê din hizirî. Ew sê car bûn ku ba wî li ber xwe dihênê û her cara ku wê ba wî li berxwe bibê ew berî wê di serê xwe de dihizirê û dihazinê. Gelo ew hizir û hazna wî dibû sedema wê? Di wê demê de ew li wê hizirî. Wê carê weke ku wî xwest ku ew bi wê hizra xwe wê biçeribênê. Di wê demê de keçelok hinekê weke care pêşî bihizir û haznê. Di wê demê de wî. Hinekê hizir û dît ku wa cardin bayek bi hêz rabû û ew dîsa li berxwe bir û bir devereke din. Wê carê wî qinyat bi wê hanî ku ew têkiliyek wan bi hev re heya.

Li ser wê ji xwe pirsî ku ew dema ku ew li tiştê bi hizirê wê weke wê bibê? Hingê ev pirs di serê wî de bû. Keçelok di wê demê de wê demê li wê hizirî ku gelo tenê li vê devere wusa ya ku mirov bi hizirê wê karibê bi hizra tiştê bikê û biafirênê û bide kirin û ankû li hemû deverên din

wusa ya. Keçelok heta wê demê li dûnya ku ew dijî wî ti tiştê wusa weke ku wî kifşnekiribû. Lê ew demek ne li dûnya xwe bû.

Keçelok di wê demê de ew di wê demê de wî têtikiya li ber ba firinê bi aqilê xwe re danî. Lê ew hê jî ji wê ne bi êmin bû. Di wê demê de di wê demê de wî tiştê din kir serê xwe. Wê kir serê xwe ku ew qatî û kesin ew di wê demê de ew kevirê sor ji ardê rajiyê. Wê carê ket pey kevirên sorê. Demek dirêj wusa ji pey keviran ket. Di wê demê keçelok dît ku wa mirovekê din ku ew qama wî hema bêja nêvî ya keçelok dirêj bû ew serê wî dihat noqa keçelok û weke mirovekê mazin û xwediyê simbilên gûrr bû derket û rûda li hemberî wî. Te digot qey ew acutkeka. Keçelok di wê demê de wî, tenê li wî mirovî kin meyizend. Keçelok di wê demê de ne dizanî ku wê çi gotinê wê bibêjê. Mirovê kin tenê bi çavna req awirên xwe dana ser keçelok û hema wusa lê nerî. Piştî wê mirovê kin li keçelok axift û ji wî re got ku «keçeloko tu çima bela xwe ji wan keviran nevekê û wan rehet neberdê.» Piştî wê got «bela xwe ji wan veke û ma sekinê.»

Di wê demê de keçelok ma sekinî di cihê xwe de û ne dizanî ku ew çi weke bersivê bidiyê. Di wê demê de mirovê kin hinekê din nêzî keçelok bû û gotiyê nebêjê ku ez ne zindiya û ne xwediyê hîs û hîskirinê ya. Her tiştê ku ew heya dikarê di xwe de bibêjê xwediyê hîskirinekê ku em ji wê bigirin û ew ji me bigirê.» keçelok hingê gota mirovê kin nexew tu dibêjê ev kevirên sor zindi na?» Lê mirov kin ti bersiv neda keçelok li hemberî wan gotinên wî. Ew tenê ma sekinî û lê nerî. Keçelok jî bi wî re çav bi çav hat û lê nerî. Keçelok di wê demê de xwest ku ew ji mirovê kin bipirsê ku ew kûdere û ezê çawa xwe bigihênima kerwanê xwe.»

Lê keçelok di wê demê de hinek hêstna ew bi şûn ve da kişandin. Di wê demê de keçeok wê, di wê demê de wê hinekê wê bimênê sekinî. Piştî wê, hêsta wî zor da wî ku ew pirsê xwe bikê. Lê keçelok pirsê xwe nekir. Piştî wê hew dît ku mirovê kin ji berçavên wî windabû. Lê keçelok ew weke di dilê wî de ma. Hingê wî ji xwe pirsî ku 'xwezî ku min berî ku ew ji holê windabû min pirsê xwe li wî kiriba û min ji wî pirsîba. Ew weke girêkekê di qirika wî de ma.

Keçelok piştî wê di wê demê de wî ne dizanî ku wê çi bikê. Pêşîya wî tenê weke çolek ku ew dirêj dibû û çendî ku ew çûba wê karibî herê di nava kevirên sor de. Lê her gave xwe ya ku wî diavêt jî kevirên sor bo ku ew nekevina bin lingê wî de wê, xwe ji pêşîya wî bidina alikî. Wî ew jî farqkir. Lê ew êdî ji wê weke ne di tirsîya. Lê mereq dikir ku ew li kû bû. Di nava hinek acêban de dijî ku wî ew fahm nedikir. Ew li kû bû wî nedizanî. Ew çî hatibû serê wî wî ne dizanî. Kê ew hanîbû serê wî wî ew

ne dizanî. Di wê demê de tiştêkê jî ne dihat aqilê wî. Di wê demê de wî ji xwe re got ku «wê dema ku mîn hinara xwe dixwar û çûk derket hemberî min û gota min were di vir ve em herin ezê tiştêkê şanî te bidim ku ez hingê li dûv wê neçûba wê ev ne hatiba serê min.» Ji wê demê û wê li dûv çûnê posmaniyek di wê demê de ew di hundurê wî de rûda. Lê êdî wê fêde nedikir. Wê posmaniya wî jî wê weke ku wê ew xilas nekiriba. Wî di wê demê de ew hêst di xwe de girt û jînkir. Piştî wê, bi carekê dît ku ez çûkê ku ew hanîbû û ew kiribû wê rewşê de wî ew car din dît. Di wê demê de wê dema ku wî çûk dît hingê keçelok weke ku ew li çûk bi hêrs bibê lê hat û wî di wê demê de ne dikarî rajê kevirêkê ji ardê ku ew biavêjiyê lê wî hema ew kevirê ku wî dema ku wî baskê çûk girt û ew ket destê wî ji berika xwe derxist û avêta çûk û kevir li batikê çûk xist. Di wê demê de çûk ket ardê û bû weke keçikek pîrr zêde xweşik û delal û sipahî.

Keçelok ji wê pîrr zêde acêbmayê ma. ew hat ber serê keçikê û ma sekinî û ew rakir ser xwe da rûnand. Piştî wê keçikê bi kenekê ku ew bi wê dilê mirov xweş dikê li keçelok nerî û destê wî girt û ji wî re got ku te ez xilaskirim. Di wê demê de keçelok dît ku wa li ber wan qasrek zêde xweşik û mazin û dawîya wê ya bi mazinatiya ne hat kifşkirin hat dît. Di wê demê de keçelok ji wan pîrr zêde acêbmayî ma.

Keçelok hingê ji keçikê pîrsî ku ma ev çi ya. Keçik got ku ez gîyane wê hilêra te ma. Divîya ku tu min du care xilasbikê. Carekê bi gîyanî û care din bi hiş û laşî. Te nûha ez bi gîyanî xilaskirim. Lê ev zêde nadomê. Divê ku tu dest û lingê xwe zû bigirê û karibê di demek zû de şartê hilêrê werênê li cih. Lê bila ev tenê di aqilê te de bû wê ji ti kesekê re bi nav neke heta ku tu bi gihijê serê çîyayê qafê û tu avê zimrutê hilde û bibê ji wê re. Wê hingê wê hemû tişt wê rastîya xwe wê bibînê. Piştî ku keçikê got ku hemû tişt wê rastîya xwe bibînê û pê de ma sekinê û di cih de keçelok xwe li ber hasp û barê haspê xwe di nava kerwanaê xwe de dît.

Keçelok di wê demê de wê dema ku wê xwe li wir dît ew weke ku ew jinûka ji xewekê rabûyî bê çavên wî bi xawar bûn û weke nîvgirtîbûn. Lê keçelok di wê demê de wî xwe di wê demê de di cih de ku wî di nava mirovan dît wî, nazanî ku wê çi bikê. Di wê demê de wî, bi carekê xwe li deverêkê din dîtibû. Wî destê xwe da laşê xwe, singa, piştî xwe, serê xwe, herdû aliyên rûyê xwe, serê bêhvila xwe, hinarîkên rûyê xwe, paq û ranê xwe û hwd. Demekê wî weke ku çimçimad. Wê dema ku wî xwe çimçimand wî fahmkir ku wî eş hîskir. Wî di wê demê de weke ku ew

fahmbikê ku ew di xewê de ya û ankû ne di xewê de ya ew wê fahmbikê wî xwe çimçimand.

Piştî wê, di demekê de keçelok weke ku ew li xwe hat. Lê ew hê jî di serê xwe de weke ku ew ne li xwe bû. Di wê demê de keçelok hê jî bi çavên weke lêpîrsîner û weke awirên dizek li dora xwe dinerî. Keçelok carna di xwest ku ew bi mirovên li dora xwe re çav bi çav were ku ew çavên wan wê çî ji wî re bibêjin. Wê çavên wan wî ji wî re wê bibêjin ku ew di wê demê de ew di rewşek weke ya ne li xwe û ankû awarte de ya û ankû na. Wusa keçelok li wan nerî. Di xwest ku ew ji awirên wan fahmbikê ku tiştê ne asayî heya û ankû nîn a. Keçelok di wê demê de wî, hingê di wê çerçoveyê de xwest ku ew wê fahmbikê.

Di wê demê de ew bi çendeka ji wan re çav bi çav hat. Ji xwe ew weke ne li wê dûnyê bin ji xwe çûbûn. Hineka ji wan ji xwe weke ku vexwartibû. Wusa ji çavên wan dihat fahmkirin. Lê keçelok di wê demê de wê ji wê ti tiştê din weke ku wî fahmnekir.

Keçelok di wê demê de ew hinekê din ma û di wê demê de hinekê din weke ku ew hat li xwe. Di wê demê de wî, carin li nava çavên mirovên li dora xwe nerî û bi wan re hat çav bi çav. Demekê weke ku wê, ji wê awirên wî yên lêpîrsîner wê tiştê wê ji aliyê yekê ji wan kerwanê wan ve wê were kifşkirin. Wê demê wî ji keçelok pîrsî ku "keko tu çima di wê rewşa bi awirê yê lêpîrsîner de li me dinerê. Çî bû. Weke ku tu dixwezê tiştê bi pîrsê û tu napîrsê. Dêka ku tiştê ku tu wê bi pîrsê ew hebê wê, ji me re bibêjê. Em jî bersiva te bidin. Di wê demê de wî ew ji wî re got û ma sekinî. Keçelok di wê demê de tenê bi gotina xwe ya ku ew ji devê wî derket û got ku" ka bira ti tişt nîn a." û ma sekinî. Lê keçelok hinki acêb tevdigeriya. Ew ji tevger, awir û gavavêtinên wî dihat fahmkirin.

Piştî wê, mirovên ên bi wî re axift jî ew zêde ne bû israrker. Di wê demê de wî, xwe berda. Û lingên xwe dirêjî pêş kirin û bêhna xwe veda. Keçelok jî wê demê hinekê xwe ji wî dûr kir û ma sekinî. Di wê demê de ew jî çû û li cem malê xwe sekinî. Di wê demê de wî bi tememî nizanibû ku ew çî di çûwalên wî de hebûna. Lê xwedî ji wî re çendî gotibû jî lê ew tenê bi gotina wî û ya ku wî ji wî re gotibû bi sînor dizanî.

Keçelok di wê demê de ew hinekê din ma sekinî û piştî wê di wê demê de ew piştî xwe da çûwalekê xweû destê xwe danî ser yê din û lingên xwe dirêj kirin û bi dest hizirkirinê kir. Di wê demê de dem bi dem jî wê awirên wî bi azmana wê bi kevin û li xoşa wî diçû ku ew li azmana di bin wê hewa hînik de rûnihê binerê. Keçelok di wê demê de wê, dema ku wî

xwe bi wê rengê wî hinekê berda wê di wê demê de wê tiştên din wê werina bîra wî. Di wê demê de wê tiştên ku wî di bîrê de jînkirina û piştî wê hatina serê wî, di wê demê de wê, weke xewnê û xiyalê wê werina hişê wî. Hinek tişt ji wan jî wî weke ku di wan dernedixist ku ew ka ew weke xiyal in û ankû bi rastî ew bûna û ew hatina li serê wî. Di wê demê de lê keçelok di wê temenê de ew hinekê bi wê re li wê hizirî. Gotinên wê keçika xweşik ku wê dema ku wî kevirê sor avêta serê wê û ew bi keçik û ji wî re serifendin ew di hişê wî de bûn. Wî di xwest ku ew wan fahmbikê bê. Wî ne dikarî ew ji kesekê din ê dora xwe jî wê bibêjê. Ber ku wê bi xwe ji wî re gotibû ku ew pêwîsta ji kesekê din re nebêjê. Di wê demê de keçelok hinekê li ser wan hizirî û ev hêst jî di wî de rû da ku ew weke wan bikê û wan hilde esasê û ji kesekê re nebêjê û ankû ew ne hilde li cidiyetê û ew herê bi kesekê din re bi axifê û wan werênê ser ziman.

Lê dîsa wê hîsa wî ya şeşem wî ji wî re wê bigota ku ew xwe bigirê û ew wê ji kesekê din re wê nebêjê. Wî li hîsa xwe ya şeşem hisand. Wê di wê demê de wê, demê wî gotinên xwe got di serê xwe de birin û hanîn. Wê demê de di serê wî de wê gelek tiştên ku wî fahmnekirina û weke ku wî pêwîst dît ku ew fahmbikê hebûn. Di wê demê de ne hatibû aqilê keçelok ku ew kumê aqilê dênê ser serê xwe. Wî di wê demê de ew çawa care pêşî bi wan mirovên nava kerwanê rew hatibû cem hev wusa rewşa xwe domandin bû. Heta wê demê de jî ti kesên ku ew weke Ali cengiz bi şibênê û bêjê ew a jî derneketibûbûna li pêşîya wî. Di wê temenê de wî hinekê jî weke ku wî xwe di ewlehiyekê de didît û di awayekê de dixwest ku ew wê, bijî. Lê keçelok di wê demê de wî tiştê din jî dizanî. Ew jî ew bû ku Ali cengiz gelek fêhlên wî hebûn û dikarî bi carekê ew xwe li hemberî wî bide dîyarkirin. Wê demê wê çî kiriba. Ew wê demê ew hinekê li wê hizirî. Di wê demê de wê, çî kiriba ti tişt di derrbarê wê de di serê wî de nebû. Lê wî di xwest ku ew ji aliyekê ve jî ew bergira xwe bigirê û xwe bi parêzê.

Di nava kerwanê de ew jî weke wan li cem malê xwe sekinî û weke ku ew li rehetiya xwe dinerê xwe hinekê bi şewayê paldanê piştî da malê xwe û lingên xwe dirêjkirin û ma sekinê. Di xwe de li ser gotinên keçika ji bûyî dema ku wî kevirê sor li serê çûk da ew di hişê wî de bûn ew li wan dihizirê.

Keçelok di wê demê de ew, weke ku ew di nava bahrekê de xwe winda bikê wî xwe di nava hizir, xiyal û bîrhanînan de windakir. Ew di wê demê de weke ku ew ne li wir bê wûsa lê hatibû. Ew bi laşê xwe li wir bû lê ew bi hiş û ramanê xwe ew weke ku ew di wê demê de ew ne li wir bû.

Di wê demê de wê weke ku ew li gelek tiştan wê bi hev re wê bihizirê wê di rewşekê de bê.

Keçelok wê, di wê demê de wê pîrr zêde wê li ser gotinên wê keçika rûdayî wê bi hizirê. Ew çibûn û çawa bûn. Keçikê ji wî re gotibû ku tu êdî nêz dibê. Di wê demê de wî jî ew di xwe de hîs dikir. Lê heta ku ew hatîbû wê nûqtayê de di gelek badirayan de derbas bûbû. Wê demê keçelok wê, di wê nûqtayê de wî, êdî wê, ji wir wê heta ber nêzî çiyayê qafê wê di rengekê de wê, çûba. Di demê de wê di nava wê kerwanê de wê çûba. Çendî ku wê fen hanîbûna serê keçelok ji hinek kesên nava kerwanê jî lê wî xwe di nava wê de weke ku wî zêdetirî ji bi tenêbûnê zêdetirî xwe di awayekê ewle de hîs dikir. Ev jî wê weke ya ku ew li wê dihizirî û di wê demê de wî, sedema wê ba ku wî xwe bi wê li wê girtibû bû. Keçelok di wê demê de ew wê êdî çî wê derkeve pêşîya wî û wê di çî dever û tiştan de wê derbas bibê ew li wê dihizirê. Di wê demê de ew di gelek tiştan derbas bûbû. Lê wî di serê xwe de di bir û dihanî ku ew nêz bûbê wê demê zêde tişt dibîyabû ku ew newina serê wî. Ew hinekê li wê hizirî û wî di wê rengê de wî ew di serê xwe de ew derbas kir. Keçelok piştî wê ew hinekê li demên piştî wê ku ew gihişt armanca xwe wê çî bibê wî dixwest ku ew pêş bibîne. Ew hinekê li wê dihizirî. Ber çî heta wê deverê ew hatibû û wê hêsta ku ew wî hanîbû ew li wê dihizirî. Wî ew di serê xwe de di bir û dihan di wê demê de. Lê hinekê jî di wê demê de wî, di serê xwe de wî, dewama rêwîtiya xwe ew li wê hizirî. Wê ji wê û pê de wê çî derketiba li pêşîya wî. Ew di wê demê de ew di awayekê e li hesanê piştê paldayî û lingên xwe dirêj kirî li wê dihizirê. Mejiyî ew di bir deverên dûr û tiştên ku ew ne hatina aqilan wê werênê hişê wî. Heta wê demê ew gelek tişt jîyankiribû.

Di wê demê de keçelok û kerwanê wî demek dirêj wê di wê rengê de wê demek xwerehetbûnê wê derbasbikin. Wê xwe rehet bikin. Wê piştî ku ew demek dirêj ew derbas kirin û wê dema xwe li wir dirêj derbas bikin û piştî ku rohni li wan veda û êdî wê pêşî wê gezek nan wê bixin û wê piştî wê bavên xwe li haspên xwe wê bikin û wê bikevina rê de. Di wê demê de ew dema ku ew kevina rê de wê, demê keçelok dihizirê û mereq dikê ku wê rêya wan wê bi kû bikeve. Di wê demê de w ew pîrr zêde ew mereq dikir.

Ew hinekê din hat in û piştî wê serkerwan wê di wê demê de wê derkeve pêşîya kerwanê û wê ji wan re wê bibêjê ku ew wê di ber çiyayê dêw ve herin.

Wê dema ku wê navê dêw wê di gotinê de wê derbas bibê wê dilê keçelok wê di awayekê de wê, bikê kutekut. Wî di wê demê de ew li wê hizirî û di wê demê de ew li wê li wê hizirî ku ka ew çiya kijan çiya ya. Ew di wê demê de wê demê ku ew hinekê çûn wê keçelok xwe firsendekê wê bibînê û wê, xwe bigihênê nêzî serkerwanvan. Wê di wê demê de ku ew hat dehma wî êdî keçelok pêşî silev dayê û piştî wê ew li wê bi wê re bidest axiftinê dikê û ji wî dipirsê ku ew çiyayê dêw çi ya û çima ji wî çiyayê re wê, bê gotin 'çiyayê dêw'. Hingê di wê demê de wê serkerwanvan wê di wê dem de wê ji wî re wê meleseyê wê bibêjê û wê bibêjê ku ew çiya li wî dêwek dijî û hemû herêm wê ji wî bê pirsîn. Lê ti kesek nikarê xwe nêzî wê bikê. Tenê kesek wê karibê xwe nêzî wî çiyayî bikê ew jî wê piçkanê cil-mêrî wê karibî nêz bibê. Keçelok di wê demê de wî ti tişt ji wan gotinên serkerwanvan fahm nekir. Wî di wê demê de wî ji wî xwest ku ew hinekê din ji wî re wî vebêjê.

Di wê demê de ew hem dimeşîn û hem jî ji wî re dihanî ser ziman. Serkerwanvan got ku were nêzî min û xwe li nêzî min bigira û guhê xwe bide min ezê ji serî heya binî ji ser bibêjim. Lê bila guhê te li min bê-Serkerwan wê weke kesekê pîr û di rewşa xwe de sekinî bê. Wî zêde xwe tevli ti kesekê ne dikir û her tiştê biqanci dikir ku ew bikê.

Wê dema ku keçelok ji wî xwest ku ew bibêjêwî jî êdî mijarê di wê demê de bidest hanîna ser ziman dikê ji wî re.

...o0o...

Li vê dîyarê gelek kesên xwedil dil û kesên bi jan jî hena. Carna ku wê kesên ku ew wê dijîn wê di dilê xwe de wê bijîn. Carna jî wê kes wê ji dilê xwe wê bi wê re wê bijîn. Lê hemû kes wê weke ya dilê xwe de wê dijî.

Gûndekê dikeve kuntara çiyayê dêw de wê hebê û wê, ji wê re wê bê gotin gundê çilmêran. Ev nav jî wê, ji wê were girtin. Di wê gunê de wê jinek û mêrek wê hebê û wê dilê wan zêde wê ji hev re wê hebê. Wê hertimî wê, bi hev re wê karên xwe bikin. Hemû tiştê wan hebû û rewşa wan zêde xweş bû. Lê ew herdû bûn. Ti kesekê wan zêde li dora wan nebê.

Ahlê jinê ku weke bi navê "rindê" wê were bi nav kirin wê her yekê ku wê bi malî wê di wan de wê şeş, hinek jî deh zarok wê hebin. Bi heman rengê wê di malê kesên aliyê mêr ku wê bi navê "menda" bû wê, bi heman rengê wê zarokên wan wê hebin.

Lê ew hev ciwan wê di dema xwe ya ciwaniyê de wê bi hev re wê bi zewicin û wê ti zaroyên wann çenebin. Wê li gelek deveran wê serî bixin ku ew kesên ku ew ji wê fahmbikin ew dermanekê bide wan.

Wan di xwest ku ew hertimî zaroyek wan çê bibê. Wê her tiştê wê bikin û wê ji xwûdayê xw er ewê berg wê bikin.

Ji tafîqên xwûdê rojekê wê, jina mêr wê bi haml wê bimênê û wê dilê wan wê pirr xweş bibê. Herkesekê digot ku ew mirov êdî wê bina xwedi zaro û wê male wan wê bi deng bibê. Dewlemend jî bin. hemû tiştên wan hebû. Rewş û halê wan zêde xweş bû. Lê li gotî wan tenê zarok ji wan kêmbû û wê ew jî wê ji wan re wê çê bûba. Êdî wan ti tişt ji xwûdayê xwe ne dixwestin.

Roj li her hev dibin û diçin. Dilxweşî û geşîya wan jî bi heman rengê pêşdikeve û mazin dibê. Ew jî wê, di wê demê de wê bina xwedî zaro. Wê di wê demê de wê zaroyên wan wê bibin. Ji wê jî wê pirr zêde wê xweş û dilxweş bibin.

Dem dema ku ew dihê ku wê zaroya wan wê çê bibê. Wê di wê demê de wê, ne tenê zaroyek wê gelek zarok wê ji wan re wê çê bibin. Di wê demê de wê, bi carekê wê çil zarok wê ji wan re wê bibin. Heta wê demê ti kesekê wusa nebûbû xwediyê zaroyê. Herkesekê ji wê gotin bi lêv kirin û acêbmayîna xwe hanîna ser ziman.

Ev gotinên ku wê, werina gûhê dêwê çîyê jî. Di wê demê de wê, ew wê, xwe bikê şeklê mirovekê de û wê were nava gund weke di rengê faqirekê ku ew ji xwe re digerihe de.

Wê demê ew dihê ber devê deriyê wê male bi çil zaro û afsûnek xirabiyê dikê. Wê çawa wê dê ji zaroyên xwe wê aciz wê bibê wê afsûna wê bikê. Û wê herê.

Piştî wê ew jî ji wir diçê. Wê demê wê, rojekê li ser wê dayika çil zaroyî wê gazina xwe wê werênê ser ziman û wê bibêjê ku min yek zaroyek ji xwûdayê xwe xwestibû lê ji min re çil çêbû. Em nikarin li wan meyizênin û wê rajê melkesê wê wan bi ber devê dêrê vê wê bi wê bide malistin. Yan jî wê weke ku wê hinek wê bibêjin wê bide derxistin li devê dêrî. Li gorî hinekan jî wê bibêjin ku wê bixwezin ku ew zaroyê wan dênê pêşîya devê dêrî ku ew bêhnê bi bistênin. Lê çî zaroya ku ew bi wê rengê dikê û derdixê wê êdî ew wê nabîne. Hemû wê ji berçav wê winda bibin. Her zaroya ku wê wusa bibê wê, winda bibê. Sihûneh zaroyên wê bi wê rengê ji berçav windabûn û ti keseke ne dizanî ku ew zaro çûna kûderê.

De ne dihat gotin ku wê dema ku ew zaro bûn wê hê kêlîka ku ew ji dayika xwe wê bibin wê bi dest axixftinê wê bikin û wê bi dest meşîne

wê bikin û wê bi wê rengê wê êdî wê dengê xwe wê bikin. Ew jî wê weke acêbmayinekê wê bibê.

Piştî wê ya ku wê bimênê wê tenê wê zaroyekê wê bimênê di destê jinikê de. Ew jî wê wê êdî wê hemû evindarîya xwe wê bide wê zaroyê. Di wê demê de wê, li gorî hinek gotinna jî wê, dema ku wê, dayikê zaroyên xwe wê bi dayikê melkê wê derxê derve wê yê dawî wê xwe bi wê darê wê zant bikê û wê neberdê. Ew bi wê rengê maya li malê. Wê demê jinikê hizirkiriya ku wê hemû zaroyên xwe windakirina. Lê wê dema ku ew dibêjî ku nûha tenê zaroyek min li cem min ba û nanê bavê xwe biriba nav ard wê, ji min re wê hesan ba. Ew jî wê di wê demê de wê, dema ku wê zaroyên xwe derxistibûna devê dêrî wê zankiribû ku wê hemû windakirina. Lê ew mabû. Hemû zaro jî wê pîrr bi huner û lez bin.

Wê dema ku ew wusa dibêjê wê, zankiribû ku wê hemû zaroyên xwe windakirina. Lê di wê demê de ew mabû wê dema ku ew dengê dayika xwe dikê wê bibêjê ez li wir im û ezê nanê bavê xwe bibim.

Ew jî hingê piçûk bû wê dayika wî navê **Piçkan** wê lê bikê. Wê demê wê di wê demê de wê, ew wê di wê demê de wê, êdî wê weke kûrê malê ê bi tenê wê bimênê.

Di wê demê de wê dayika wî xwarinê wê çêbikê û wê, dênê ser piştê kerê ku ew bibê nava ard ji bavê xwe re. Wê demê ew xwarinê dibê ku ew jî xwe di bin kurtanê kerê de ew hingê piçûk bû wê karibê veşêrê. Ji ber wê hingê piçûkbûna wî jî wê ji wî re wê di nava xalkê de wê piştê wê bê gotin 'bûcûr' jî. **De ne**, tu dizanê ku wê biçûr wê, ew zindiyên piçûk ên weke gulahan ên pîrr piçûk ku ew dikarin xwe di her rewşê de **bi** tevger bikin bin. Di wê demê de ew wê xwedî xoslet û hûner jî bê. Wê bi hêz, zaxm û zane jî bê. Di wê demê de wê, dema ku ew kerê xwe diajoyê wê di wê demê de wê pêşî wê rastî du kesên beyênî di rê de wê were û wê ew wê, demê ku ew wan dibîne wê bi diltirs bibê ku ew wê zirarê ji wî bikin û wê xwe di bin kurtanê kerê de wê veşêrê. Di wê demê de wê, piştî wê, ev herdû beyênî ku ew kerê dibînin weke kerek bi tenê û xwediye wê nedîyar a ew dibînin. Wê demê ew bêhna xwarinê dikin û ew dihên û li piştê kerê dinerin xwarinê dibînin ew xwarina wê dikin ku ew bixwûn. Piştî wê piçkan wê bakê wan û wê bêjê ew xwarina bavê min a wê nexwûn. Ew herdû mirov wê nizanibin ku ew deng ji kû dihê. Wê bi tirs bibin û wê di cih de wê, bibêjin ev ker nebaş a û ji wir wê dîrkevin. Wê dema ku ew dîr dikevin ew wusa zane dikin ku ew deng ji kerê derketiya wê bi hizirin û wê bibêjin ev ker ne kerek baş em cih de ji wê dîrkevin.

Wê demê ku ew durketin w piçkan wê xwe bide dîyarkirin. Wê demê wê li piştta kerê wê bide domandin. Ku ew hinekê din dihê wê, demê wê, wê rastî du haramiyan wê werê. Di wê demê ew piçkan di tirsihê û wê, xwe di keviya kurtan de wê, cardin wê veşêrê. Ew jî haramî jî wê dema ku ew kerê bi tenê dibînin wê weke bê xwedî êdî ew dixwezî ku ew herê û tiştên li ser wê hildin û ankû ku ew hebê xwarina li ser wê bixwûn.

Di wê demê de wê piçkan wê li wan jî wê babikê û wê bibêjê wan ku ew ji xwarina bavê min dîrkevin. Wê dema ku wê haramî wê deng bikin wê nizanibin ku ew deng ji kûve dihê. Wê demê wê hinekê bi tirs bibin û wê bihizirin ku ew acinî û ankû pîrabok in. Wê demê wê bi lez wê ji wir wê dîrkevin. Ji wan jî wê piçkan wê xilas bibê. Piştî wê bi kerê xwe re wê cardin wê rêya xwe bigirê ku ew were cem bavê xwe. Ew demekê dihê û digihijê keviya ard ku bavê wî gêsî dikê. Di wê demê de wê, bakê bavê xwe 'yabo were min xwarina te hanîya." Lê di wê demê de wê bavê wî tenê wê dengê wê bikê û wê ti kesekê wê nebîne. Wê dema ku ew li dûv deng û devera ku ew deng ji wê dihê ew tenê kera wan dibîne. Ew dibêjê ku ev kere ma bi tenê hatîya. Ti kesekê din li dorê nabîne. Xanima xwe jî ew li dorê nabîne. Lê ew dema ku ew cardin den piçkan dikê ew di wê demê de wê, hingê ew wî bibîne û wê, di wê demê de wê, êdî wî dilê wî rehet bibê ku ew deng ji kû dihê.

Piştî wê ew di rûnihê û bêhna xwe di vedê. Di wê navberê de jî xwarina xwe dixwê. Piştî wê piçkan dema ku ew bavê wî rûniştîya ew di wê demê de dibêjê bavê xwe ez bidest gêsî kirina ardê bikim. Bavê dibêjîyê kûrê tu gelekî piçûk î. Ma têtê çawa wê bikê.. Lê li ser israra wî ew dibêjê bila û piçkan di wê demê de ew ew bi dest gêsî kirinê dikê. Di demekê kort de ew di wê demê de wê, hema bêja wê hemû ardê wê xilas bikê. Bavê wî jî wê pîr zêde acêbmayî dimênê.

Lê jî wê dilxweş dibêjê. Du gayên wan hebûn ku wî bi wan gêsî dikir. Di wê demê de wê dema ku ew bavê wî dilxweşîya xwe dihênê ser ziman wê, ga jî wê nexweş bibin û wê aciz bibin. Wê ga jî wê bi piçkan de wê rîx bikin û wê wî di bin rîxa xwe de wê bihêlin. Di wê demê de wê, ew wê bakê bavê xwe ku ew were û wî ji nava rîxê derxê û wî paqij bikê. Lê bavê wî ew wî nabîne ku ew li kûya. Li hemû deverên ardê dinerê û wî nabîne.. Piştê ew dibîne ku ew di nava rîxa gayan de windabûya. Wê dema ku ew di ber tapika rîxê re derbas dibê û lingê wî dikeve ser de ew pêl kûrê xwe dikê û hingê ji qêrîna wî ew dibîne ku ew di navê de ya.

Di wê demê de wê, wê bavê ew wî derxê û wê bibê ber keviya çem û wî di nava avê de wî baş bişoyê û wê piştê wê werênê.

Piştire wê, bavê wî ji wî re bibêjî ku kûrê min tu piçûkî ti bucur î, ber vê yekê hinekê ji wê bucuriya xwe mazin bibe êdî tu karibê wê karê bikê. Lê ev gotin wê hinekê wê dilê piçkan wê weke ku wê bişikênin. Di wê demê de ew wê li xwe nadênê ardê. Û ew dixwezê ku ew wê bi birhan bikê ku ew çendî bi hêz û zaxm a.

Ew hingê piçûka û tişt ji destê dihên wê di nava gund de jî wê navê wî derkeve û wê hebê û nebê wê êdî wî navê piçkan wê were ser ziman. Ev wê li xoşa dayika wî û bavê wî jî wê herê. Ew bûna xwediyê kûrekê bi nav û deng.

Lê di nava gund de wê xort û gelek kesên din ku wê ji wê zêde derketina li pêş a wî nexweş wê bibin wê hebin. Ber vê yekê ew jî dikin ku ew tiştê werênina li serê wî. Di wê demê de ew li wê dihizirin ku ew tiştê bînina serê wî. Di dawîya dawî de wê di serê xwe de wê, bigihijina wê qinyatê ku ew wî bi çênina çîyayê dêw û wî li wir bi destê dêw bidina kuştin. Dêw jî mazin bû, gir bû û pirr zêde weke hûtekê bû. Di wê demê de wê, rojekê wê xort û mêrên gund wê li hev bi civin û wê piçkan wê di nava wan de bê. Wê di wê demê de wê ji mêrênîyê û mêrbûnê wê biaxifin û wê hizrên xwe wê werênina ser ziman.

Di wê demê de wê piçkan jî wê derkeve li pêş û wê xwe weke mêrekê bi zaxm û xort û bi hêz wê bide nîşandin. Wê demê gundî ji wî re dibêjin heka tu wusa bi mêr û bi hêz û xortî hera çîyayê dêw û merşa wî ya difirê ji bin wî hilda û wê werênê. De ne, her kesekê navê dêwê çîyê bihîstibû û ku heta wê demê kî çûya wir ne vegeriya ya.

Di wê demê de wê, piçkan wê bibêjê ezê hinekê li wê bihizirim. Ew jî wê di wê demê de wê, demekê piştire ku ew dihizirê wê, piştire wê li wan wê vegeerê û wê, bibêjê ku ezê wê xwesteka we bikim. Ezê herima çîyayê dêw. Di wê demê de piçkan wê di wê rewşê de wê êdî wê amedekariya xwe wê bikê û wê, herê çîyaê dêw. Wê dema ku wê herê jî wê gelek derziyan ji malê wê bi xwe re wê bibê. Dayika wê dema ku ew derziyan di destê wî de dibê wê kêfa wê were û wê bibêjê kurê min mazin bûya û wê êdî wê tiştan wê ji dayika xwe re wê bi dirûyê. Piçkana wê di wê demê de wê amedekariya xwe wê were serê çîyayê dêw. Li wir wê qasra dêw wê mazin wê hebê. Lê ji dûr ve wê weke odayek bi tenê a piçûk wê li berçav wê biheta dîtin. Lê ku ew diket hundurê wê de wê weke qasrekê ku ew ne dawîya wê dihê dîtin û ne jî dikarê wê fahmbikê ku ew çendî mazin a.

Piçkan wê, di wê demê de wê were hundurê qasrê û ankû male dêw. Lê ew wê di wê demê de wê ne li mal bê. Piçkan wê demê dikê ku ew merşê

li pišta xwe bikê û ew herê. Lê wî hizirkir ku ew di rê de rastî dêw were wê rewşa wî nexweş bikê. Ber vê yekî wê xwest ku ew rêyek din wê bibînê. Wê hemû derxîyên ku wî hanîna di merşê re kirin û piştî wê çû pišta male dêw li pişt kevirekê xwe vêşart û ma. Di wê demê de ku ew dêw hat wê êdî wî di wê demê de ew li ser merşê rûnişt. Lê her ku ew dirûnişt wê, derzî di kuna wî ve wê herin. Wê demê dêw ji xwe re axift û got ku di wê merşê de hingê kêç bûna êdî ku ez li ser dirûnihim laşê min gez dikin. Ez wê dênima derve bila hinekê hawa bistênê û wê kêçên wê ji navê herin.

Wê demê ew wê rajê merşê û wê bibê û wê li devê dêrî wê derve wê dalaqênê. Wê di wê demê de ku ew çû hindûr û ket xewke kûr de wê piçkan jî wê were û merşê li pišta xwe wê bikê û wê di cih de wê ji wir dūrkeve.

Wê dema ku ew ji gund çûbû ti kesekê hêvî ne dikir ku ew wê bi şûn ve wê were û wê vegeirî. Di wê demê de ew di wê demê de wê, ku ew dihê dîtî ku ew vegeirîya wê herkesek wê ji wê hayirmayî û şaşmayî wê bimênê. Wê li nava çavên hev wê binerî û wê heyreta xwe wê ji hev re wê werênîna ser ziman.

Di wê demê de piçkan wê merşa difirê wê dênê nava wan û wê di wê demê de wê ji wan re wê bibêjê ku wê ev xwestibû. Va ya min ji we re hanî. Piştî wê ew hê mazintir hat naskirin û di wê demê de ew navê wî derket û li ser wê li wê çîwarê û hewirdorê jî ew êdî navê wî hat bihîstin.

Piçkan wê dema ku ew bû wê êdî wê zêdetirî wê heyana wê bikişênê li ser xwe. Yê ku ew xef û fena dixwezî werênîna serê wî dîsa wê li hev wê bicivin û wê, di wê demê de wê hanîna merşa difirê wê piçûk bibînin û wê wusa wê werênîna ser ziman û wê bibêjin ”me dikarî wê werênê. Heka piçkan wusa mêr û xort û zaxma bila herê haspê dêw ê ku ew di firê wê werênê.” Wê demê wê ew baki piçkan wê bikin û wê ji wî re wê bi wê rengê wê hizrên xwe wê werênîna ser ziman. Piçkan wê di wê demê de wê dema ku ew dihê hemberî wan wê ew wê ji wî re wê bibêjin ku ”me jî dikarî merşa dêw a di firê wê bihanîya, heka tu wusa mêr û bi zaxmî û agidekî here haspê dêw ê difirê wê werêna. Wê demê piçkan hinekê li wê xwesta wan hizirî û di wê demê de wî, gota wan ezê hinekê li wê bihizirim. Piştî wê ew hinekê hizirî û li wan vegeirîya gota wan bila ezê nûha herim û ji we re haspê dêw ê difêr wê werênim. Wê demê piçkan berî ku ew bikeve rê de wê, gelek darikên dirêj ên sertûj wê çêbikê. Wê piştî wê wan bide pišta xwe wê bikeve rê de. Di rê de ew dihê deverekê ku ew wê di wê demê de wê, dêw û haspê wî li wir hinekê

ji wan wir sekinî na û li ber siha darekê xwe dirêjkirin. Ew dibêjê ev êdî ji min re firsend a û ew di cih de diçê gova hasp û li hêtên wê wan darikên sertûr li hêt diçêkênê. Piştî ku wî darikên sertûj li hûndûrê çikandin wê di wê demê de wê derkeve û wê herê li derve wê, li bin kevirê wê xwe vêşarê dakû dêw wî nebînê Piştî ku wê ro çû ava û bû êvar wê dêw û haspê xwe yê difirê wê werin. Ew haspê xwe dikê gova wê de ew û diçê li cihê xwe ku ew razihê. Di wê demê de wê, dema ku ew dêw di xewê ve diçê wê, hasp jî wê çendî ku ew xwe di labitênê wê wê laşê wê li wan darikên sertûj wê bikeve û wê bikê hirahir. Di wê demê de wê nehêlê ku dêw jî razihê. Wê demê dêw ê bibêjê ku ew heywan jî di hundûrê de ji ber germê aciza ez herim û wê berdima derve û bila hinekê li derve bimênê di bin hewayaya hînik de ku ew jî karibê razihê. Di wê demê de wê dê wê were û wê hilde û wê berde derve. Di wê demê de ku dêw, hasp berda wê piştre wê herê hundur û wê li hundur wê bikeve xewa xwe ya şêrîn de. Piştre wê piçkna wê rajê hewsarê hasp û wê di wê demê de wê li lê sûwar bibê û wê werênê gund. Di dema ku ew lê sûwar dibê de wê çendî ku wê wê hasû wê hinekê nexweşîyan wê bikê û wê, bikê ku wî ser xwe biavêjê jî lê wê piştre wê bialimê wî. Piştî wê, êdî wê di wê demê de wê, ew wê weke ku wî herê bikê. Piçkan jî wê di wê demê de wê, destê xwe wê li ser gûleyên pişta sûkra hasp re wê werênê ku ew pirr li xoşa hasp diçû.

Di wê demê de ku ew hat gund wê herkesek wê bi çavên heyirmayî û şaşmayî wê cardin wê li lê wê binerin. Wê heyreta xwe wê werênina ser ziman. Mazinên gund ku wê xwe mazin bibînin û wê ti kesekê wê ser xwe re wê mazin nebînin wê bibêjin 'dê êdî li vî bucurî binerin. Em çawa mê bi wî karibin' û wê herina bi ser wî de. Di wê demê de wan hizirkir ku ew du şerên ku wê heta wê demê ku wê ti kesekê nikariba werênê li cih wî hanîna li cih. Piştî wê şartê duyem wê êdî wê nav û dengê piçkan wê ji dûr herêmê jî wê derbas bibê û wê were bihîstin. Wê êdî ew weke kesekê ku wê bi mêreniya xwe wê were nasîn û wê bi şahrazabûna wî wê wasfê wî hertimî wê were kirin.

Hinekê din dem têve çû û ahlên gund kiribûna serê xwe de ku ew bi temenî ji wî xilas bibin. Di wê demê de wan, xwest ku ew şartekê din bibin û bidina pêşîya wî. Lê wê çî dîtiban. Li wê hizirin. Hinekê dem têve çû êdî wan cardin bakira piçkan û gotinê de ku me jî dikarî em mersa difirê û haspê difirê ê dêw hilda ba. Heta tu wusa bi xwe bawer î û mêr dê êdî hera û dêw bi xwe bigira û werêna. Ew li wê hizirî bin ku piştî

herdû kirinên din ên piçkana li hemberî dêw ew li lê pirr zêde bi hêrs bûya û ew wî li kûderê bibînê wê ew wî bikujê.

Wê demê wê filitîna piçkan ji destê dêw wê nebê. Ew li wê dihizirin.

Piştî wê ew hinekê din ku piçkan hat wan ji wî re got ku tu mêr hera dêw bêna êdî em mazinatiya te herê bikin. Piçkan got ku ezê hinekê li wê bihizirim. Piştî wê, ew biryara xwe dide û dibêjê wan bila ezê çim dêw bênim. Lê ku min hanî ew çî ji we bikê û bêne serê we ew berpîrsîyariya we ya. Ez hingê tevli wê nabim. Ew jî dibêjin bila û êdî piçkan dikeve rê û diçê bi ber çîyayê dêw de. Di wê demê de ew di rê de dihizirê ku ew çî bikê û çî rêyê bibînê. Wê demê wî tiştek bi xwe re wê nebîribû. Tenê wî weke birekek ku ew bi wê daran dikarê bi bibê wî bi xwe re biribû. Wê demê ku ew har ber avekê li ber çîyayê dêwê diherikî ku ew hat wir êdî wî li wir hinekê bêhn veda. De ne, li wir li dora wê çîyayê dêwê wê daristanên pirr zêde gûrr wê hebin. Di wê demê de wê tiştek wê were aqilê piçkan. Wî ne bi aqilîya kariba dêw wê ne bi tiştekê din wê kariba dêw.

Di wê demê de ew rastarast li şûna ku ew were male dêw wê herê nava daristanê û wê bi birreka destê xwe wê bidest birîna daran wê bikê. De ne, di wê demê de ku meşek firî ba wê heya dêw ji wê bûba di nava daristanê de. Dema ku wê dengê bi birrekê birrîna daran wê were wî êdî ew li wê dihizirê ku ew hebê nebê ew dîsa piçkana hatiya tiştekê wî bibê. Di wê demê dew hat û rastarast li hemberî piçkan sekinî û dêw gotiyê de ha min tu girtî. Wê demê dêw ew kir kuncikê. Lê dêw rûdêna piçkan ne dîtîbû û ew nas nedikir. Wê demê piçkan gotiyê ”dêwê dêwê ma tu dizanê ez kim a.” Dêw dibêjê tu piçkanî me ne wilo” Piçkan dibêjê na ne ez im. Ez bi vê piçûkatiya xwe ezê çawa bima weke wî. Dêw lê dinerê ku ew bi rastî jî gelek piçûka û ew tiştên ku ew dihên gotin ku piçkan kirina ew yê piçûk wê nikaribê bikê. Ew bi wê rengê wê qinyata zwe dihênê û piştê dêw dibêjê temem min bawer kir ku tu ne piçkanî, dêka ji min re bêjê ku tu kî yî. Piçkan divêjê ku ez faqirekê piçûk ê gund im. Piçkan miriya û ez daran dibirrim ku ez ji wî re tabûtekê çê bikim.” Hungê dêw hêrsa li wî dihênê ser ziman û dibêjê ku ew nûha li hemberî min ba minê ew di bin lingê xwe de wî avçiqandiba. Wê demê dêw dibêjê piçkana tu gelekî piçûkî tu nikarê wan daran bi wê birrekek piçûk a di destê xwe de bibirre ezê ji ter bibirim û bêjim. Ew di wê demê de wê werênê û wê di wê demê de wê, ji wan daran wê weke malikeke piçûk wê bide çêkirin. Wê demê piçkan wê dema ku ew wê çêdikê wê wê demê ew dêw ji wî dipirsê ev çiqasî divê ku ew mazin bê. Piçkan dibêjê ku hema bila biqasî

mazinatiya te bê. Piştî wê dêw ali wî dikê û di mazintiya xwe de wê, ew wê çêbikê. Wê piştî ku ew wê tam bi zaxm çêkir wê piştire wê, piçkan wê ji dêw re wê bibêjê ku divê tenê qulek ku ew ji wê rojê hilde ew nebê. Wê demê wê dêw wê bikeve hundurê û wê, hemû qulkên wê bide nîşandin û wê bide girtin. Lê dema ku ew dikê ku ew ji wê derkeve wê, piçkan wê derîyê wê li ser dêw wê bigirê û wê, di wê demê de wê ew wî di wir de wê bigirê.

Dêw hingê wê, ew dibêjê çima te ew kir. Dibêjê ji tirsê. Piştire jî dêw dibêjê ku ew tûkarê dêwê wê vekê. Lê piçkan dema ku ew dikê ku ew devê wê vekê wê weke ku ew ji destê wî bi filitê û wê malika ku wan çêkiriya ji daran ku dêw di wê de ya wê bi xindirê heta binê çîyê li keviya gund. Di wê demê de wê, herkesekê li gund wê bînerê û wê bi heybet wê bi nerê ku ka ew çîya bi ber gund ve xindirî. Wê demê wê dema ku ew dihên wir dibênin ku wa piçkan dêw di wê de girtiya û ew hanîya xwerê. Di wê demê de wê herkesekê wê di wê demê de wê, piştî wê, piçkan wê xwe li wê bide nasîn ku ew piçkan a û wî ber çî kiriya. Piştire dêw ji piçkan re dibêjê ku ew li wî ne bi hêrs a. Ew êdî li yên ku ew bi wî dana kirin bi hêrs a.

Di wê demê de wê, di wê demê de wê, piştî wê, dêw wê xwe bi rêyek dîtîne wê ji wê girtîne wê xilas bikê û wê tiştên xirab wê bîne serê wan kesên ku ew bi wî dana kirin. Piştî wê, dêw wê ji piçkan re wê bibêjê ku tu bi wê piçûkatiya xwe û ew tiştên mazin kirin. Ber vê yekê ez hemû tiştê xwe ji ter dihêlim ji wê diyarê diçim.

Di wê demê de wê êdî wê piçkan wê bê weke kesekê mazin û navdar ku ew êdî herkesek wî nas dikê. Wê hem bi qanciya xwe wê were nasîn û hem jî wê bi başîya xwe. Di wê demê de wê, êdî wê di wê demê de wê, herkesekê ku wê mihtacê tiştêkê bê wê hertimî wê herê deveê deriyê piçkan.

Lê mijar û meseleya piçkan wê li vir wê bi dawî nebê. Wê hê gelek tiştên wê werina serê wî û wê ji destê wî werin.

Piştî ku wê dêw ê ji holê wê winda bibê wê êdî w qasra wî ji piçkan re wê bimênê bi hemû tiştên di wê de. Wê demê de wê, piçkan wê bibê xwediyê hemû tiştê. Di wê demê de wê, piçkan wê marşa ku ew difirê wê bibê û wê dê û bavê xwe wê dênê ser û wê ew jî wê li haspê di firê wê sûwar bibê û wê bi hev re wê herina qasra dêw ku ew ji wî re maya. Wê piştire wê navê çîyayê dêw wê bibê çîyayê piçkan. Wê bi wê rengê wê êdî wê herkesek wê wê herêmê û wê çîyayê wê bi navê piçkan û mazinahiya wî nas bikê û wê werênê ser ziman.

Di wê demê de wê, tiştêkê din jî wê bibê. De ne wê, dema ku wê 39 birayên piçkan wê ew ji malê windabûbûn wê dêw wan hilde û wê her yekê wan bikê mezeleyê di qasrê de û wê wan di wir de wê bigirê. Di wê demê de wê dema ku wê, piçkan wê qasrê bi dest bixê wê êdî wê birayên wî jî wê serbest bibin û wê ew wê bibê birayê **sihûneh birayan**. Wê di wê demê de wê êdî ew wê pirr zêde wê, bi hêz û wê xort bibin. Wê di wê demê de wê navê wan wê derkeve û wê, di wê demê de wê, êdî wê ew wê, weke ku wê bixwezê ku ew were nasîn.

Lê piçkan di wê demê de wê, êdî ew wê bi birayên xwe wê mazin bibê û wê xortna mazin wê ji wan derkevin. Her yekê wê ji yê din agittir bê. Wê bi hev re wê bi hêztir bin. Di wê demê de wê, li wê herêmê wê ew bina xwedî serwerî û hêz.

Qasra wan wê mazin bê û wê serî û binê wê ne dîyar bê. Wê biqasî wê li ser rûyê ardê wê mazin bê wê wilqasî wê di bin ardê de jî wê rêyên ku wê li wê bigirin û wê herinê de wê bibin. Wê di wê demê de wê, êdî wê ji gelek deveran wê rêyên ku wê herina qasrê wê bibin. Em nûha bi kerwanî diçin û wê rêya me wê bi wir keve. Em li wir şeve xwe ya li pêşîya xwe derbas bikin. Di wê demê de wê piçkan wê navê wî bi qancî, başî û mêhwandarîya wî jî wê derkeve. Kî çûya ber deve deriyî wî ew wî destvala ne vegerandiya. Bi wê yekê û wê qanciyê wê di nava xalkê de jî wê were nasîn û wê navê wî derkeve.

Lê ez wê jî wê bibêjin ku piçkan wê di wê temenê de wê, êdî wê weke kesekê bi zane jî ji wî derkeve. Wê di nava hemû birayên xwe de wê ew weke yê serek û mazin û mîrê wan w navê wî derkeve û wê derkeve li pêş. De ne kesekê xwedî qasr yan mîr a û yan jî şah a. Herdû ji hev mazintirin di wî welatî de.

Di wê demê de wê dema ku serkerwanvan wê bidomênê wê bibêjê wê tiştêk wê were aqil wî. Di destpêka gotina xwe de w gotibû em bi ber çiyayê piçkanê ve diçin. Di wê demê de wê, demê ev navê çiyayê piçkanê ji wê dihê. Di wê demê de mazinahiya çiyayê piçkanê wê êdî wê di wê demê de wê ew wê fahmbikê ji nava gotinên serkerwanvan ku ew ji ku ew dihêt.

....000....

Keçelok û serkerwanvan wê li rex hev wê bimeşîn. Piştî ku serkerwanvan wê hinekê wê bêdeng bibê wê di wê demê de wê keçelok wê hizir bikê ku ew êdî gotinên weke ku ew nemabin wê li wî were.

Gotinên serkerwanvan wê, di wê demê de wê di serê wî de wê herin û wê werin. Ew wê li wan wê bihizirê.

Di wê demê de wê di serê keçelok de wê gelek pirs wê rûbidin ku wê, di wê demê de wê ew wê ew male bi **çilmêrî** wê çawa bê. Her yekê wê weke mîrekê wê di wê demê de wê di cihê xwe de wê, bihizirin. Di wê demê de ew hinekê din hat in û wê demê ku wan fahmkir ku heywanên wan geleki wastiyana wê, di wê demê de wê, bixwezê ku ew hinek navberê bidin û bêhna xwe wê bistênin. Di wê demê de wê ew wê dema ku ew wê rûnihin wê keçelok xwe li rex serkerwanvan wê bigirê. Di wê demê de wî ya rast ew bo xwe dît. Ber ku wî fahmkir ku ew hem weke mirovekê bi bandûr a û hem jî wê, weke kesekê bi zane ku ew dikarê gelek tiştan ji wî fêr bibê.

Di wê navberê de wê serkerwanvan wê di wê dema ku ew li rex wî bê wê ew yên din jî wê nikaribin xirabiyê bi wî bikin û ankû xirabiyê di derhaqê wî de lê bihizirin. Wê di cih de wê ew wê biheta fahmkirin ji aliyê wî ve wê ew wê bo wan wê ne baş bûba.

Di wê demê de wê keçelok wê ew wê jî wê bi wê rengê wê ji wî fahmbikê. Lê keçelok di wê demê de wê, gelek pirsên din di serê wî de wê, hebûban. Wê demê wê, çawa wê ji wir û pê de wê rêya xwe wê bida domandin. Ew hinekê jî li wê dihizirî û wî ew di serê xwe dibir û dihanî. Di wê demê de wê, di wê rengê de wê ew wê, li wê bihizirê.

Dem hinekê di wê ve çû wê, di wê demê de ku wan hinekê bêhna xwe veda û hineka ji wan avek jî li dordorê dît û hinek av li rûyê xwe kirin û di wê navberê de sewilên xwe yên av vexwartinê tiştî av jî kirin û pê de wê di wê demê de wê êdî wê di rêya xwe de wê bidina domandin. Wê di wê demê de wê êdî ew wê rengê de wê xwe bidina domandin di rêya xwe de.

Keçelok di wê demê de ew jî wê bi kerwanê xwe yê li rex xwe bê. Wê demê wî weke serkerwanvan tevdigerîya. Wê dem bi dem wê di rê de wê serkerwanvan wê bi xwe re wê bide axiftandin. Keçelok hêj axiftinê dikir û di wê demê de wê weke kesekê bi mereq bû. Wê di wê demê de wê keçelok wê di wê demê de wê çî pirs dihatina aqilê wî êdî wî li serkerwanvan dipirsî.

Lê çî pirsên xwe li serkerwanvan dikirin jî wê, bersiva xwe ji wî bigirê. Di wê demê de wê, di wê rengê de wê serkerwanvan wê weke kesekê bi zane wê di mejiyê keçelok de wê cih bigirê. Di wê demê de wê demê keçelok ku ew di serê wî de çêbû wê demê wê keçelok wê pirsek dawî ku wê ti têkiliya wê bi gotinên wî yê ku wî bêhnê berê ji keçelok re hanibûn

ser ziman wê nebê wê ji keçelok re wê bikê. Hingê keçelok wê bahsa zanetiye û kesê bi zane wê bikê. Di wê demê de wê keçelok wê, di wê demê de wê dema ku ew wê ji wî dikê wê mirovê serkerwanvan wê li ser gotinên keçelok wê bibêjê ”xwûdê başiya te bide te. Te ez jî kenandim. Heta wê demê zêde ti kesekê nekariya ku ew min bikenê. Tu dizanê zanibê ku zaneti çiya û kesê bi zane çawa na.” Hingê serkerwanvan gota keçelok mereqê neke ku ew jî wê weke min û te wê, mirov bin û wê xwediyê du çav, ling, dest, gûh û hwd bin. Ew jî wê mirov bin. Di wê demê de wê meleseyekê li ser kesên zane û ankû li ser kesekê bi zane wê were aqilê wî û wê ji keçelok re wê bibêjê. Hingê wê ji keçelok re wê bibêjê ku ew kesên bi zane wê weke kesên ku ew pêşiya xwe dibinim bin. Kesên weke gotina xwe dipîvîn û dibêjin. Wê dema ku w got ku ew gotina xwe dipîvîn û dibêjin wê demê keçelok got ku ew çawa gotina xwe dipîvîn. Li ser wê bi wî re wê axift û wî gotina xwe ji wî re wî hanî ser ziman. Hingê mirovê serkerwanvan di wê demê de wî bi bahsa vegotina xwe ya li ser kesên bi zane kir û wî di wê demê de bidest vegotinê kir.

” Keçeloko nûha li min bihisênê ka ezê çi ji ter bibêjim. Rojekê ciwanekê weke baş û bi dilpaqij hebû. Ew jî di wê demê de wê, hertimî wê di nava xalkê de wê bi dilsafiya xwe û paqijîya xwe wê were naskirin. Rojekê ew di nava civatê de wê bi bavê xwe re wê herê û were. Bavê wî ew bi xwe re dibir nava civatan ku ew ji tiştêkê ji wan deng bikê û bibihîzê û ew fêrî wê bibê.”

”Di wê demê de wê ciwanê me yê ku wê weke ji aliyê bavê xwe re wê bi navê ’bizan’ jî wê were bi navkirin wê di wê demê de ew rojekê wê di nava civata ku ew bi bavê xwe re diçiyê de wê ji wî re wê were ser ziman ku ew zanebûn çi ya û mirov çawa dibê bi zane û kesê bi zane ew çawa bê. Lê di nava wan de wê, bahsa zanînê ji bûyinê wê were kirin ku mirov wê bi carekê wê bibê xwediyê wê. Di wê demê de wê, yek ji wan wê bahsa zaneyê ku ew xwediyê afsûna wê ya û li ser çiyayê qafê ya wê bahsa wî were kirin. Ew jî wê di wê demê de wê pîrr zêde wê merek bikê û wê bixwezê ku ew bibê xwediyê zanînê.”

”Di wê demê de wê, ew wê di serê xwe de wê êdî wê weke ku wê ji bavê xwe re wê ezê bime zaneyek. Bavê wî hingê lê di beşisê û dibêjiyê de kurê min rêyek vekirî li pêşiya te heya. Demek dirêj li pêşiya te heya. Tu dikarê bibê û wê, di wê demê de wê, ew bi wê rengê wê ji jê re wê werênê ser ziman. Di wê demê de wê, gotinên bavê wî ên weke di wateya demek dirêj li pêşiya te heya û rêyek dirêj li pêşiya te heya wê ji bavê

xwe wê bipirsê ku ew çiya. Bavê wî di wê demê de pêşî bahsa rêya dirêj a bi zane dikê û dibêjê ku mirov di rêjeyekê diçê mirov gelek tiştan n dibînê. Ew ji mirov re dibîn zanina bi dîtina me. Di demê de mirov gelek tiştan dixwênê ew dibê zanîna bi xwandina me. Tiştêkê din jî heya ku em weke dema ku ew xwe bigihênina zaneyê li serê çîyayê qafê wê ew jî wê me bikê xwediyê zanînê.”

”Ev gotin wê çendî ku wê ciwanê me wê zêde wê ji wan fahm nekê jî lê wê di wê demê de wê serê xwe li ser wan zêde biwastênê û wê rojekê w xwe amede bikê wê di gelek dever û zewiyan de wê derbas bibê û wê herê û xwe bigihênê çîyayê qafê. Dib bêjin ku çîyayê qafê gelekî bilind û li ser qahfê wê wasra wî kesê bi zane lê heya. Wê demê ciwan dihê ber wê, û wê hin bi hin wê xwe bigihênê serê wê. Wê dema ku ew ghişt serê wê, di wê demê ew wê ji xwe re wê bibêjê ku ez ghiştin li serê wê. Piştî wê diçê ber deve deriyekê ku ew derdikeve li pêşîya wê, di wê de wê, kesekê zêde kal wê derkeve hemberî wî. Wê dema ku ew çav lê dikê wê yê kal wî ji wî re wê bibêjê ”tu hatî, ez li bendî te bûm.” Ciwan di wê demê de ew tiştêkê ji gotinên wî fahm nekê û ew dibêjiyê de me berî ku ez werin hinek din jî hatina vir û agahi dana de ku ezê werima vir.”

”Kese kal di wê demê de ew dikenê li lê û wî li cem xwe dide rûnandin û wê, bi wî re wê biaxifê û wî ji wî bipirsê ku ew bo çi hatiya. Ew jî dibêjê ku ez bo bibima kesekê bi zane ez hatima. Ew dîsa lê dikenê. Mirovê kal dibêje rêya ghiştina zanênê zirav û dirêj a. Bi carekê mirov nabê xwediyê zanebûnê. Lê ciwan israr dikê ku ew di cih de zanebûnê bikê serê wî de û ew bi tememî bibê xwediyê zanebûnê.”

”Mirovê kal lê dikenê û dibêjê ku emê biceribênin. Piştî wê ciwan ji mirovê kal dipirsê ku ew çawa dizanî ku ezê hatibama vir.. Hingê mirovê kal dibêjê ku ”ne tu dizanê ku serê çîyayê qafê bi afsûna û hemû tiştên wê di wê demê de wê, wisa bi wê afsûnê bin. Wê demê wê hemû tişt wê li ber dîtina kesên li wir bê. Wê demê ciwan pirr zêde wê bi hêvî bibê ku ew wê bigihê zanînê. Mirovê kal fahmdikê ku ev ciwanê dilsaf a û ew ji qanciya xwe diaxifê. Wê demê ew dibêjê ez tu fêran lê bikim. Mirovê kal wê di wê demê de wê, çûwalekê wê amede bikê û wê devê wê qanc wê girêbide û wê bide ciwan û wê bibêjiyê de heta ku tu herê malê tuyê wê nevekê. Du wê de zanebûn heya. Ku tu di nivê rêde vekê wê ew herê.”

”Ciwan wê dide milê xwe û wê, di rêjeya dûr de wê dihênê malê. Heta ku ew dihênê malê wê nevekê û nehêlê ku ti tişt zirarê bidina çûwalê wî. Ku ew hat malê wê di wê demê de wê, çûwalê xwe wê, dênê pêşîya xwe û wê di wê demê de wê bi itinayekê wê vekê. Di wê demê de wê bibînê

ku wê, di çiwêl de wê gelek kevir wê hebin. Wê demê ciwan dimênê şaş. Lê nivîsek piçûk jî mirovê kal kiribû nava kevirên hundûrê çûwêl de. Di nivîsê de wê binivîsênê ku tu çûwal di nîvê rêde ew nevekiribê. Te kariya xwe û fêra sabrê girtiya. Lê heta ku tu hatibê malê û li malê te li hundêr çûwalê xwe nerî bê wê demê te fêrek din jî li rex wê girtiya ew jî ya mereqê ya. Piştî wê mirovê kal dinivîsê ku ev du fêrên destpêkê ku du wê rêya dûr û dirêj a bi wê gihiştina zanîne de wê, du fêrên pêşî bin ku te girtina.” Wê demê ciwan wê, êdî wê di wê demê de wê were cem bavê xwe û wê ji wî re wê bahsa rêwîtiya xwe û nivîsa mirovê kal wê bikê. Wê demê bavê wî dibêjiyê de mirovê kal du fêr dana te û fêrî te kirina. Lê ya din a sêyem jî te bi rêwîtiya xwe û dîtina xwe girtiya. Te hemû tiştê ku te di rê de ew derbaskir ew ji min re got. Ev jî wê ji ter wê bê fêrbûnek û aqilek.”

Di meseleya zanîne de wê hemû rê wê, di wê rengê de wê, bi çuyinî bin. Wê dema ku wê mirovê kal wê ji keçelok re wê bibêjê wê keçelok wê hingê bi gûhekê lê bi hey wê lê bi hisênê. Vêca mirovê serkerwanvan hingê hanî ser ziman ku mesele ji kû vebûbû ji meseleya zaneyan vebûbû. Wê dema ku wê serkerwanvan jî gotina xwe bi dawî kir wê li nava çavên keçelok wê binerê û wê bi kenê û wê bibêjê bila ev jî wê ji ter weke çar fêran bin. Weke herdû fêrên ciwan ku te bihîst, ya bavê wî ji ciwan re ku te bihîst û ya ku min hemû nûha bi carekê ji ter hanîna ser ziman re ku wê bibê ya çaran.

Lê serkerwanvan berdewamd di vegotina xwe ya li ser bizan û xwestina wî ya bi zanebûnê de. Di wê demê de wê hingê wê serkerwanvan wê di wê rengê de wê bi wî re wê bide domandin.

”keçeloko lê meseleya bizanê dixwest bibê zaneyek wê li vir neqadihê. Wî di wê demê de wê, di awayekê de ew helwest û xwestina xwe bi awayekê evîni da domandin û bi demê re wî gelek tişt jî wê fêrkin. Gelek kesên ku ew didîtin li kirin û gotinên wî dinerin û digotin ku ew çî bûya kesekê baş, qanc û bizane. Wê dema ku wî jî ew dibihîst ji wan wê wilqasî wê li xosa wî herê û wê di wî de wê, labitantinek bi hêstiyarî wê bibê. Bavê wî jî li xoşa wî diçû ku wê dit ku wê xalkên li dorê wê wusa ji kûrê wî bahsê wê bikin.”

”Wê demê wê diilê wî jî wê bixweş bibê. Wê di wê demê de wê weke aliyekê wê yê ku mirov wê karibê wê di wê temneê de wê werênê ser ziman bê. Lê ez çawa ji ter bibêjim lawiko. Wê demê wê bizan wê di nava xalkê de wê bi wê rengê wê bi xûyên xwe yên baş û bi aqilbûna xwe wê, derkeve li pêş. Wê di wê demê de wê di hemû karên palayiyê û

hwd de wê ali bavê xwe bikê û wê weke zilemekê wê, hêza xwe wê bide nîşandin. Lê ne tenê mirovan wî ew dişopand. Rojekê wê, aciniyek jî wê ew li wî û li gotînen di derbarê de wê, li wî bisênê û wê bixwezê ku ew hinekê qirgira xwe bi bizan re bikê. De ne acini ew gelek sedsalan dijîn û ew gelek tiştan dibînin û dizanin. Wê demê wê kesek bi hesanî wê nikaribê weke wan bi dîtin û bi wê dîtinê bi zane bê.”

Lê ji aliyekê din ve jî wê gelek vegotin wê di derbarê cinan de wê bi wê rengê wê bihetan vegotin ku ew di nava mirovan de dijîn û mirov wan nasnekê. Û gelek ji wan pîrr zêde baş û qanc in û qanciyê hertimî bi mirovan dikin. Di wê demê de ev rewşa weke ku ew bi dizî di nava mirovan de jîyankirinê wê gelek sedemên wê bi hetan ser ziman. Minaq di nava civakê de wê bi wê rengê wê bahsa jîyankirina şahmaran jî wê bikira. Wê bi heta gotin ku wê xwe kiriba şeklê mirovekê û wê bi jîya. Lê kengî ew hat kifşkirin wê bi carê wê ji holê wê windabûba û wê çûba deverek din û wê bi wê rengê wê jîyane xwe wê di nava mirovan de wê bidomanda. Di wê demê de wê bo wê biheta gotin ku ew hertimî di nava mirovan de ba û wê hertimî wê qanci û başî bi mirovan wê bikira. Weke keseka her tişt ji destê wê dihat û bi aqilê xwe ku wê dikarî bersivê bide

hemû pirsan wê di wê demê de wê, li wê biheta hizirkirin û ew biheta ser ziman.

De ne, wê ev rewşa weke ya ku wê karîya bersivê bide hemû pirsan wê dem bi dem wê bûba sedema lêpîrsînê. Digotin ku ma mirovek dikarê xwe bigihênê zanîna hemû pirsan? Wê demê ku ew dihat pîrsîn wê demê dihat gotin ku wê demê ew dibîyabû ku ew weke yeka biafsûn ba. Wê demê wê karîya xwe di demê de ji demê biriba pêşarojê û paşarojê. Cinan ew dikarê wê bikin. Bi wê rengê wê baweriyek xort wê bi wan wê hebûba. Û wê biheta ser ziman.

Wê demê wê çî bûba û wê hatiba û bûba wê demê wan zanîba. Yan jî wê di demekê de wê tişte ku ew hatiba serê kesekê wê di wê demê de wê ew bi wê re wê li wê biheta hizirkirin û wê biheta hanîn li ser ziman.

Keçelok di wê demê de wî gelek tiştên bi wê rengê wî ji dayika xwe wî bihîstibûn. Di wê demê de wê dayika wî xwediyê zanînên bi wê rengê ên berfirah ba. Lê gelek pîrsên ku wî di wê demê de wê di dema ku wî bi pîrabokê re rûbi rû hatibû û wê gotibû kûrê periyê jî ew di serê wî de bû. Wî ji kû dayika wî nas dikir û wê çima ew gotin ji wî re bo dayika wî kiribû wî hê jî fahm nekiribû. Piştî ku ew gihiştibû xêva xwe jî ew rewş hemû hatibûbûna bîra û di wê demê de wî weke pîrsna ku wî dixwest ku ew xwe bigihênê bersiva wan wî di serê xwe de wî didît. Di wê demê de ew pîrr zêde li wê jî hizirî bê.

De ne, hun dibînin ku wê pîrsê wê çawa wê mejiyê keçelok wê di nava xwe de wê bibê û wê bikê nava gelek pirsan de. Ne tenê bi yên wê demê ku ew di serê wî de wî bûna. Her wusa ên ku ew hinekê berî wê bûna û piştî wê bûna wê di wê demê de ew wê di wê çerçoveyê de wê bi wan re wê li wê hizirê. Keçelok di wê demê de ew hinekê li wê hizirî bû. Di wê demê de ew di wê temenê de wê demê ew hizirîbû. Keçelok lê nikaribû ku ew bersivê ji pîrsên xwe re wê bibîne. Wî wusa di xwe de hizir dikir. Lê keçelok kesekê bi mereq û inada wî hebû. Heta ku wî xwe ne gihandiba bersivên pîrsên di serê xwe de jî ew car bicar ne disekinê. Di wê demê de ew di serê wî de bû ku ew hewlbide ku ew bersivên pîrsên serê xwe ji wir dest pê bikê û bibîne. Lê di wê demê de ew di wê demê de ku weke li xwe were wê demê wê bibîne ku wê hê jî wê heya zarê û piçkan wê li ser hev bê. Xwûşkên wê di koseyekê hinekê dûrî wan de wê serê xwe bikina berhev de û wê ji hev re wê weke ku wê pistepista wê dîtina xwe ya bi zarê û piçkan re wê bikin. Di wê demê de wê li wan binerin û wê bikenin. Keçelok jî ew fahmkir. Piçkan di wê demê de ew hinekê weke ku bikeve bin bandûra wê xweşikatiya wê keçika rind û

xweşik de wê li lê were. Lê piştî wê demek hinekê bi ser ve çû û piçkan jî weke ku ew li xwe hat. Piştî wê ew hat cem keçelok û ket rewşek weke ya fihêtokî de. Keçelok fahmkiribû ku ew li wê hatibû girêdan. Di wê demê de keçelok hingê li piçkan axift û bahsa zarê kir ku ew çendî jineka zorciwan û bedew a. Hingê wî jî maf da wî û gotina wî. Di wê demê de ew êdî di wê demê de wê hêstên xwe di wê demê de wê ji wî û dayika keçikê re wê werênê ser ziman. Dayika zarê jî dibêjê ku qismet bê wê bibê. Piştî wê, keçelok jî wusa got û weke ji wê kêfxweş bibê wî xwe gihand rûyekê bi biken.

Hinekê di wê demê de wê, dem têve çû û di wê demê de wê demê dayika zarê ji wê re got ku ma tu çû di hizirê di derbarê piçkan de ew te di acibênê. Zarê got dayika çi bivê bila ew bê û ma sekinê. Di wê demê de ew jî wê, di wê demê de wê êdî wê weke ku wê nava wan de wê çê bibê. Piştî wê, êdî hê keçelok li wir wê soza zarê û piçkan wê bi hev re wê bê birrîn.

Di wê demê de wê di cih de wê agahiya piçkan û zarê wê li hewidorê wê belav bibê. Wê demê wê birayên wî jî wê dewetekê wê bo wî li dar bixin ku ew çil şevê û rojê li dar bê. Wê ew jî wê bi wê rengê wê bi zewicin. Piştî wê, wê weke ku wê di nava xalkê de wê were gotin wê gelek serboriyên ku wê bi teybetî wê werina serê piçkan û zarê wê bibin û ew herdû jî wê bi aqil û zanîna xwe wê di her carê de wê bi ser bixin. Hemû serboriyên piçkan û zarê wê bi serê xwe wê mihtacê vegotinek û hanînek ser ziman a bi teybet bin.

Keçelok wê di wê demê de wê çendî ku wê dilê wî di xwest ku ew demekê ji ya din zûtir xwe bigihênê malê li ser israr piçkan û zarê ew li ma û ew bû hevkarê dilxweşîya wan. Piştî ku ew zewcin û pê de wê, piştî wê keçelok di cih de wê dest û lingên xwe wê zû bigirê û wê di wê demê de ew demekê ji ya din zûtir xwe bigihênê malê. Wî hem bêrfîya dayika xwe kiribû û hem jî wê dixwest ku ew demekê ji ya din zûtir ew ava zimrûtê bigihênê hilêrê û ankû xanima xwe ku ew jî bigihîjê rastîya xwe.

Di wê demê de keçelok wê di wê demê de wê, êdî wê dilxweşîyê ji piçkan û zarê re wê bixwezê û wê piştî wê rêya xwe bigirê û wê kevê rê ya malê. Piçkan heta demek dirêj ew bi wî re rêhevaltiyê dikê. Lê piştê keçelok sipasiya xwe ji wî re dikê û ji wî dixwezê ku ew vegeê cem xanima xwe ya ku ew nû bi wê re zewicî. Piştî wê piçkan ji wî re dibêjê ku hertimî bila di aslê te de bê ku wê, li vir ne tenê birayekê de wê 40 birayên te wê hebin û kengê karekê bikeve bi vê aliyê de divê ku tu bi ser

me de were. Keçelok jî dibêjê bila û bi heman rengê ew jî hêstên xwe dihênê ser ziman û ew diçê bi rêya xwe ve.

Li gorî ku wê di nava civakê de wê were gotin wê keçelok wê di wê rêya xwe ya vegehinê û di dema vegehinê li malê de jî wê weke ku ew çawa ji malê derdikeve û di keve rê de wê di wê demê de wê tiştên ku wê werina serê wî ew wê derbas bikê. Di wê demê de wê, di wê rengê de wê ew wê di wê temenê de wê di wê rengê de wê werê hanîn li ser ziman ku wê her devera ku ew di wê re wê derbas bibê wê serboriyek wê di wê rengê de wê were serê wî.

Keçelok wê di wê demê de wê, di renekê de wê weke ku wê were ser ziman wê di wê demê de wê, ew rastî gelek kesên ku wê qanciye bi pê bikin û yên ku wê xirabiyê wê bi wî bikin wê were. Yek ji wan serpehatiyan wê ew bê ku wê demekê wê were deverekê ku wê di wê demê de wê bibîne ku wa çî qasrek mazin wa li hê heya. Di wê demê de keçelok di wê demê de ew di pirsê û heta ku ew dihê ber malekê di wê demê de ew ji wan dipirsê ku hun mêhwanan di hawênin ew jî dibêjê serçavan û keçelok diçê male wan lê di wê demê de wê di wî bajarî de wê herkesek dilxamgin bê. Wê demê keçelok wê sedema wê dilxamginiyê wê ji xwediye malê wê bikê ew jî wê bahsa şahê wan bikê ku ew pîrr xamgina. Di wê demê de wê bahsa dîtina xewneka pîrr xirab ku wî dîtîya û wî serî li gelek afsûnkaran daye lê wî bersiv ji xewna xwe re negirtîya. Wê demê de wê keçelok wê pîrr zêde wê mereq bikê ku ew xewn çî ya û çawa ya. Wê demê de wê, xwediye malê wê hingê wê keçelok li hemberî xwe wê bide rûnandin û wê di wê demê de wê pêşî avekê wê dênê pêşî û wê ji wî re wê bibêjê ku tu mêhwanê min î. Pêşî hinekê bêhna xwe bistêna. Piştî wê ezê ji ter vebêjim ku xewna şahê me çî ya. Di wê demê de keçelok wê bikeve nava mereqek mazin de ku wê xewna şahê wan ku wê wilqasî wê herkesekê wê bikê nava xemginiyê de wê çî bê. Wê demê her ku keçelok wê bi xwediye malê re wê biaxifê û wê gotinê wê werênê ser xewnê ew wê bibêjê pêşî tu li rehet binere û hinekê xwe rehet bikê, dihê dîtin ku tu ji rêyek dûr hatî.

Piştî ku keçelok xwarina xwe xwar û hinekê ew bi hev re li hev rûniştin wê demê xwediye malê li lê xwe zivirand û li keçelok bidest axiftinê kir û weha got.

”Ev dever wê demek ku wê navê derketî bê. Weke nisêbîsê. Lê wê gelekî şar bi xirabiyê re bûya. Demekê pîrr kevn de wê, pîrabokek pîrr zêde xort wê were û wê bixwezê ku ew hemû tiştê bikê bin seheta xwe. Wê kir jî. Lê li hemberê wê şer hatikirin û bi serketin. Pîrabok di nava

reşîyê de li deverek pîrr dûr hat girtin ku ew nikaribê xwe bigihênê me. Lê di vê demê de wê cardin xwe xilaskir û ew hat li holê. Ew hatibû xewna şahê me ku ew xwestibû ku wî bikê bîra xewê de û ku ew ti carî nikaribê ji wê derkeve. Lê wî xwe ji destê wê xilaskir. Lê piştî wê, xamgini ket ser rûyan û nerabû. Wê sedema wê ev bê. Di wê demê de ev jî wê weke afsûnekê li me bê ku wê, hertimî wê bi wê xamginiyê wê bijî. Lê ew ji xirabiyê bê. Ji sehêta destê nebaş a li ser me bi wê serwer bûya bê.”

”Şahê me xwestiya ku ew wê pîrabokê tê bikê û li hemberê wê ketiya şerekê. Û em bi bawer in ku emê karibin wê têkbibin û cardin bigihijina rûkeniya xwe.”

Xwediyê malê wusa got û ma sekinî. Di wê demê de wê di wê temenê de wê, hizrên xwe wê hinekê dirêj wê werênê ser ziman. Ew gelek wê bahsa şerê nava başî û nebaşîyê wê bikê û wê di wê demê de wê bi wê re wê hizrên xwe wê werênê ser ziman. Di wê demê de wê, keçelok wê bi gûhên baş wê li lê gûhdar bikê ku ka ew çî dibêjê.

Piştî ku keçelok fêrî meseleyê bû ew êdî di wê demê de hinekê bêdeng bû ku ma mirov çawa dikarê wê afsûnê ji ser mirov û laşê mirov rabikê. Piştî wê bi xwediyê malê re li ser wê axift û hizrên xwe hanîna ser ziman.

Di wê demê de wê xwediyê malê wê, keçelok wê bibê û wê bi şah re wê bênê cem hev. Di wê demê de wê, keçelok wê ji şah bipirsê ku wê ev kesa xirab kiya wê ji jê bipirsê. Di wê demê de şah wê ji wî re wê bi axifê û wê bahsa wê bikê ku ew çawa bi salan li hemberî wê bi jîyane xwe ya azad û bi şad li hemberî wê sekinî na. Wê ew wê ji keçelok re wê bênê ser ziman ku ew hatiya xewna wî û wê xwestiya ku ew wî di xewnê de dilbigirê ku ew şîyar nebê. Lê min xwe ji destê wê xilaskirîya.

Piştî wê şah ji keçelok re got ku ew di welatê xewê de ew hatibû girtin. Lê wê xwe bi awayekê serbestkirîya. Êdî ew dikeve xewa herkesekê û bi wê rengê wan di xewa wan de wan dilbigirê.

Wê demê keçelok gotibû şah ku ew divê ku rêyek were dîtin û bê çûyin li welatê xewê û ew li wir were dilgirtin. Dakû ew nikaribê wê bikê. Piştî wê di wê demê de wê, êdî wê şah wê bahsa demên bûhûrî de şer û pevçûnên bi wê re ên ku ew hatina kirin û çendî zaiyet hatina dayin wê ji wan wê bahs bikê.

Lê piştî wê biqasî ku wê were gotin wê, keçelok bixwe jî wê were gotin wê rêyekê wê bibînin û wê herina welatê xewê û ew wê li wir wê were ji holê rakirin. Ew di wê demê de wê, tilsima wê hebê ku ew dihê tûnakirin ew êdî wê hemû hêza wê windabikê û wê demê wê ew bê kirin.

Serboriyek din jî wê di dewama wê de ku wê were ser ziman wê ew bê wê ya çêkirina iksira nedîtinê bê. Di wê demê de wê dihê gotin ku keçelok wê di rêya xwe de wê dewam bikê û wê, di wê de wê were gundekê di wê demê de wê, gund hemû di wê demê de wê li ser rewşekê wê li nava hevkeve. Wê demê wê zad û gelek tiştên wan ên ku wan ji xwe re çêkirina wê di wê demê de wê, werin û wê bi carê wê ji holê ra bibin.

Di wê demê de wê kesek nizani bî ku ew çawa dibê. Di wê demê de wê bê gotin ku wê, di wê demê de wê, kesekê pîr ku ew dermanan çedikê bo başbûna mirovan wê ew wê, çavê wî derkeve û wê bê gotin ku wê iksira nedîtinê wî çêkirinê. Di wê demê de ev pistepist wê li ser wê, di wê demê de wê bê gotin ku wê hingê herkesek wê, dema ku wê tiştên wan wê winda bibin wê demê wê werina cem dermançêker û wê ji wê bipirsin. Di wê demê de dihê gotin ku keçelok jî li wir amede ya û ew di wê demê de xalkê bi aram bin emê bibînin ku ew ki dikê. Wê demê de wê di wê çerçoveyê de wê derxê li holê ku wê dema ku wê dema ku wê mirişkên malan ji kulinên wan winda dibin çawa rovi dihê û wan bi dizî dibê. Wekî din wê demê wê, çawa wê, di wê rengê de wê hinek kesên ku wê dizitîyê wê bikin di wê demê de wê, ew jî wê xwe di bin wê maskeyê de wê bidina vêşartin û wê tiştan wê bibin û wê sûc wê bi avêjina ser faqirê dermançêker. Wê demê keçelok dihê gotin ew wê jî derdixê li holê û wê piştî wê, meselaya iksira nedîtinê wê bigihênê li çareserîyê.

Lê di wê demê de wê, rojekê ji rojan wê bê gotin ku wê zarok wê, bikevina kargeha dermançêker û wê şuşeyek derman wê bibin û wê bibêjin ku ew iksira nedîtinê ya. Di wê demê de wê hingê wê bê gotin ku wê, demê wê keçelok wê bi wan re wê rû bi rû wê were û wê di wê demê de wê, iksirê wê di wê demê de wê ji destê zarokan wê bigirê û wê, di wê demê de wê bikê bin desmalkekê de. Piştî wê ew wê piştî ku ew derdixê û wê bêgotin ku ew zarok wê dibînin ku ew ne li cihê wê ya û çawa ji berçav windabûya. Di wê demê de wê, di nava zarokan de wê, nîqaşên weke ku em nedîtî bibin emê çawa hev bibin ku ew dibêjina keçelok wê demê keçelok wê ji wan re wê bibêjin ku ew, nebibin bin.

Tabî di dewama wê de wê bahsa serboriya keçelok û ew dema ku wê di rêya xwe de wê were gundekê din û li wir meseleya male bi sawêr û ankû male bi xiyalet. Di wê demê de wê di nava daristanê de wê weke malek hatî derikandin ku wê di nava gundiyan de wê hertimî wê bê sedema tirsê û di wê demê de wê, bê gotin ku wê li wê cin wê bimênin. Weki din kesên ku ew dihên wi re çawa ew ji ber çav ew winda dibin wê bahsa

wan bikin. Di wê demê de wê hinek kesên ku ew çûna wir ne vegeriyana wê bahsa wan wê were kirin. Weki din wê bahsa bi şev hatina dengan ji wê wê were kirin.

Di dewama wê de wê serboriya wî ya ji wê pêde ku wê were deverek din û wê bi wê re wê bahsa rohnîya hevîyê ku ew li mirov dixê û wê piştê wê çawa wê xwestekên mirov wê bi wê re wê werina li cih. Li gorî ku wê were gotin keçelok wê di wê demê de wê, were gundekê din û wê li wir wê şevê wê bibê mêhwan û wê di dewama wê de wê dema ku wê rohnîya hevîyê wê lê bixê û ew çî dibêjê ku ew weke wî dibêjê wê, di wê demê de wê hingê wê, hinek wê keremetê wê di keçelok de wê bibînin û hinek wê keremetê di rohnîya hevîyê a kefî ser de wê di wê de wê bibînim.

Tabî vegotinek din jî wê di wê temenê de bê ku wê weke bi keçelok re wê were ser ziman ku wê, ew wê çawa wê, xwe gihênê wê sîyane ku ew dayîna şîretê li şah bê. Ew jî wê di wê temenê de wê were gotin ku wê dema ku wê keçelok wê ji wê rêwîtiya xwe wê vegehihê wê di rê de wê, gelek wê bi wastihê û wê demekê li binê darekê wê rûnihê û wê bêhna xwe wê bistênê. Di wê demê de wê, di demê de wê gelek tişt wê werina bîra wî û ew wê di wê demê de wê hinekê bi dil û bêrî bibê. Wê ofekê wê ji dil wê bikişênê.

Di wê demê de wê, bilbilê wî yê ku wê pir zêde wê xweşik dibilbilênê wê bi wî re bê û wê di wê demê de wê ew wê derxê û ew wê ji keçelok re wê, demek dirêj wê di wê demê de wê, bi bilbilênê. Di wê demê de wê, ji gotinan wê were gotin ku wê perîyek pîrr zêde xweşik ew jî wê hinekê ji dûr ve wê dengê bilbilê wê bikê û wê pîrr zê de wê ji wê bi bandûr wê bibê. Di wê demê de wê ew jî wê li deverek ku wê keçelok wê nebîne wê, rûnihê û wê li bilbilina bilbil wê bihêsênê.

Di wê demê de wê bi wê rengê wê weke ku wê were gotin û wê were ser ziman wê, demek wê bi ser wê de wê derbas bibê û wê herê. Di wê demê de wê, weke aliyekê wê yê din jî wê di wê demê de wê, li wê keçelok wê di wê demê de wê nizanibê ku wê dem wê çawa wê derbas bibê. Ew di wê demê de wê, piştî wê ku ew demek xwe ya bi dil û bi bêrî derbas dikê wê di wê demê de wê piştî wê rajê bilbil û wê bikê cihê û wê bikê û ew herê. Di wê demê de wê, di wê demê de wê perî wê xwe bi carekê wê li ber keçelok wê bide dîyarkirin û wê bi wî re wê biaxîfê.

Di wê demê de keçelok ji wê pêşî wê pîrr weke ku wê bi tirs bibê. Lê piştê wê fahmbikê ku ew wê zirarê nedê wê û di wê demê de ew hinekê

di wê demê de wê bi wê rengê wê bi wê re wê rûnihê û wê, bi hev re wê derdê xwe de wê ji hev re wê bibêjin.

Di wê demê de wê perî jî wê derdekê wê hebê û ew jî derdê xwe ji keçelok re dibêjê. Ew jî xwediyê keçikek wê ya keçperî bû û ew pîrr zêde xweşik bû û ew perîya başkirinê bû. Di wê demê de wê, ew wê ji keçelok re wê bibêjê ku wê ji aliyê şahê wê deverê ve ew keça hatiya dilgirtin di **rekehekê** de dihê dil ragirtin li qasrê. Wê dema ku wê keçelok wê ji wê bipirsê ku ew çawa ew hat girtin wê, demê wê, di wê demê de wê ew wê serborîya xwe wê bi wê rengê wê ji keçelok re wê bibê.

”keçika min pîrr zêde delal û sipahiya. Dilpaqij a. Hertîştê bibaşiyê dihizirê. Hertimî di nva hewldana fahmkirinê kesê ku ew bi wê re diaxifê. Xwe dikê cihê kesê li hemberî xwe û wan û ya dilê wan û di serê wan de **fahmdikê**. Wê hertimî xwestîya xwe ku ew weke dilê xwe nêzî mirovan bibê. Wê qancî bi wan kiriya. Ew rojekê weke zaroyekê derdikeve li holê û bi zaroyên mirovan re li qadê dileyizê. Di wê demê de wê kesên li dorê wê farq bikin ku ew keçperîyek a. Di wê demê de wê zarok wê li wê germ bibin. Wê piştî wê, demekê wê, ew bi hev re wê bileyizin. De ne perî ji baskên xwe yê weke ji rohaniya zer a rojê afirîna wê, tozek wê were ku ew toz li mirov ket wê çiqasî tu bixwezê wê te bi aqil û lez bikê. Di wê demê de wê, di wê demê de wê dema ku ew keça min wê bi wê rengê wê were farqkirin wê di wê demê de wê agahi ji şah re wê herê ku ew keçe perîyekê ya û ew dikarê hertîştê bi wê bide kirin. Di wê demê de ew wê zarokan wê li gorî xwe wê ayar bikê û wê bi wan re wê wan dewetî qasrê wêbikê. Wê xwarinê wê bide wan. Di wê demê de wê zarok wê têr bixwûn û vexwûn. Piştî wê di xewê ve wê herin. Di wê demê de keçe min jî wê bi wê rengê wê di xewê ve wê herê. Piştî wê ew dema ku ew şîyar dibê ew xwe di wê rekehê de dibînê.”

”Piştî wê keçelok wê di bînê ku ew çawa nikaribê xwe xilas bikê. Wê demê perî ji wê re dibînê ku ew zarok a. Ew bi hinek şertan hatiya ragirtin û ew nikarê xwe ji wir xilas bikê. Kengî ku ew di awayekê de ew gotin ji devê şah derkeve û bibêjê ez wê berdim wê hingê wê karibê bi carekê serbest bibê. Ew jî wê tenê wê kesekê ku ew weke şêwirmend ku ew li cemê ku ew bi wî re karibê wê bikê.

Wê demê perîyê ji keçelok alikarî xwest wê di wê demê de wê, bixwezê ku ew alikariyê bide wê ku ew zaroya xwe ya perî ji dest azad bikê. Wê demê ew keçelok wê demek dirêj wê li hev wê rûnihin û wê bi axifin bi hevdû re. Di wê demê de wê, piştî wê keçelok wê ji ya dilê wê ewla bibê û wê di wê demê de wê ew wê wê bixwezê ali wê bikê û wê bigihêne

zaroya wê. Keçelok gota wê ez dizanim bêrî çî ya û ezê bo wê ali te bikim.

Di wê demê de wê keçelok wê weke ku wê were gotin wê rêya xwe ya qasrê wê bigirê ku ew herê wir. Ew pêşî dihê nava niştcehî. Di wê demê de şah gotin derxistiya ku kesekê dikarê ew weke wezir ji xwe re hilbijêre piştî ku ew di azmûnên wî de derbas bû. Di wê demê de wê keçelok wê dema ku ew deng dikê wê ji xwe re wê bibêjê ev weke firsendekê ya û wê di wê demê de wê ji wir wê ya qasrê wê bigirê ku ew herê qasrê û ji azmûnên wî derbas bibê û bibê wezirê wî bo ku ew keça perîyê xilas bikê.

Dii wê demê de ku ew dikeve rê de wê di rê de wê rastî gelek mirovan wê were û hemû wê bi wî re wê rûnihin û wê di wê demê de ku ew dema ku ew bi wan re di rûnihê ew wê bixwezin ku wî ji rêya wî bidina vegeandin. Hemû wê ji keçelok re wê bibêjin ku tu herê û bikeve azmûna şah de û ku tu bi serneketî wê serê te wê lê dê. Ew çendî ku wê ji keçelok re wê dibêjin û ew gotin tirsekê jî di dilê keçelok de wê bide çêkirin jî lê keçelok wê ji ya xwe newê xwerê û wê bixwezê ku ew herê qasrê. Piştî wê ku ew hat qasrê wê li devê derêyê qasrê wê rastî berderkvan wê were û wê di wê demê de wê ji wî re wê bibêjê ku ew hatiya û bikeve azmûna şah a bo bûna wezir û şewirmend ji şah re. Pêşî berderkvan wê piştî wê destûrê wê ji wî re wê bidiyê û ew wê herê hundûr. Di wê demê de ew dema ku ew dikeve qasrê wê bibênê ku wê qasrek bi iltişama xwe ku wê çemdî wê mazin bê wê were berçavên wî. Di wê demê de wê keçelok wê pirr zêde wê di bin bandûra wê de wê bimênê. Di wê demê de ew dikeve hundûrê qasrê di nava wê de bidest çûyînê dikê. Di rêya xwe de wê ya çûyina di nava qasrê de wê rastê jineka pirr zêde pîr wê were ku ew di destê wê de wê gelek mahark wê hebin û wê hemû rijandibina li ardê û ew wan berhev dikê. Wê demê jina pîr wê çavên wê jî wê zêde weke ku wê nebênin. Lê keçelok wê di wê demê de ew nexwezê ku ew di wê rewşê de ji jina pîr bi wê rengê derbas bibê û ew herê. Ew di wê demê de ew tê û bi destê jina pîr digirê û wê di rakê ser xwe. Piştî ew wê wê bikeve pey berhevkirina maharkên wê de. Weke maharkên weke sadafê ku ew ji nava avê hatibûn berhevkirin bûn. Wê hemûyan wê bi carekê wê berhev bikê û wê di wê demê de wê bikê destê wê de. Lê di wê demê de ku wî ew kir û mahark kirina destê jina pîr de wê jina pîr wê dîsa wê destê xwe wê ji hev wê vekê û wê maharkên xwe wê birijênê li ardê û wê dîsa wê xwe bikê heman posijonê û wê bikê ku wan berhev bikê. Keçelok tişt ji wê fahm nekir.

Wê dema ku wî ji jinêa pîr pirsî ku ew çima wê dikê wê, demê jina pîr tenê bi dil û nîyetek baş lê kenî û hewd. Piştî wê keçelok ji wê derbas bû û ew hat ber devê odaya mazin a şah di wê de. Wê keçelok wê destûrê wê bistênê û wê derbasî hundurê wê bibê.

Di wê demê de keçelok dît ku wa gelek kes wê li dora şah wê hatibina cem hev û wê li hemberî şah wê sekinî bin. Keçelok di wê demê de wê dema ku wî xwe pênasekir wê di wê demê de wê, di wê demê de wê, şah wê li wê binerê û wê di wê demê de wê yek bi yek wê ji wan bipirsê ku ew dema ku ew hatina wir ew rastî çi hatin. Hemû jî wê her yekê wê tiştêkê wê bibêjin. Keçelok wê rastarast wê bahsa dema bihîstina gotina bijartina a wezirtiyê kir û piştî wê dema ku ew ket rêya qasrê de wê gelek kes wê bikin ku ew wî ji rêya wî bikin û wê piştî wê bahsa hatina ber devê dêrî û derbas bûna wî hundur û wê jina pîr û rewşa wê ya berhevkirina maharkên wê bikê.

Di wê demê de wê, piştî wê şah ku wî li hemûyan hisand û pê de wê piştî wê ji wan re wê biaxifê û wê bahsa şartê wan ê li pêşîya wan ku ew bikevinê wê bikê. Ew jî wê lebirentek bê. Wê demê ew divîyabû ku ew bikevina lebirentê û ew ji wê bi serê xwe ew derbas bibin.

Wê demê wê şah wê bi hinek wezîrên li dora xwe re wê hemû nemzetan wê bi keçelok re wê werênê ber devê lebirentê û wê di wê demê de wê ji wan re wê di wê de wê rastî çi wê werin wê bibêjê. Şah wê ji wan re wê bibêjê ku ew divê ku ew bi zanîn û hêza xwe ew karibin derkevin. Di wê demê de hemû dibêjin herê. Lê keçelok weke ku ew di destpêkê de ew hinekê dilwaswasiyê dikê. Wê demê ku ew ket wir û ew rêya xwe nebînê wê heta heta wê di wê de wê bimênê û wê di wê de wê winda bibê. Di wê demê de keçelok li wê hizirê.

Piştî wê gelek tiştên din hatina bîra wê. Dayika wî û hilêrê û serboriya wê hat bîra. Di wê demê ew hingê li wan hizirî hindik mabû ku ew xwe ji wê bide vekişandin. Lê wê demê wê, rewşa periyê ku ew dilê wî pirr bi wê şawitî ew hat bîr û berçavên wî. Di wê demê de wî xwesti ku ew êdî wê temem bikê û ew wan bigihênê li hev.

Di wê demê de wê keçelok wê piştî wê ew jî wê bibêjê herê bi gelek hizir û haznan ku ew li wî serwer dibin. Piştî wê ew ket hundurê lebirentê û ew di wê de wê weke ku wê êdî wê weke winda bibê wê li wî were ê di wê demê de ew geleki di hundurê wê de digerihê. Di wê demê de ew piştî demekê wê were ber deverêkê ku wê du rê wê derkevina li pêşîya wî. Rêyek wê pirr zêde wê paqij û hatî çêkirin bê. Rêya din jî wê ne paqij û ne lihevdayî bê. Di wê demê de ew wê rêya ne li hevdayi dihibijêrê û

heta ku ew di wê re dibê ber devê dêrî ew wê di rê de wê lihevdayhevkirinê wê bikê û wê paqij jî bikê. Ew di demek dirêj de wê piştî wê bigihijê derîyê dawî. Di wê demê de wê, dema ku wê keçelok wê were ber devê dêrî wê bibînê ku wa gelek nemzetên din ew hatina û derbas bûbûn. Gelek di wê demê de wî zan dikir ku ew weke yê pêşî bû ku ew gihişt. Lê yên ku ew berî wî gihiştibûn ew hebûn û keçelok ew li rex şah li hev rêzkerî dîtîn. Wê dema ku ew gihişt cem şah wê demê şah ew danî cem yên din li rêzê. Wê demê ku hemû nemzet hatin wê demê şah li wan axift û bahsa bijartina rêya paqij û ya ne paqij kir ku wan çima ew bijart. Hemûyan her yekê hizrên xwe gotin ku wan çima bijaertîya. Keçelok jî wê demê wî hizrên xwe got ku "herkesek di rêya lihevdayî û paqij dikarê herê. Min nexwest ku ew ez ya hesan hilibijêrêm." Wê demê şah ji wî re got ku gelek rêyên bi wan ji lebirentê ku mirov derkeve wê hebin lê te ya zor bijart. Ber çi? Wê dema ku wî wusa ji keçelok pirsî hingê keçelok bersiva xwe da û got ku "ti tişt di jîyanê de wê ne hesan bê. Wê bi kedayinê wê bibê. Heta ku tu lokma di devê xwe de jî ne cûyê tûyê nikaribê wê bi qûrpênê. Min bi wê mantiqê û hizrê ew kir." Hengê şah li wê gotina wî hizirî û ew rast dit. Di wê denê de wê, demê şah ew piştî wê gota nemzetan weke azmûn xilaskirin lê ezê nûha ji ser bibêjim ku kî derbas bûya. Wê demê hemû nemzetan zandikir ku wa yek derbaskirîya û hê du azmûnên din hena. Lê dema ku şah gota wan azmûn bi dawîbûn ew hinekê mana şaş û mat di wê demê de.

Di wê demê de wê dema ku şah li wan bi dest axiftinê kir wî wusa got ku "ew dema ku hun ji nava bajêr ketina rê ku hun werina vir û wê gelek mirov wê werina pêşîya we û wê bikin ku ew we ji rêya we bikin ew azmûna pêşî bû ku weke derbas kir. Ez tevî hemû gotinên bi kirina tirs li dil we bi şûn ve gav neavêt û weke ew kir. Ew ya wîna we bû. Ya duyem wê dema ku hun hatina qasrê hun rastê wê jina pîr û berhevkirina wê ya maharkan kir û hun li wê sekin in û we ali wê kir ew jî azmûna wê ya duyem bû û ya rahmê bê. Di wê demê de wê demê wê hinek nemzetan ew derbaskiribûn, bêî ku ew heya ji jina pîr werênin û alikariyê ew bidinê de.

Piştî wê şah hat ser ya sêyem û di wê demê de wî li ser wê jî got ku ew jî wê di wê demê de wê, di lebirentê de wê bo derketinê wê gelek rêyên derketinê wê hebin û wek hemûyan jî ew kifşkirin. Lê yên ku rêya hesan bijartin ew di cih de gihiştin vir û yên ku rêya zor û bi asteng bijartin jî ew jî dereng hatin. Ew jî wê, nîşanaka wê bê ku hun çendî hunê karibin ji

barên giran biravin û ankû neravin û hunê xwe bidina ber wê ew jî wê weke nîşanaka wê bê.

Hingê wê dema ku wê şah wê wusa bibêjê wê demê gelek ji wan fahmkiriin ku wan hersê azmûnên şah nedana. Di wê demê de wan serê xwe kirina berxwe de. Lê keçelok di wê demê de wê li gorî şah wî her azmûn li gorî xwesteka wî dabûn û wî wezirti mafkiribû. Di wê demê de wê şah ew di wê demê de ragihandin weke wezir. Di wê demê de wê, dema ku keçelok bû weke wezir wê di wê demê de wê şah wê ji jê wê bipirsê ku ew xwesteka wî û gotina wî ya pêşî çi ya. Wê demê keçelok hinekê ji şah re axift û bahsa dûnyê û başî û nebaşîyê kir. Gotinên keçelok pîrr zêde li xoşa kesên li dorê çûn. Di wê demê de keçelok gotin hanî ser rewşa keçika perî û di wê demê de wî xwest ku ew şah wê serbest berdê. Hingê şah hinekê ma sekinî.

Şah keçelok da rex xwe bir devera ku ew wê rekeha ku keçik di wê de dihê ragirtin. Wê demê ew hatina wir şah di wê demê de divîya bû ku ew li gorî rêgezên ku wî dana kifşkirin ew wê bîne li cih. Wê demê şah weke ku ew berî dilê xwe jî bê ku wî got bila. De ne, dayika perî ji wî re gotibû ku wê dema ku ew gotin ji devê şah derket û pê de wê keçika min wê di cih de wê ji rekehê wê ji berçav wê wînda bibê û wê were cem min cem dayika xwe. Lê di wê demê de şah jî dibê ku ew heya wî ji wê nebû. Wî dibê ku wî ne ji dil gotibû ku bila ku ew wê serbest berdê. Di wê demê de wê dema ku wî ew got hema dît ku wa keçika piçûk bû weke şawqekê û di cih de ji berçav windabû. Di wê demê de weke ku ew ji zincirên xwe yên ku wê dilgirtina xilas bibê ew diçê. Di wê demê de wê dema ku şah dît ku ew ji berçav windabû wê demê wê, di cih de got kesên li dora xwe me çûbû û çi nebû û di wê demê de ew êdî fêde ne dikir. Keçik çû bû. Şah li wê hêrs bû û gota keçelok tu jî here êdî bila çavên min te nebinê. Keçelok ya ku wî li azmana lê digeriya wî bi wê gotina şah weke li ardê dît. Di cih de ku şah wusa got hema di cih de bêî ku ew demê wînda bikê wî, lingên xwe lezend û ji qasrê derket û çû. Piştê ew ket rêya xwe. Di wê demê de wî êdî wê hizirkir ku ew dê û keç gihiştina hev. Wî di serê xwe de wusa zankir. Di wê demê de wê weke ku wê were gotin keçelok wê hinekê wê di rê de ku wê herê wê bi carekê wê dayika perî û keçika wê li rex hev li hemberî wî rûdan. Wê demê keçelok dema ku ew dît li wan sekinî û dayikê spasî keçelok kir û gotiyê de tu çi bixwezê ez di xizmeta te de me ku tu bixwezê ez bikim. Piştê navê xwe ji wî re got ku ez weke keça şahê perîyan im. Navê **min** dilşaşêrîn a. Kengî ku te v navê min got ezê li hemberê de bi wê şabûna xwe ez

rûbidim. Te qancıyek mazin min kir, bile hemû bergê û gotinên qanc in perîyan ji ter rêheval bin û piştî wê ew ji berçav winda bûn.

Keçelok jî piştî wê êdî wî rêya xwe domand û di wê dimeê de wî xwest ku ew di rêya xwe de ew herê. Wî dixwest ku ew di wê demê de ew demekê ji ya din zûtirin ew herê û bigihihê dayika xwe û hilêrê xwe. Di wê demê de keçelok di rê de ew dimeşî û mejiyê wî gelek tişt ew dihanîna bîr û çavên wî. Di wê demê de wî li wê dihizirî ku ew gelo ew nûha rewşa wan çawa ya. Ew di çî rewşê de na. Nûha baş in û ankû di nava xirabiyekê de na. Ew li wê hizirî. Di wê demê de wê di wê demê de ew li wan dihizirê. Piştî wê ku keçelok wê hinekê din wê di rê ve wê herê wê êdî wê li binê darekê wê were gotin ku wê bêhn wê bistênê û wê hinekê wê ji xwe re wê rûnihê.

Piştî ku keçelok hinekê di rûnihê û bêhnna xwe di vedê wê dibînê ku wa hinekê ji wî wirde wê şivanek bi kerîyê xwe yê baz re wê disekinê. Keçelok hema ji cihê xwe rabû û bi br şivan ve çû. Piştî wê keçelok ji wî re got 'qewet bê kekê şivan' ' şivan ew hinekê sekinî û piştî ew ji serî heya binî ew parzanan bi awirên xwe piştî wê gotiyê xwûdê ji ter razî bê û keçelok dewetî cem xwe rûniştinê kir. Şivan bo ku ew ji germa rojê xwe bi parêzê wî ji xwe re sêwanek çêkiribû û di bin wê de rûniştî bû. Di zerikekê de wê weke ku wê hinek şîrê ku wî nûha ji mehê dohtibû û hebê. Li cemê jî wê nanek seyê ê tanûrê wê hebê. Şivan gota keçelok keremke were nanê min bi min re bixwê û keçelok sipasî wî kir. Piştî gezek ji nanê wî bi wî re xwar. Di wê demê de herdû jî ku wan nan bi hev re xwar û xwe di bin wê seha sêwanê de dirêjkirin. Heewayek hînîk li wan dixist. Şivan sayê xwe yê şivan berda dora kerî ku ew lê bînerê û wî xwe li xewê razand. Keçelok dît ku wa şivan hema çavên xwe girtin û bû xiraxira wî di xewê. Hingê keçelok got ku ew çî zû di xewê ve çû û piştî wê, wî jî hinekê xwe ji wî wirde bi ling dirêjkirinê bêhne xwe veda.

Piştî wê, demek têve çû keçelok dît ku wa hinekê ji wî wirde weke tiştêkê sipî dît. Pêşî wî zankir ku ew dibê ku ew berxikek bê. Piştî wê êdî wî lingên xwe berhevkirin û bi ber wê berxikê ve kir ku ew herê. Di wê demê de keçelok dema ku ew çû dît ku wan kîvroşkek mazin ku ew ji bersixekê mazitir wa li wir vir bû. Keçelok dema ku wî ew kifşkir wî zankir ku ew wî farq bikê wê di cih de wê bi lingên xwe yên bi baz wê di cih de wê ji wir wê dūrkeve. De ne, ji kîvroşkê baztir wê weke ku wê zêde ti heywan nebin. Hingê baza bû. Lê di wê demê de çendî ku keçelok bi ber wê ve çû jî wî dît ku wa kîvroşk ji wî neravî. Ew li wê ma şaş. Piştî wê êdî wî hinek geya da hev û kir dest û bi ber vê ve dirêjkir. Çendî ku

wî bawer nedikir ku wê kîvroşk wê bisekinê li wir jî wê ew kir. Hele ku kîvroşk were û ji destê wî geya bixwê wê weke tişteke ku ew di dînyê de nebûbê. Lê di wê demê de çendê ku ew bi ber kîvroşkê ve çû wî di ku kîvroşk ji wî neravî. Her ku wî dît ku ew ne ravî ew zêdetirî bi ber wê veçû. Heta ku ew ghişt cem wê ew çû û keçelok geyê xwe di dest de li lê dirêj kir. Tişteke din ê ku wê li keçelok acêb wê were wê di wê demê de bû. Ew jî ew bû ku kîvroşk di wê demê de devê xwe avêt wê geyayê di destê wî de û bi dest xwarinê kir. Keçelok ji wê ma acêbmayî. Piştî wê keçelok destê xwe wusa dirêj kir girt û ma sekinê.

Piştî wê keçelok weke ku ew ji xwe re biaxifê wê bibêjê ku baş bû ku kîvroşka delal tu hatî. Ez jî bi tenê bêhna min dervediket û baş bû ku tu hatî me hev dît. Di wê demê de wê tişteke din ê acêbtir wê bibê. Ew jî wê ew bê ku wê kîvroşk wê bidest axiftinê a bi keçelok re wê bikê. Pêşî keçelok dema ku wî dengkir wî zankir ku şivanê wî rabûya û wî li dora xwe nerî û ku ew wî bibînê û bersivê bidiyê. Lê şivanê wî hê li cihê xwe yê dirêj kirî bû û weke ku ew razahi bû. Ew ne di wê pozisyona ku wî li wî dengkirî bê de bû. Di wê demê de keçelok hê ma şaş. Di wê demê de wê kîvroşkê cardin dengkir û wê demê keçelok bi rastî jî fahmkir ku ew deng ji kîvroşkê derdikeve. Di wê demê de ma şaş. Kîvroşkî cardin axift û gota keçelok lawê bêpor şaş nemêna ez im diaxifim kîvroşk û ma sekinî. Keçelok piştî wê fahmkir ku ew ma sekinî. Di wê demê de wê, di wê demê de wê dema ku wî fahmkir ku ew kîvroşka axift ew piştî wê ku wî ew fahmkir û şaşbûna xwe ji ser xwe avêt û pê de ew li hev rûniştin û ew bi hev re bidest axiftinê kirin. Keçelok bahsa xwe û rewşa xwe kir. Di wê demê de wê, keçelok wê bahsa serborîya xwe wê bikê. Piştî wê kîvroşkê jî bahsa serborîya xwe ki wê ji keçelokê re got ku ew di aslê xwe de ew ne kîvroşka. Ew mirovek û keça şahekê û di wê demê de wezirekê cem bavê wê hebû pîrr xirab bû ew afsûn li min kiriya û ez kirina wê demê de. Wê demê keçelok wê dema ku ew li wê bihîst ya hilêra wê hat bîra wê. Dîroka wê weke ya wê bû ji wî re ayni hat.

Di wê demê de kîvroşk demek dirêj ji wê re axift û piştî wê, gota keçelok carek min heya ku ew afsûn ji ser min xira bibê. Got ku du koka gûla beybûnê de wê, di qûrmikê wê de ew sipîka wê bi avake herî paqij weke ya ava zimrûte were şilkirin bi wê ez dikarim wê afsûnê xirabikim û wê hildim. Lê bo wê jî wê, zerikek zêr a teybet wê pêwîst bê. Di wê demê de wê, demê kîvroşkê ji keçelok xwest û ku ew alî wê bikê. Wê demê keçelok ne got na. Hingê tenê got ma ez çi karim wê bikim. Di wê demê de ji keçelok re got ku li aliyê din ê çi yê çemek heya û li **berçem**

darek zêde mazin û gûr heya. Ji darê wîrdetir wê malek hebê. Ku tu çûyi bindarê tê bibînê ku wê li wir gelek hilêrê wê hebin û wê demê wê te weke mêhwan wê dewet bikin. Wê demê ku wan ti dewet kirin wê pirsan ji te bikin ku tu zanibê wê gelek zêr wê bidina te. Wê dema ku ew dana te tê bêjê ez wê zerika ha ya zêr jî wê dixwezim di nav de wê hilde. Wê demê keçelok weke wê kir û çû aliyê din ê çîyê û gihişt wê deve weke çem ku wê bahsa wê dikir. Li wir darek zêde gûrr wî kifşkir û ew hat binê wê. Qûrmê darê stûr bû weke di hundurê wê de mal hebê hebû. Wê demê hilêr derketina hemberê û ew dewletî hundûrkirin bi wî re axiftin. Di wê demê de demekê dirêj ew bi wan re ma.

Piştî wê, hilêran gelek findik û fistik hanîn û danîna ber keçelok. Wî jî têr ji wan xwar. Piştî wê gotina keçelok wer em bi hev re findik, fistik û gûzan berhev bikin. Hingê keçelok jî da dûv wan û bi hev re bi dest çûyinê kirin.

Bi hev re gihiştina qadekê ku wê tişî darên gûzê bê û wê bidest berhevkirina wan bikin. Di wê demê de wê hilerek weke banûya hilêran bê wê, were hemberî wî bi tarîya xwe ya gûr û weke ji wê sîyanek dihat xwandin. Wê demê wê, pîrsek ji keçelok kir. Wê rahiştta du gûzan û gotiyê ku ma kîjan ji wan giran a. Keçelok hinekê hizirî û got ku ya ku ew bikeve bin avê de wê giran bê. Wê demê wê ew bersiva keçelok rast herêkir. Piştî wê, piştîre duyem ji keçelok kir. Wê keçelok bi xwe re bir bin darek mazin a gûzê û gota keçelok di wê darê de çend pel hena. Hingê keçelok gotiyê ku wê bi wê darê ve wê, biqasî muyên li ser te wê, pêl hebin. Wî got ma tu ji kû wê dizanê, hingê keçelok got ku wê demê ku bawer nekê wê bi hasibênê. Wê demê ew bersiva wî jî wê weke rast wê were herêkirin. Piştî wê, hilêrê keçelok bi xwe re wê bira devereke din û wê ji keçelok pirsî ku ma navika dûnyê kûder a. Hingê keçelok hinekê li wê hizirî û piştî wê gota wê ku wê devera ku tu lê disekinê navika wê ya û tu bawernekê jê wê bihasibênê. Wê demê ew pirsî wî jî wê weke rast wê herê bikin. Wê demê bi hev re wê têra gûz, findik û fistik wê berhev bikin û wê werênin. Piştî wê hilêran wê haspekê baş wê ji keçelok re wê amede bikin û wê xûrçên wê tişî zêr bikin û wê ji wî re wê bibêjin ku ev xelate ya. Te pîrsên me rast bersivandin.

Piştî wê keçelok ku ew hê di hundurê wan de wê demê çavê wî bi wê zerikê ket ku ew di çîrîsand. Wê demê keçelok ku ez wê zerika zêr jî di nav de dixwezim. Wê demê banûya hilêrê hinekê hizirî û piştî wê, got ku ber çî tu wê dixwezê. Keçelok got ku ez di wê de bo ku ez avê vexwûm. Pîrr başa bo min. Wê demê wê rahiştta serikê ew dirêjî wê kir û ew wî

hilda û bi wê re ew ji wir dûrket. Ew piştî wê, hat ber latekê din ê mazin û di wê demê de wê kîvroşk derket hemberî wî û piştî wê bi wî re axift û gotiyê de min dizanî ku tu kesekê bi aqil î û tûyê biserkeve. Di wê demê de wê demê keçelok zerik şanî wê da. Piştî wê, gula beybûnê wê di wê demê de wê di cih de ji hewirdorê peydakir. Lê piştî wê kîvroşkê bi dengekê xamgin got ku em heta ava zimrûtê ku wê ji her derdê de wê derman û deva bê wê nebînîn wê nikaribê wê bikê. Wê demê keçelok got ku ji xwûdê hêvî yaê birrîn hew tedît ku. Keçelok di wê demê de ew av bi wî re hebû lê wî weke ne dixwest ku ew wê bikarbênê. Ber ku wî ew bo hilêre xwe hanîbû. Di wê demê de keçelok çendî ku wî li **kîvroşkê** hisand wê dilê wî hinekê din wê weke ku wê bi şawitê û wê bi şawt wê bibê.

Piştî wê keçelok got ku ez tenê tenê dilopekê bikarbênim. Bi wê bû wê bibê nebû jî ez zêde bikarnayênim. Wê demê wê di deverekê de bi dizîka wî gula beybûnê xist wê zerikê û wî dilopek ji ava zimrûtê berda ser û piştî wê da kîvroşkê ku ew wê bikarbênê. Lê di wê demê kîvroşk li berxwe ku ew wê bikarbênê û ber ku wê bawer nedikir ku wê bibê. Wê hertimî bi israrî got ku em pêwîst in herina serê çiyayê qafê û ava zimrûtê werênin. Wê demê keçelok bi israrî got ku tu wê bi karbênê. Wî ne xwest ku ew bibêjê ku ew ava zimrûtê bi wî re heya. Ber vê yekê wî, rêyek bi wê rengê a weke bi nepenî bijart. Piştî wê bi bêhêvî kîvroşkê rahişt a wê ji destê keçelok û got ez dizanim ku wê nebê lê dîsa ez li ser israra de wê, bikarbênim. Piştî ku wê ew bi xwe de kir û pê de wê, demê wê dît ku wê di cih de afsûn we xirabû ew vegeîya li wê rewşa keçkaniya xwe ya pîrr zêde xweşik.

Hingê keçikê pîrr zêde acêbmayî ma. Di wê demê de wê, mereqkir ku ew kirîya. Ew perîyek, farîsteyeka û ankû kesekê din ê bi keremet a. Lê wê çendî wê pirsî wê keçelok xwe girt û ti bersiv nede. Di wê demê de ji devê wî gotina ez jî weke te zaroyek ji rêzê a benî adam im. Wekî din wê ti tiştê din wê negot. Lê keçikê fahmkiribû ku ew bi wî re hinekê nepenî xosletên din hebûn.

Wê demê keçikê ne xwest ku ew keçelok berdê. Di wê demê de keçelokê ne xwestibû ku ew bahsa wê çîroka xwe ya bi hilêrê jî nekiribû. Wî bahsa gelek tiştan ji wê re kiribû lê bi itinayekê ew ji nav naqadibû û ji wê bahs nekiribû.

Piştî wê keçikê wê fahmkir ku ew wê ti gotinê wê ji devê keçelok negirê wê demê gotiyê de ez pîrr dixwezim ku tu bi min re were qasra bavê min tû nasbikê. Wê gelek xelat û zîv û zêr wê bide te. Wê deriyê xazîna li te

vekê. Lê keçelok weke kesekê çav û dilê wî têr ji wê re got ku ez geleki ji wê sipas dikim lê ez ti tiştî di berdêla wê de ji te naxwezim.

Keçik ev gotin dema ku wê ji devê keçelok bihîstin ew zêdetirî ji wê re bû mereq ku ev kesê wilqasî bi aqil tevdigerihê û xwediyê wê hêstê ya mazin a ew kiya. Di dawîya dawî de keçikê ewî qanix kir ku ew wî bibê qasrê û wê hinekê li xwe û bavê xwe bikê mêhwan. Di wê demê de wê dema ku ew gihiştina qasrê û dîtî ku wa keça şah hat wê, kêfxweşiyek mazin wê li qasrê û li dora wê êdî wê rûbide. Wê di demê de wê, şah jî wê pirr zêde wê dilxweş bibê û wê, di wê demê de wê, alaqaçek mazin wê şanî keçelok wê bidin.

Di wê demê de keçelok di wê demê de wî demekê ji ya din dixwest ku ew xwe ji wê deverê xilas bikê û ew bikeve rêya xwe. Lê rewşek wusa afirîbû ku ew êdî weke ku ew ji wî re zor bû. Keçelok di wê demê de wî çare nedît û di wê demê de wî got ku medem rewş ev ev a, ezê demekê bi wan re bimênin û piştî wê bikevina rêya xwe û ji wê derê herim.

Wê demê keça şah bi çavên pirr heyran mayî li keçelok dinerî û ew weke ku ew dilketibê lê dinerî. Keçelok jî wê xortekê li xwe hatî bê. Di wê demê de keçelok di nava mêhwanan de rûniştî ku wê şah wê bibîne ku wê ku ew wusa bi çavekê li keçelok dinerê wî fahmkiribû ku ew êdî dilketiyê. Diwê demê de wî êdî di wê demê de wê, piştî wê demekê wê bi gotinên weke 'ev şahî û dilxweşî bi dewetekê bidomê êdî.' ev gotinên şah wê bale keça wî bikişênin. Wê ew hem wê fihêt bikê û hem jî wê weke ku wê dilxweş bibê. Keçelok jî wî rengê manaya di gotinan de fahmkiribû û wê di wê demê de wê ji xwe re got ku ez demekê ji ya din xwe ji wir xilas nekim wê karê min bi ber nebaşiyê ve wê herê. Di wê demê de wî heta êvarî di nava mêhwanên şah ên li dora wî ma û wê demê ku ew nû hatibûn şah jî wê zêde tiştan wê bi wan re wê ne axifê. Wê xwestibû ku ew hinekê dem bi serve herê. Di wê demê de şah. Di dilê xwe de gotibû ku ezê roja piştî bi dilekê rehet biaxifim ku keçelok jî bê erê ez di cih de fermane kirina deweta wan li welêt bidim.

Di wê demê de wê şah wê gotina xwe bi awayekê ne dîrekt wê ji keçelok re jî wê werênê ser ziman. Lê keçelok wê di wê demê de wê, ti gotinê wê nebêjê û wê tenê wê bi gotina 'ya qismet çi bê bila ew bibê' re wê werênê ser ziman û wê bêdeng bibê. Piştî wî di wê demê de wî bi rastî jî ji çavên keçikê ew rastî pirr baş dixwend. Çavên keçikê pirr zêde xweşik bûn. Çavna reş, mazin û reşika wan weke ku ew di wê de sûretekê dûnyê hebê dihat dîtî. Keçik di wê demê de wê li welatê ê bavê wê kê li ser wê re wê xweşik wê hebin. Wê ew hertimî di nava

gulistana bavê xwe de wê dema wê bûhûrandiba û wê di wê demê de wê ew weke 'baxa nava gulistenê wê biheta bi navkirin û wê ji wê biheta bahskirin. Weki din bavê wê û dayika ku ew hertimî bi rûdênêk geş bê û wê weke 'rûgeşê' were bi navkirin û ew bixwe jî wê weke xweşdilê wê biheta ji wê re gotin. De ne, ew keça weke zaroya tenê a jî dê û bavê xwe re mabû. Gelek zaroyên şah bûbûn. Heft kûr û du keçên wî ku ew hebûn wê bi awayekê nedîyar û ku wê ti kesek çî ji wan wê winda bibin û wê ti kesek wê aqûbeta wan jî wê nizanibê. Li holê tenê wê weke wê keça şah wê ew tenê wê bimênê.

Keça şah dil wê çûbû ser keçelok û ti carî wê şah ji wê re negotiba na. Weki din jî wî keça wî ji rewşa wê xilaskiribû û keça wî hemû serborîya xwe û dema xilasîya hemû gotin bi gotin ji bavê xwe re hanîbû ser ziman.

Di wê demê de keçelok çavên wî weke ku wê tişteke wê nebînin. Hişê wî ne diçî ser ti tiştî. Tenê hişê wî li ser wê bû ku ew di wê demê de ew demekê jî ya din zûtir ew bikeve ser rêya xwe û ew herê. Keçelok wê di wê demê de wê, ew wê şevê wê hîç xew çavên wî negirê. Wî plankiribû ku ew dem bû nivê şevê û herkesekê xwe kişand li odayên xwe yê razanê ew abayê xwe yê nedîtinê li xwe bikê û xwe ji berçavan winda bikê û ew jî qasrê derkeve û ew bikeve rêya xwe û ew herê.

Wê demê dem hinekê têve diçê û keçelok tenê şîyar dimênê. Çend nobetvan jî wê bimênin. Lê keçelok wê dema ku ew farq dikê ku hema herkesekê xwe li odayên xwe kişand wê demê ew abayê xwe yê nedîtinê wê li xwe bikê û wê di wê demê de wê, ji berçav wê xwe winda bikê. Wê demê wê di cih de wê rêya xwe wê bibîne û wê ji qasrê wê derkeve û wê bikeve rêya xwe û wê rêya xwe bidomênê.

Ya ku wê li şûn wî li qasrê wê bibê jî wê pirr zêde wê bahsa wê di nava xalkê de wê were kirin û wê hinek wê weke rewşek ji xeybê bûbê wê jê bahsbikin. Hinek jî wê ji wê weke rewşek ku wê keçelok di wê de wê weke periyekê wê pênasebikin ku ew keça şah dilketiyê wê pênasebikin. Hinek jî wê weke çinekê wê bînin ser ziman.

Di wê demê de wê gotin li dûv hev wê werina werina ser ziman. Keça şah jî wê bikeve rewşek nebaş de û wê li gorî hinek vegotinên ku wê li ser wê werina gotin wê bê ser ziman ku ew heta dawîya jîyane xwe li wê gulistana ya xweşik û ku ew jî dilan re hatî amedekirin wê weke li bendê wî bimênê û ew neçûyê.

Lê em dîsa werina ser rewşa keçelokê. Ew di wê demê de wê, bikeve ser rêya xwe û wê di wê demê de wê, wusa di awayekê de wê, di rêya xwe de bidomênê û wê ji wir dûrkeve. Keçelok ew di wê demê de ku ew

ji wir dūr dikeve wê pişt wê weke ku wê were ser ziman wê herê deverek din.

Biqasî ku wê were gotin wê keçelok wê di wê demê de wê ji wir wê herê û wê bi rojan wê di rê de wê herê. Ew demekê wê di bin wê tava germ de êdî ku ew lêvên wî li piştâ sûkra wî sekinî na wê li bin darekê wê rûnihê. Di wê demê de ew hinekê bêhna di berdê û ew ew hinekê li xwe dihê. Avek jî wê hinekê ji darê wirde wê hebê. Wê têra xwe avê jî ji wê vexwe. Piştî wê keçelok wê demekê wê fahmbikê ku ew birçi ya jî. Li serê wê çiyayê wê ti tişt jî wê nebê ku ew bixwê. Di wê demê de ew, piştê ku ew hinekê li xwe hat ew dikê ku ew rêya xwe dewam bikê ew bi carekê çavê wî bi çûkekê xweşik wê bikeve. Ew di wê demê de wê di wê demê de wê, çendî ku wê tevgerê wê bikê wê bibînê ku wê çûk wê weke ku wê ji wî ne tirsihê û wê, nefirê.

Keçelok wê hinekê wê li wê rewş wê bimênê şaş û mat. Di wê demê de keçelok bi ber wê çûkê ve diçê û heta ku ew diçê cem çiqilê ku ew çûk li ser re lê çûk wê ji ber wî ne firê. Di wê demê de rengên weke rengên qozaqarê ên li ser çûk wê bala wî bikişênin û ew li wî xweşik hatin.

De ne, keçelok wê piştê ne bi demek zêde dirêj ku wê bi ser ve wê herê wê fahmbikê ku ew çûk wê çûkekê bi afsûn bê û wê di wê demê de hatîya cem keçelok. Wê dema ku keçelok carekê destê xwe avêt çiqilê darê ê ku ew çûk li ser wê demê wî deng ji çûk kir ku ew li wî axift. Keçelok hingê ma şaş. Di wê demê de wî ji xwe re got ku ez dibê ku ez ji ji bîrçûbûnê û tîbûnê ez li ser pîya û şîyar ew xiyalan dibînim. Çûk dengê wî kir û gotiyê de ku ne keçeloko tu xiyalan nabînê ez çûk im û ez bi ter axiftim. Wê demê keçelok di wê demê de ew hinekê ma sekinî û li dora xwe meyizend ku gelo hinek kes li dora wê hena lê wî ti kesek li dora xwe ne dît. Di wê demê de çûk gotiyê li dora xwe ne nera. Li vê çola beyer ji cinan pê ve wê ti kesek nebê. Wê demê keçelok got ku 'nexwe ti cinî'. Çûk bersiv neda û got na ez ne çin im. Lê ez çûk im û ez xwedî ziman û bi ter dikarim biaxifim. Wê demê çûk hat cem keçelok li ardê danî û ew jî li ardê rûnişt û bi hev re bidest axiftinê kirin.

Çûk di wê demê de got ku ez ji çûkê cem tayrê simûrg im. Kî tayr û çûk wî bibînê wê karibê bi dev û lêv û ziman bibê û wê karibê bi zimanekê tekûz biaxifê. Wê demê çûk bahsa xwe û serboriya xwe ya li cem teyrê simûrg kir.

Di wê demê de wê, tayr di wê demê de gota keçelok tu bi tenê li van çolên beyer çî dikê. An jî gelo te rêya xwe şaş kiriya? Keçelok got ku ez

ji rêyek dûr dihê ev bi rojane ku ez di rê deme û ez diçima male xwe. Keçelok hinekê ji çûk re bahsa û serboriya xwe kir.

Di wê demê de çûk gotiyê de were ez te bibima devera ku ez li wê dijîm. Di wê demê de çûk gota keçelok lê ew dever ji vir pîr dûr a. Divê ku tu li piştta min sûwar bibê. Keçelok hingê kenî û got ku tu biqasî du teliyê min î. Ez pîr mazin im. Ma ezê çawa li te sûwar bibim û tê bi firê di bin min de. Wê demê keçelok weke ku ew bi çavê xwe acêbekê bibînê lê hat. Dît ku wa çû li berçavên wî pîr mazin bû û ji qama du miran zêdetirî dirêjtir û mazitir bû. Di wê demê de wê demê çûk gota keçelok me nûha ez çawa ma, tu dikarê li piştta min sûwar bibê.

Keçelok pêşî ne xwest ku ew sûwar bibê û wî ji jê pîrsî ku ew wê tê min bê kûderê. Çûk got ku ezê te bima devereke ji wir dûr ezê li wir te dênim û tê rehetiya xwe bînerê. Wê ti kesekê zirarê wê nede tê. Ev devere wê devereke ku wê ji wê derî li nava baxçeyê simûrg wê ve bê û wê di wê de wê hemû tayr û çûk û zindîyên bi wê rengê wê hebin. Di wê demê de keçelok xwest ku ew herê û wî got herê. Di wê demê de ew li piştta çûk sûwar bû û ew hatina devereke zêde xweşik ku wê weke keviyek ji bihûştê bê. Di wê demê de wê, keçelok ji çûk re got ku ew çi xweşika. Di wê demê de çûk ew li wir danî. Di wê deverê de wê, tayrên piçûk û mazin wê li rex hev wê bijîn. Piçûk û mazin wê hebin. Lê yek jî wê li ya din wê telûkeyê wê bi hebûna xwe re wê nede çêkîrn. Baz û eylo wê li rex hev bin û wê kevokek di nava wan de bê. Lê ew wê ji wê re wê xateriyê wê çênekin.

Keçelok di wê demê de wê, ya ku ew pîr zêde li wî bi mereq û acêb hat hemû tayr û çûkên li wir ku wî didîtin hemû jî wê weke ku wê bi dev û ziman bin û wê biaxiftan.

Wê demê çûkê piçûk ew dîsa wê weke xwe ew hat cem keçelok û ew bira devereke xweşik û da rûnandin. Li wir di cih de wê li ser gotinek ku ew ji devê çûk derket wê sofreyek weke bêkêmesî wê li pêşîya keçelok wê vebê. Çûk di wê demê de gota keçelok keremk bixwe. Ez dizanim ku tu gelekî birçî yê. Keçelok gelek tiştên ku ew bi heybet didît wê, ji ber wê ne hiştiba ku ew ti tişt di qirika wî de herê xwerê. Di wê demê de wê keçeleok wê di wê demê de wê xwest ku ew ji çûk bipîrsê ku ewder kûdere ku wê ew hanî wir. Wê demê çûk weke ku ew ya di dilê wî de ku ew wê bixwezê wê bipîrsê wê fahmbikê wê ji wî re wê biaxifê û wê bibêjê ku devere dûnyê a herî bilind a ku em hatinê de. Wê demê ku wê bahsa devere herî bilind a dûnyê wê bihata kirin wê cih de wê çîyayê qafê wê bihata bîra mirov.

Keçelok hingê di wê demê de wê weke ku wê di xwe de wê demê ew hizirî û hinekê weke ku ew xemgin bibê lê hat. Di wê demê de wî ji xwe re weke ku wî hanî ser ziman ku ´min ewqas rê ji çîyayê qafê qadkir û ez çûm. Lê vê çûk ez cardin bi şûn ve di demek pir kin de hanim. Wê demê çûk wê weke ku wê jî wê hîsbikê wê demê wê ji keçelok re wê ji ber xwe û bêî ku ew tiştêkê hê ji wê bi pişrê got ku mereqê neke. Kengî te xwest ezê te bim û dênima cihê ku min tu ji wir hanî.

Wê demê ev gotin wê weke gotineka ku wê hinekê wê reheti kiriba dilê keçelok de. Lê ew bi tememî nebû. Wê demê gelek merek li ser wê deverê di serê keçelok de wê bibê. Wê demê wê keçelok wê li wê bihizirê û wê were hişê wî ku ew bipirsê. Di wê demê de wê çûk wê demê wê, weke ku ew hîsbikê wê, di wê demê de ew hat û nêzîktirî wî bû ji wî re bahsa simûrg kir.

”Ev devera ku tu nûha li lê yî wê gulistana herî xweşikê dûnyê ku wê xewna her tayr û çûkî wê bixemilênê ku ew were li lê wê ya simûrg bê. Di demên ku wê, simurg li vir dijî û hemû tişt bi qûdreta wî dibin. Ew weke ya herî mazin a hemû tayr û çûk na.

